


kovara hunerî. çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

ZIVISTANA 2004an

**KOÇBERÎYA SEDSALAN**



**TEMA:**

**Yekitiya Europayê,**

**25**

**endametîya Tir kîyê û  
doza kurdan**

# bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.  
Sê mehan carê derdikeve/ Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 25, zivistana 2004an

*Ansvarig utgivare*

Ali Çiftçi

*Redaksiyon*

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen  
M. Duran, Muzafer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

*Adress*

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

*E-post*

info@birnebun.com

*Internet*

www.birnebun.com

*Navnîşana li Almanyayê*

M. Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya

Tel: 0049-(0)172 298 24 51

*Biha/Fiyatı*

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2 500 000 TL.

*Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):*

Swêd: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

*Türkiye banka hesap numarası*

F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı şubesi

Hesap No: 00158001 445398272

*İsveç hesap numarası*

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

*Almanya hesap numarası*

M. Özgür, Stichwort "Birnebûn" Deutsche Bank-Köln

TL: 0049-(0)172 298 24 51

Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

*Belavkirin / Dağıtım*

Türkiye

Ankara:

Nedime Yalınkılıç /Cafe Babil

Selanik Cad. No 50/6 Kat: 2 Kızılay

Tel: 0312-418 10 50

Hakan Ulutasli / Akademiya Kitabevi

Konur Sok. No: 8/10, Kızılay - Ankara

Tel:0312-425 53 07

*İstanbul:*

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

*Çap / Baskı*

Apec-Tryck AB



Her nivîskar berpîrsiyarê nivîsa xwe ye.  
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê  
re tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî,  
li xwedî nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela  
Ziman li Almanyayê pişgirên kovarê ne.



Xalê Ehmed ji Şuayplî  
ji Koçberîya sedsalan

Ji Bîrnebûnê, <b>Ali Çiftçi</b> .....	2
Nameyên xwendevanan .....	4
DİYARBAKIR SUR BELEDİYESİ'NDEN ÇOCUK ÖYKÜLERİ YARIŞMASI .....	5
Kurd di hîlbijartinên Îraqê û yên Kurdistanê de listeya miştêrek derdixin .....	6
Daxwiyaniya Konferansa Zimanê Kurdî .....	12
Yekîtîya Ewrûpayê, endametiya Tirkîyeyê û pîrsa kurdî, <b>Nuh Ateş</b> .....	13
Raporên hêzên kurd li ser YE .....	15
Tarîxa têkiliyên Yekîtîya Ewrûpayê û Tirkîyê, <b>Amadekar: Nebî Kesen</b> .....	22
Rapora Komisyona YE û pozîsyona kurdan, <b>Nebî Kesen</b> .....	24
Di peymanê Lozanê de mafê kêmeteweyan.....	31
Kurd wek gelê esilwar û mafên wan, YE û Tirkîye, <b>Haci Akman</b> .....	32
YEKÎTÎYA EWRÛPAYÊ Û ENDAMETÎYA TIRKÎYÊ, <b>Ayşe Güler</b> .....	35
Dostê Baranê, <b>Dr. Zorabê Aloian</b> .....	36
Stiranên folklorîk, <b>Amadekar: M. Xelîkan</b> .....	38
Anna û mişkê wê, <b>M. Şirin Dağ</b> .....	40
Kursîya Serbest, <b>Mîrê Derewan</b> .....	41
Wecîz, werger: <b>M. Xelîkan</b> .....	42
Sohbetek li ser koçberîya sedsalan Kurdên Anatoliya Navîn, <b>Ali Çiftçi</b> .....	44
Kalê xiş û xal û keçikên wî, <b>Ecevit Yıldırım</b> .....	63
Kerê Xwelîyê, Berhevkar: <b>Necatî Kanoğlu</b> .....	68
Derd ne yek e ne dudu ne, <b>Ayşegül</b> .....	73
Azınlıklar ve Azınlık raporu üzerine düşünceler, <b>Mehmet Şahin</b> .....	74
Keşanlı Ali mi Kürt Cemali mi?, <b>Mehmet Bayrak</b> .....	81
SEYAHATNAMELERDE HAYMANA, <b>İbrahim Halil Uçak</b> .....	85

# Bi hêviya saleke teze ya serkeftin û bextiyariyê!

Xwendevanên hêja, em bi hejmarê 25an sala 2004an bi ev re temam dikin û bi hêvî û heyecaneka nû dikevin sala 2005an. Dema di jîyana însanan de gelek guhartinên nû çêdibin û meriv rastî bûyerên nû dibe, dem çiqas zû derbas dibe. Hele ew bûyer rasterast li jîyana meriv tesîr bikin, ew dem jîyan hîn bi lez û hêvî derbas dibe, meriv pê nahese çing zû derbas dibe. Ew helbet ji bo her insanî ne wisa ye. Bûyer hene, kêfa hinek însanan tînin û li jîyana wan tesîreka pozîtîv dikin, bûyer jî hene bihna hinek însanan teng dikin û jîyanê li wan diherimînin. Dema em bala xwe bidin jîyana gelê kurd, heta niha kêma caran wek ya îsal, (herçiqas her dem nebe jî), carcaran kêfa insanên kurd jî hatiye. Bi kurtî, em dikarin bêjin di qada nawanetewî de herçiqas hê jî bi fermî kurda re bi tewayî statûyek çênebûbê jî, hêdî kurd li meydana xwe bi xwe û bi navê kesayetîya xwe beşdarî civînên nawanetewî dibin û temsîlîya xwe dikin. Ew her çiqas li tevayîya kurdan û Kurdistanê nebe jî, dema bi kesayetîya kurd derdikevin holê, dilê her kurdekî şad û bextewar dikin.

Hêviya me ew e, ku di jîyanê de meriv rastî tu bûyerên ku dilê însanan diêşîne nebe. Lê di rastîya jîyanê bi xwe de jî, wek herdem, rindî û xerabî çawa her bi hev re jîyane, dê bûyerên ku dilê hinekan şa dikin û hinekan jî dilteng dikin her hebin.

Em bi hêviya ku insanetî her rastî bûyerên dilşad bin, sala we ya nû pîroz dikin û ji hemû gelê kurd re serkeftin û jîyaneka bextewar ya dilşad ji dil dixwazin.

Mixabin, hevalê me, **Bekîr Dari** endametiya xwe ya redaksiyona Bîrnebûnê, ji ber nerazîbûna xwe ya ji hinek kar û xebatên redaksiyonê, bi dawî kir. Lê ya rind, ew ê wekî berê, nivîskarê Bîrnebûnê bimê û rûpelên wê bi nivîs û wêneyên xwe bixemline. Kanîn û hûnera wî ya wênevanî û nivîskarîyê, hevaltî û êmegê wî tu cara nayê jibîrkin. Ji biryara wî ra hurmeta me heye.

Ew hejmar wek tema, li ser YE, Tirkîye û Kurd hatiye dagirtin. Piştî ku rapora YE ya bi navê Repora Peşveçûnê ya Tirkîye ya 2004an di 6/10/2004 an de hat belav kirin di nav kurdan de, hem li Tirkîyê û hem jî li Ewropayê gotûbêj û hereketek bi lez û bez destpêkir. Herçiqas bi tevayî nebê jî em ê hinek li ser YE û dîroka berendametiya Tirkîyê û li ser daxwazên kurda bisekinin.

Di çapemenîya Tirkîyê ya kurd û tirkan de di derbarê Rapore de dîtînen cûda hatin belavkirin. Ji aliyê hêzên kurdan de jî hinek civîn û raporên ji hev cûda hatin amade kirin. Hûn dê di vê hejmarê de hem ji aliyê dîroka berendametiya Tirkîyê ya YE û hem jî di vê pêvajoyê de dîtînen û raporên cûda yên kurdan, li ser YE bibînin.

Ji dîtînen û raporên ku ji aliyê kurdan ve hatine amade kirin meriv di kujan pencerê de lê binêre dikare li gor xwe şirove bike. Di hemû rapor û dîtînen ku heta niha hatine belav kirin de meriv rastî dîtîneka hevbeş dibe, ew jî bi ya min ev e; ku hêdî li Tirkîyê dê ji bo kurda hinek gav bînin avêtin, biçûk an mezin,



dê guhartinek bo kurda bêt kirin. Ew gav bi hêz û tevgera kurdî bi xwe ve girêdayî ye. Em kurd li welêt û ji derweyî welêt çiqas bi hevkarî û organîk ji vê gavavêtinê re hazir bin, ewqes em dikarin bibin xwedî maf. Eger daxwazeka me ya hevbeş ya netewî ku hemû hêz û însanên kurd li pişt bin hebe, ew dem em ê mafên xwe yê netewî hîn bi zûtirîn wext û berfireh bi dest dixin. Na eger heryek ji aliyê xwe, di pencera xwe re, li gor dilê xwe lê binêre, ew dem em nikarin bibin xwedî dîtineka hevbeş û ew jî bi xwe re perçebûnê û bêhêziyê tîne ku em ji nikarin bibin xwedî tu gotinan!..

Di nav qada navnetewî de heta roja îro jî gelê kurd ji aliyê fermî de nebûye xwediyê tu mafi. Meriv rastî tu qanûneka tenê jî nabe ku tê de ji bo mîletê kurd û cografyeya Kurdistanê heqê parastin û pêşxistine hebe. Eger bibe dê di dema pêş me de kurd jî bibin xwedî mafekî ku di qada navnetewî de bêt qebûl kirin û parastin.

Divê hemû civata kurd di vê dema pêş me de pir aktîv û hişyar be û daxwaza heqê xwe yê keseyatiyê pir êşkere bike û ji bo parastin û pêşxistina wê jî xwedî pêşniyar û daxwaz be. Hêdî li her derê divê kurd vekirî bi kesayetiya xwe derkevin holê û ew daxwazên xwe jî pir zelal û bi cesaret ji dewletê, YE û NY(Neteweyên Yekbûyî) bixwazin. Li vir jî bo vî karî jî berpirsiyariyeka taybetî dikeve ser milê masmediya kurdan bi xwe. Di van rojên pêş me de divê ev mesela endametiya Tirkîyê ya YE' yê û rewşa kurd pir bêt aktualize kirin û herwiha li ser parastina mafên gelê kurd, pêşxistin û biqvetkirina kesayetiya kurd bi fireshî bet sekinandin. Di vê navberê de divê li ser mafên hemwelatîyên YE bi berfirehî agahdarî bêt dayîn. Yanê endambûn û hemwelatîbûna YE tê çî maneyê û mafê her insanî çî ye divê jî bo her însanekî ku li Tirkîyê dijî bêt zanîn.

Bi ya min bi taybetî hemû dezgehên kurdan hem yê derweyî welêt û hem jî yê li

welêt bi rêya tevgerên agahî yê YE yê daxwaziya agahiyên berfireh bikin. Ji bo wî karî koordinasyoneka berfireh ya hêzên kurda pêwîst e. Tiştê ku heta niha hatiye kirin meriv pir bi rihetî dibîne ku kijan hêz yan însan nêzî hev an hevalbendên hev in, ew bi hev re didin û distînin. Ya ku pêwîst e, neku însanên her wekî hew difikirin bèn ba hev û li ser dîtînen hemfikir bi hev re bin, ya girîng ev e ku însanên ji grûb û hêzên ji aliyê fikir û siyasî de cuda ne, bèn ba hev ku biryarên daxwaziyên hevbeş yê ku tevahiya kurdan temsîl bikin bînin rojevê, da ku dost jî, dijmin jî bizanibin ku daxwaza hevbeş a kurdan çî ye?

Hêdî wext hatiye ku li ser wê koordinasyonê gavên piratikên berdewamî bèn avêtin. Hinek gavên biçûk hatine avêtin, bi ya min ne bes in. Ji ber di hemû rapor û daxwaziyan de ku heta niha ji teref hêzên cûda yê kurda de hatine kirin hevbeşiyek heye û ji ber wê daxwaziya hevbeş jî hîn bi hêztir bibe ev karê diyalog, koordine û hevkarî pir pêwîst e.

Dema kovar li ber çapê bû xeberekî xweş ji Kurdistanê başûr hat ku hemû hêzên kurda dê bi yek listeyê bejdarî hilibijartina bikin. Ew hevkarîya hêzên Kurdistanê başûr ji bo gelê kurd yê başûrê welêt serkeftin û serbilindiyeka netewî ye. Bila ev hevkarî bi taybetî bo gelê me yê başûr pîroz be.

Piştî rizgarbûna Iraqê, kurdê naskirî, **Ehmed Bamernî** bû konsolosê Iraqê yê nû yê Stockholmê. Em bi hatina wî kêfxweş û serbilindin.

Bi navê *Koçberiya sedsalan* programeka zincîre ya mehane li ser Kurdên Anatoliya Navîn di Roj TV de heta niha 3 beş hatine belavkirin. Li ser vê programê bi berpirs û amadekarên vê programê re sohbeteka dirêj di vê hejmarê de, ji bo we, xwendevanên heja hatiye kirin, bi hêviya ku li dilê we be.

Heta hejmara bê bi hêviya saleke teze ya serkeftî û bextiyarî, bimînin di xêr û xwaşiyê de.

## *Sayın Bîrnebûn dergisi yöneticileri,*

Hepinizi saygıyla selamlıyor ve bu derginin yayınlanmasından dolayı emeği geçen herkesi kutluyorum.

Değerli Arkadaşlar,

Geçen sayınız elime geçti daha doğrusu gönderdiniz teşekkürler. Gerçekten çok mükemmel ve kendi insanına verebileceği en iyi hizmeti sunmaktadır. Yazı olarak Kürtçe ağırlıkta olması ayrı bir güzelliştir. Kendim öğretmen olmama rağmen Kürtçe yazmamanın ezikliği içindeyim. Orta Anadolu'da yaşayan insanlarımızın kendine özgü yaşamsal değer taşıyan bu tür yayınların olması ayrı bir önem taşımaktadır.

Derginin Gölyazı ile ilgili kısmına değinmek istiyorum. Kısa bir bilgilendir-

me olmuş, yazdığınız için teşekkür ediyorum. Bizim buyıl Gölyazı'da düzenlemiş olduğumuz bir şenlikti. Zaten isminden de anlaşılacağı gibi 1. Gölyazı Kültür ve Dayanışma Şenliği'dir. Festival değildi ve önümüzdeki yıllar için bir hazırlıktı. Temennimiz önümüzdeki yıl bunu festival olarak kutlamak olacaktır.

Yayınlamak istediğiniz veya bize sormak istediğiniz herhangi bir şey olursa gereken desteğe ve yardımlara hazırız. Yayın yaşamınızda başarılar diler, saygılar sunarım.

**Mulla Şimşek**  
Gölyazı Belediye Başkanı

## **Nameya xwendevanekî (bi şêxbizinî)**

Merhaba! Min Mesût.

Le Polatli runişim . Min aslê man fire nezanim  
je ke dergiye ten ruginim dikî le aşîrete man tişt  
ejnevtim. Min Şexbizinim le hemame vemen  
dîşin dîye li lere.

Îme sî de ler hestîn. Neve jî Karapinar,  
Evliyafaki, Kavak.

Le dergiye riketan kali lerel ikirin fire a şa ivin

De le xutan mukate ivin.

# DÛYARBAKIR SUR BELEDÛYESÛ'NDEN ÇOCUK ÖYKÜLERÛ YARIŖMASI

Diyarbakir Sur Belediyesi'nin kùltür çalıřmaları kapsamında, Çocuk Öyküleri Yarışması düzenlenmektedir. Sadece Diyarbakir ve çevresiyle sınırlı tutulmayan, mümkün olan en geniş yelpazede çocukların katılımını saęlamayı esas alan öykü yarışması, Kürtçe ve Türkçe olmak üzere iki dilde yapılacak.

Yarışma tarihi ve şartları ile ilgili bilgiler şöyle:

## ÇOCUK ÖYKÜLERÛ YARIŖMASI ŖARTNAMESÛ

1- Katılımcı (Yarışmacı) gerçek adını, kısa öz geçmiřini ve adresini kapalı bir zarfa koyacak bu kapalı zarfı yazdığı öykülerle birlikte bir başka zarfa koyacak bu zarf elden veya posta ile "Çocuk Öykü Yarışması" Sur Belediye Başkanlığı DIYARBAKIR adresine gönderilecektir.

2- Her iki zarf üzerine sadece katılımcının rumuzu yazılacaktır

3- Her öykü 2 - 10 sayfa A4 kağıdına daktilo veya bilgisayar yazısıyla yazılacaktır.

4- Her öykü 6 nüsha halinde 15 Şubat 2005 tarihine kadar belirtilen adrese teslim edilecektir.

5- Her katılımcı en fazla beř (5) öykü ile katılabilecektir.

6- Öyküler řimdiye kadar bir yerde yayınlanmamıř olacaktır.

7- Öyküler iade edilmeyecektir.

8- Öykülerin yayınlanması, basılması Sur Belediye Başkanlığının iznine baęlı olacaktır.

9- Yarışmanın Dili: Türkçe ve Kürtçe

### YARIŖMA ÖDÜLLERÛ

Birinci: 1.000.000.000 TL. (1.000 YTL.)

İkinci: 750.000.000 TL. ( 750 YTL.)

Üçüncü: 500.000.000 TL. ( 500 YTL.)

Mansiyon" : 20 Adet Kürtçe Kitap

JURİ(KÛRTÇE): Fırat CEWERI,  
Yunus BEHRAM, Roni WAR, Sedat YURTDAS

JURİ(TÛRKÇE): Müge IPLIKÇI,  
OęLU, Gaye BORALIOęLU, Suzan SAMANCI, Orhan ÇELIK

# Kurd di hilbijartinên Îraqê û yên Kurdistanê de lîsteya mişterek derdixin

Roja 1ê desemberê (çileyê pêşîn) a 2004ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îraqê (PDKI) û Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê peymanek îmza kirin ku di hilbijartinên Îraqê û yên Kurdistanê de bi hev re û li gel partî û rêkxistinên Kurdistanê yên din re lîsteya endamên parlamentoyê ya mişterek derxin. Lîsteyeke mişterek ji bo hilbijartinên parlamentoya Îraqê û lîsteyek mişterek jî ji bo hilbijartinên parlamentoya Kurdistanê Federe ye.

Li ser vê hevkarîyê di 1ê desemberê (çileyê pêşîn) de Serokê PDKI Mesûd Barzanî u serokê YNK Celal Talebanî civîneke çapemeniyê kirin. Em wê civîna ji bo wê gava dîroki ya bi qedera miletê kurd ve girêdayî ji rojnameya Xebat organa PDKI û Kurdistanî Nwê organa YNK vediguhêzin ji bo xwendevanên Bîrnebûnê.

*Di civîna çapemeniyê de Mesûd Barzanî dest bi axaftinê kir û got:*

– Gelek bi xweşalî, serbilindî û serfirazî îro em radigihînin gelê kurd ku em; cenabê Mam Celal û ez û herdu mektebên siyasî yên Partiya Demaokrat a Kurdistanê Îraqê û Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê gihîştine lihevkirineke mêtûyî û lihevkirina me berî çend deqeyan hat îmzekirin da em bi hev re mil bi milê hev du ve dirêjayiyê bidin xebata xwe ya hevbeş(mişterek) heta ku hemû maferewayên gelê Kurdistanê bîn cîbicîkirin û bîn garantîkirin. Ji ber ku hîn meseleya destûrê, Kerkûkê û herêmên teerîbkirî yên din nehatine çareser kirin, me biryar da ku hem ji bo hilbijartinên seranserê Îraqê hem jî ji bo hilbijartinên Kurdistanê em bi yek lîsteyê derdikevin. Her wiha hevpeymanên me yên din ên li Kurdistanê jî di van lîsteyan de beşdar dibin. Maneya wê ew e ku bi lîsteyeke nîştimanî ya fire hemû hêz tê de beşdar in, ne ku bes Partî û Yekîti di vê lîsteyê de derdikevin. Maneya wê ne

ew e ku ev dibe urfek û berdewamiyek. Lê rewşa Kurdistanê wiha pêwîst dike ku em berjewendiyên stratejîk ên Kurdistanê di ser hemû berjewendiyên xwe yên partîti re digrin. Di dema xwe de li parlamentoya Kurdistanê û çend roj berê jî me ragihandibû ku gava em bibînin ku em ji alî gelê Kurdistan ve rûbirûyî demeke çarenivîssaz bûne, tu nelihewî di navbera me de namîne û em wek tîpekî (taximekî) hewl didin. Îro jî ez zor bi xweşalî dikarim bêjim ku em gihîştine lihevkirineke mêtûyî ku li berjewendiyê gelê Kurdistanê ye, li berjewendiyê hemû Îraqê ye, dibe garantiyek ji bo Iraqueke federal a demokratîk a yekbûyî ya pêşerojê. Em umîdewar in ku piştî vê, rewşên wiha bîn ku em karibin bi çend lîsteyên cuda derkevin, em hemû pabend bin, em jî û miletê me jî pirtir hînî prosesa demokrasîyê bibe. Em umîdewar in ku em ber bi hilbijartineke serkeftî biçin û hemû jî li berjewendîya gelê Îraqê bi giştî û gelê Kurdistanê bi taybetî be. Ez gelek sipasî cenabê Mam Celal jî dikim ji



ber vê helwesta wî. Her wiha sipasî serokatîya Partiya Demokrat a Kurdistanê û serokatîya Yekîtiya Nîştîmzanî ya Kurdistanê dikim. Ez sipasî dostê me yê xweşdivî Kak Kerîm Fexrî dikim ku roleke erênî girt û sipas ji bo we.

*Pişt re Celal Talebanî dest bi axaftinê kir:*

– Xwişk û birayên hêja tiştêkî min ê wiha tune ku têxim ser fermokirinên Kak Mesûd. Ew ê ku Kak Mesûd fermokir, bi rastî di dil û bîra me her du aliyan de ye û wî bi navê me herdu aliyan ew tişt fermokirin. Ez jî divê gelekî sipasî Kak Mesûd bikim ku di vekirina girêkorkan de destekî wî yê bilind hebû. Bi saya himmeta wî bû ku me karî bi wê asaniyê (rehetiyê) û bi wê zûbûnê em bigihên vê lihevkerina dîrokî. Kak Fexrî Kerîm jî hêjayî sipas û teqdîrê ye û ez dikarim bêjim ku birayên mekteba siyasî yên her du aliyan jî, yên partiyê jî yên Yekîtiyê jî gelek xwe wes-

tandin, hewlên pîrr dan da em bigihîjin vê encama mêjûyî. Di dema ku Kak Mesûd û bendeyê muxlusê we vê mizgîniya lihevkerinê digihînin gelê Kurdistanê daxwazeke me jî ji gelê Kurdistanê heye ku bi heyecaneke mezin pêrgî li hîlbijartinan bikin, navên xwe li lîsteyan (yên hîlbijêran) binivîsin, beşdarî hîlbijartinên pêşerojê bibin. Çimkî ev hîlbijartin ji bo kurdan çarenivîssaz e, çî qas kurd zêdetir dengên xwe bidin ew qas zêdetir encumenên wan dibin li Encumana Giştî ya Îraqî a pêşerojê de. Em hêvîdar in ev mizgîniya xweş a ku tê dayin ji bo gelê kurd bibe tehmderok jî be da ew bi dilxwazî û coşeke mezin beşdarî hîlbijartinan bibin. Bêguman wek Kak Mesûd jî fermokir, ev tecrubeyek e û dibe palpiştê garantîkirina demokrasiyan di pêşerojê de. Ez hêvîdar im ku ev lihevkerin



Celal Talebanî û Mesûd Barzanî di civîna çapemeniyê de.

û hevkarîya li navbera herdu partiyan û a li navbera Kak Mesûd û bendeyê muxlusê we berdewam bike û di berpêçûna destkeftiyên gelê Kurdistanê de geş bibe û berfireh bibe. Ez jî j bo ku hûn beşdar bûn û hûn ê van xerberên me bigihînin rojname û televizyonên xwe gellek sipasî we dikim.

*Di bersîva pîrsekê de ku li ser naveroka lihevkerînê û dereceya beşdarkirina partiyên din ên Kurdistanê a di vê listeyê de hatibû pîrsîn, Celal Talebanî got:*

– Wek Kak Mesûd fermo kir me hemû ji bo partî û Yekîtiye daneniye. Ji para Yekîtiyê û partiyê me gelek kêr kiriyê û me para hemû partiyên ku beşdarî dikin daye, lê heta em li gel wan rûnenên em baş nabînin tu hejmaran bidin. Em hem wek partî û hem jî wek Yekîtiyê gelek dilrahet in ku me hejmarên parên xwe li gora dema berê gelek kêr kirine da em hemû aliyan razî bikin da, qevdegulek hebe di parlamentoya bê ya Kurdistanê de.

*Di bersîva pîrsekê de jî ku li ser pêkhatina hevpeymanîya li gel partî û aliyên siyasî yên din ên Îraqê ku aya tu niyazek heye ji bo beşdarînekirîna heta doza Kerkûk, Mûsil û navçeyên din ên Kurdistanê çaresernekirîna Mesûd Barzanî got:*

– Wek ku hûn dizanin civîneka fireha partiyên Îraqî nêzikî du hefte berê li Dokanê hat kirin. Li ser beşdarbûna bi listeyeke niştîmanî ya mişterek a ji bo hilbijartinan bi şertê ku ew hêz bawerîya wan bi Îraqê federal a yekbûyî ya pîrpartî hebe, berî hilbijartinan an piştî hilbijartinan hevpeymanetî di navbera wan hêzên ku bawerîya wan bi nasnameya Îraqê federal a demokrat hebe.

Li ser meseleya Kerkûkê jî helwesta me gellek zelal e û helwesta me herdu aliyên e û ez dibêjim qey helwesta her kurdekî jî ye ku gelê kurd nikare emrê weqî teerîbkerîna qebûl bike. Ji bo beşdarbûna xelkê a di hilbijartinên

Encumena Niştîmanî (Parlamentoya Îraqê) tu îtirazek me tune, lê tiştê ku pêwendîya wê bi hilbijartina encumena parêzgeha Kerkûkê (meclisa wîlayeta Kerkûkê) ve hebe, nikare hilbijartin ji bo wê bê kirin heta rewşa bajêr neyê asayîkirin (normalîzekirin) her wekî çawa di qanûna birêvebirina dewletê de hatiye, nabe ku gelê kurd ji hilbijartinan bêpar bê hiştin di demekê de ku ew erebên ji bo teerîbkerîna (erebkerîna) Kerkûkê li wir hatine bicîhkirin mafê wan hebe. Ev karek e ku nayê qebûlkirin.

*Pîrs: Aya ev lihevkerîna careke din nabe meseleya pêncî-pêncî?*

**Celal Talebanî:** Bi ya me xelkê Kurdistanê pê xweş e ku em bi hev re bin, hevlişte bin û bi hev re derkevin meydanê. Lê vê carê ne pêncî-pêncî ye. Vê carê di listeyê de li gel para partiyê û ya Yekîtiyê pareke din jî heye ku ji bo hemû partiyên din hatiye dayîn. Vê carê qevdegulek e. Vê carê hemû partî tê de beşdar in, li gor têgihîştina me vê carê her partî li gor hêza xwe ya di nav komelên gel de tên temsîlkirin. Em dibênin qey gelê Kurdistanê wê bi vê kêfxweş bibe û peş de biçê.

*Pîrs: Gelo tiştêkî wiha heye ku Mam Celal Talebanî ji bo serokkomariya Îraqê û Kak Mesûd Barzanî ji bo serokkomariya Kurdistanê Federe xwe nişan bide:*

**Celal Talebanî:** Hîn zû ye. Ka carekê em bizanin parlamentoya Îraqê tê hilbijartin û ka çi dibe, ka nîsbeteke bitesîr bi dest kurdan dikeve yan na. Em li ser wê yekê jî mitefîq in ku wê çawa bibe, lê hîn dema ragihandina wê hîn nehatiye.

*Pîrs: Tê gotin ku kurd ji bo cîbicîkirina maddeya 58an tenê dawekariyê dike. Gelo tenê bi dawekariyê ev madde cîbicî dibe?*

**Mesûd Barzanî:** Di qanûna îdarî ya dewletê de tê gotin ku divê destbicîkirina hukumeta

Îraqê dest pê bike. Ji ber wê jî di wextê xwe de me ew îmza kir. Niha jî hîlbijartin li pêş e. Heke ew asayîkirin berî hîlbijartinan pêk bê tu pirs namînin, heke na, em wek kurd ne razî ne ku ew hîlbijartin (ên Kerkûkê n. B.) çê bibin, ji alî Kerkûkê û cihên tir ên teerîbkirî de zemînê qebûliyê ev e. Kengî ev cîbicî kirin wê wextê jî em beşdarî hîlbijartinan dibin, heke neyê bicîhanîn li wan deran hîlbijartin çênabin. Em îtiraf bi rewşeke wiha nakin û bêşik sebra me jî hidûdekî wê heye. Lê em niha nikarin bêjin dereceya maqûliya zemînê çî qas e.

*Pirs: Aya pêkhatina biyekkirina her du hukumetên herêmî pêş an piştî hîlbijartinan dibe? Aya projeyeke siyasî ya kurdan a piştî hîlbijartinan wê çawa be û helwesta kurdan li ser beşdarîkirina neteweyên din di vê lîsteyê de çî ye?*

**Celal Talebanî:** Em li ser yekkirina herdu îdareyên herêmî a di zûtirîn wext de bi israr in. Dibe ku berî hîlbijartinan jî be lê miheqeq piştî hîlbijartinan dibe. Xaleke din jî ew e ku me divê hemû neteweyên Kurdistanê di vê lîsteyê de nunerên wan hebin ku em ê bi rêkkeftina li gel wan vê bi ser xin.

*Pirs: Helwesta we li gel helwesta PDK çî ye, a ku ragihand ku di destûra tevayî ya îraqê de mafên gelê kurd û mafên netewe û nîstîmanîyan din wek ku kurdan xwestiye neyên ber dest, îraq nikare yekîtiya xwe biparêze?*

**Celal Talebanî:** Ême jî her ew helwesta me heye. Ji bo me wiha ye ku mafê gelê kurd piştrastiya xwe ji mafên çareya xwenivîsînê a xelkê Kurdistanê digire. Chimkî li Îraqê du gel hene; gelê ereb û gelê kurd. Kurd mafê çarenivîsa xwe heye. Mafê çarenivîsê jî kare bibe dewleteka serbixwe, kare bibe mafê konfederaliyê, mafê federaliyê yan jî mafê otonomiyê. Parlamentoya Kurdistanê mafê

federalî hîlbijartiye. Ew federalî pişrast e bi wî mafî ku divê li gor daxwaza xelkê Kurdistanê be. Her kesê ku vî mafî qebûl neke maneya xwe yekîtiya Îraqê naxwaze. Naxwaze ku Îraqeke yekbûyî ya serbixwe hebe û eger ev yekîti ji hev bikeve wê wextê jî webal ne li hustuyê me ye.

*Pirs: Li kombûna Dokanê tu hevpeymanî bi hêzesiyasiyên ereb re pêk nehat. Aya maneya vêya ne ew e ku ew ji dxwaza Kurdistanê federe di çarçeweya Îraqeke federal de paş de vekîşiyane?*

**Celal Talebanî:** Ne xêr ew paş de vekîşiyane. Hemû xwedî lê derdikevin.. Çimkî hûn bi xwe dizanin yek du tiştên muhim hene ji alî derketina naîban. Me dixwest lîsteyek hebe bi du şertan; yek ew e ku Kak Mesûd fermokir, baweriya wan bi Iraqeke federalî a demokrat hebe, ya din jî nîsbeta kurdan di lîstê de wenda nebe. Heke ev tişt bihatana meydanê em amade bûn Lê diyar e hin hêz hene dixwazin bi serê xwe têkevin hîlbijartinan yan jî hin hene ku naxwazin beşdarê hîlbijartinan bibin. Ji ber wê jî em naçar bûn ku lîsteyeke Kurdistanê derxin pêşberî xelkê.

Mesûd Barzanî: Tiştêk li ser ew a ku Mam Celal fermo kir. Lazim e ev hevkarî piştî hîlbijartinan pêk bê, bi teekîd.

*Pirs: Aya ciqas rast e ku du partiyên îslamî tevî vê lîsteyê nabin?*

**Mesûd Barzanî:** Bi xwe Yekbûn beşdar dibe bi teekîd

*Pirs: Raya we li ser derengxistina hîlbijartinan çî ye?*

**Celal Talebanî:** Em dixwazin hîlbijartin di wextê xwe de bîn kirin. Û eger hat û paş de hat xistin, wek Kak Mesûd ji rojnamevanan re got em li dijê nabin. Lê em amade ne ji bo hîlbijartinên di wextê xwe de.

*Pirs: Gelo hîlbijartin wê di wextê xwe de*

*di kanuna duduyê a sala pêşiya me de bîn kirin?*

**Celal Talebanî:** Me kurdan doza paşdexistina hîlbijartinan nekiriye, kurd ji bo hîlbijartinên di wadêyê diyarkirî de amade ne. Eger hêzên Îraqî yên din lihevkerin ku hîlbijartin bîn dereng xistin kurd, rê li ber wan nagirin.

*Pirs: Gelo kurdên derveyî Îraqê jî wê beşdarî hîlbijartinan bibin yan na?*

**Celal Talebanî:** Daxwaza me ew e ku ew jî beşdarîyê li wê prosesê bikin.

*Pirs: Gelo herêmên kurd ên nuhazadkirî jî wê beşdarîyê li hîlbijartinan bikin û wê hukumeta merkezî bê mecbûrkerin ku ew jî karibin beşdarîyê bikin?*

**Mesûd Barzanî:** Di wextê xwe de ku gava qanûna îdarekirina dewletê hat danîn me pîrr mihawele kir, Cenabê Mam Celal û min û ew biraderên din ên kurd ku di encumenê ser hukum de bûn da berî hîlbijartinan ew şûnên ku hatine teerîbkerin yan jî li jêr desthilata rejim bûn û piştî hilweşandina rejim rizgar bûn bîn xistin ser herêmên Kurdistanê, lê bi tu awayî nehat qebûlkerin ne ji bal Amerîkiyan û ne jî ji bal partiyên tir ve. Dawiyê em gihîştin wê çareserkina nevinçî ku normalîzekerina wan herêman bê kirin û dawiyê rapirsîn (referandum) bê kirin û raya xelkê bê wergirtin. Em dilniya ne ku her gava ku ev bê kirin ew bîryara xwe didin ku divê li ku bin.

Me jî ev yek qebûl kir. Heta şerîyeteke wê heye. Loma jî heta eger hîlbijartin jî bibin, em li hîlbijartinên seranserê Îraqê beşdar dibin û em dilniya ne ku wê dengê xwe bidin listeya Kurdistanê.

Ji alî hîlbijartinên herêma Kurdistanê ve jî, hîlbijartinên herêma Kurdistanê cuda ye çimkî rewşa me rewşeke asayî û suruşti (tebîî) ye, tu midetekî întiqalî (geçiş) tune. Lê em bîr li wê yekê dikin ku dema hîlbijar-

tinên ji bo herêma Kurdistanê kurttir bikin da em karibin dawiyê çareserkerina detûrê çareserkerina meseleya teerîbkerinê, vegerandina wan, herêman ser bi Kurdistanê ve û wê wextê hîlbijartineke sertanserî bikin û hemî tê de beşdar bibin. Çimkî heke ew beşdar nebin, niha em parlamentoya xwe netemam dizanin, lê belê ew ê bê çareserkerin, înşallah di demeke kurt de.

*Pirs: Gelo serokatiya siyasî a Kurdistanê bîra wê yekê kiriye ku hevpeymaniyekê li gel şîe durust bike?*

**Celal Talebanî:** Birayê şîe listeya wan bi dilê wan e, têkiliyên me jî li gel biraderên şîe baş e û piştî hîlbijartinan di Encumena Niştimanî de em ê hevpeymaniyê li gel wan bikin. Lê niha na, çawa listeya wan heye ême jî listeya me heye. Her wiha partiyên ilmanî (sekuler, laîk) jî serbest in ku listeyeke wan hebe û înşallah ew jî bi ser dikevin.

*Pirs: Gelo Cepheya Tirkmanî jî beşdarî dike?*

**Mesûd Barzanî:** Cepheya Tirkmanî beşdarîyê nake. Çimkî ew ne amade ne ku di tu karekî wiha de beşdarî bikin. Lê partiyên din hemû beşdar in û rêjeyek (potayek) jî ji bo wan hatiye danîn.

*Pirs: Gelo sunî beşdar dibin û listeya wan heye?*

**Celal Talebanî:** Bi dilê me ye ku birayên sunî beşdariya Îraqê, a hîlbijartinan û a pêşeroja Îraqê bikin, di damezrandina hukumeta îraqê de cih bigirin. Sê fenomenên eslî yên îraqê hene ku hebûna wan bi hev re avabûna Îraqa nû ê pêk bînin. Birayên ereb ên sunnî, birayên ereb ên şîî û xelkê Kurdistanê. Eger ev her sê hêz bi hev re, ne bi tifaq bin, bi piraniyê û bi zorê di rojên pêş de hemû teref li gel wê Îraqê nabin. Û ew Îraq tekûz nabe. Loma jî bi dilê me ye ku rê û mecalên birayên



sunî hebin ew karibin beşdarî hîlbijartinan a danîna hukumetê û Îraqeka nû bibin. Lîsteya me jî ne lîsteyeke kurdî lê lîsteyeke Kurdistanî ye. Her wekî Kak Mesûd fermoyê kir xeyrê kurd jî tê de ye.

*Pirs: Gelo helwesta we li ser beyana Tirkîyê a ku dibêje ew ê esker verêke Kurdistanê da wan şofêrên Tirk biparêze çi ye?*

**Mesûd Barzanî:** Sipas ji Xwedê re ku heta niha ne şofêrêkî tirk û ne jî xerîbekî din li Kurdistanê nehate kuştin. Ew serbest in, tîn ji Zaxoyê diçin heta Silêmaniyê, Xaneqînê. Kesî rê li ber wan negirtiye, tûşî tu dijwariyê nebûne û em umîdwar in ku tûşî tiştêkî jî nabin. Bi me qet nexweş e ku çi ew bin û çi yên din bin li Îraqê tûşî girtin, kuştin û serbîrrînê dibin. Em protesto dikin û gelek pê diêşin. Li Kurdistanê, ne mimkin e ku em razî bibin eskerê tirk were parêzeriya wan bike. Çimkî ne lazim e jî. Pêşmergeyên Kurdistanê û polisê asayîşa Kurdistanê dikarin wan biparêzin. Ji bo herêmen din jî ew eleqa wê bi hukumeta merkezi ya federal ve heye divê li gel hukumeta merkezi biaxêvin.

*Pirs: Gelo Kurdên derveyî welat dikarin beşdariyê li hîlbijartinên Encumena Kurdistanê bikin.*

**Celal Talebanî:** Em mihawele dikin ku ew jî bikaribin beşdariyê bikin.

*Pirs: Gelo tesîra wê civînê ta çi redayê li ser terefên din ên siyasî heye. Ev lihevhatin wê bi temamî karibe bê pêkînan, hemû aliyê peymanê wê karibin bîn çibicîkirin?*

**Celal Talebanî:** Ji hemû aliyên ve wê bê çibicîkirin. Li gel hinekan em rûniştine me axaftiye û hinekan bi telefonê me agahdar kiriye, me xeber daye û me bi wan re li hev jî

kiriye. Loma ev îlan dibe girêdanekê resmî.

*Pirs: Mewqîfê serokatiya kurd li hember wan destdirêjîyên ku li ser hemwelatîyên kurd ên li Mûsilê û li hin navçeyên din ên îraqê tînin kirin çi ye?*

**Mesûd Barzanî:** Helwesta me ew e ku em bi xurtî protesto dikin û em heta dawiyê jî nikarin wek temaşevanekî tenê seyr bikin.

*Pirs: Gelo hûn dikarin ku wê lîsteyê wek pêşniyaz ji hêzên ereb re jî bibin?*

**Celal Talebanî:** Wek me berê jî got me gellek mihawele kir ku em karibin lîsteyeke mişterek a Îraqî derxin lê ev bi ser neket. Ev lîsteya me êdî lîsteyeke Kurdistanî ye. Îlan bûye jî bo hîlbijartinê û em texmîn dikin ku wê nisbeteke baş a hîlbijêran jî dengên xwe bidin wê lîsteyê.

*Pirs: Tê gotin ku lîsteyeke bêteref li derveyî welat xwe amade kiriye ku beşdarî hîlbijartinan bibe? Hûn çi dibêjin?*

**Celal Talebanî:** Welat azad e, herkesê ku dixwaze xwe berendam nîşan bide serbest e bira bide.

*Pirs: Gelo tu mesajeke we bi wê minasebetê ji gelê îraqê re heye?*

**Mesûd Barzanî:** Ew mesaja ku em arasteyî gelê Îraqê dikin ev e: Em pîrozbayiyê li gelê Îraqê dikin. Bi wê gavavêtinê kevirêkî bîngêhîn ê Îraqê federal, demokratîk a pîrpartîtî hatiyê danîn. Tecrube nîşan didin li Kurdistanê çend ber bi aramî û îstîqrarê ve tê çûyîn ev rewş tesîreke pozîtîv li ser tevayîya Îraqê dike.

*Li ser pîrsiyarekê ku guhartina bendekê di parlamentoya Kurdistanê de ku eleqeya wê bi serokatiya Kurdistanê ve heye Mesûd Barzanî got:*

– Belê me lihevkirinek kiriye lê her tişt di wextê xwe de wê bê ragihandin.



# Daxwiyanîya Konferansa Zimanê Kurdî

"Em gazî kurdan dikin ku zimanê xwe di her warê jiyânê de bi kar bînin."

Di çarçeveya Rojên Edebiyatê a Duduyan de ya ku ji bal Belediyeya Bajarêmezîna a Diyarbekirê hatibû organîzekirin di 2-3yê kanûna yekê de bi beşdarbûna 200 ronakbîr û zanayan "Konferansa Zimanê Kurdî" civiya. Li konferansê li ser zimanê kurdî nêzî 20 teblîx hatin pêşkêşkirin. Di konferansê de ku li ser rêziman û rastnivîsîna kurdî guftûgo hatin kirin ev biryarên jêrîn hatin girtin:

1- Zimanê kurdî yê ku yek ji wan zimanên kevnare yê malbata zimanên Hîndû-Ewrûpî ye, gelek avayîyên dewra kevn ên zimanên Hîndû-Ewrûpî ragihandine dewra îro û ew zimanekî dewlemend ê kultur û edebiyatê ye.

2- Lehceyên kurdî heta niha bûne behsa gelek mînaqêşeyan û rûmetkirinên dijber û newekhev. Bawerîya beşdarên konferansê ew e ku pîrsa sinifandina lehceyên kurdî divê bê sipartin zimanzanan. Her wiha beşdarên konferansê lêkolîn û ronahîkirina lehceyên kurdî li ser bîngê zanistî, wek berpirsiyariya zimanzanên zimanê kurdî û ya dezgehên kurdî dizane. Berpirsiyariyeke din a zanayên zimanê kurdî jî ew e ku xerîteyeke zanistî a devok û lehceyên kurdî derxin.

3- Beşdarên konferansê ku hemfikir in li ser rûbirûmayîna xetera wendabûnê a zimanên ku di her aliyên jiyânê de neyên bikaranîn, bawer dikin ku her zimanek rengêk û dewlemendiyek e. Loma jî divê şansê jiyânê ji bo her zimanî bê dayîn. Li ser vî bîngê bawerî û hêviya me ew e ku her kes ji zimanê xwe hez bike û rêzê lê bigre. Her wiha hezkirina ji zimanê xwe û hînkirina wî bi zarokên xwe berpirsiyariya her dê û bavekî kurd e jî.

4- Li Tirkîyê her çendî di qanûnan de

guhertin hatine kirin jî di siyaseta înkarkirinê de ya li hemberî zimanê kurdî tu guhertin nebûye. Vê siyaseta reng û awayekî din daye xwe. Îro siyaseta ku tê derxistin pêşberî zimanê kurdî siyaseta zimankujîyê ye. Ronakbîr û zimannasên ku beşdarî konferansê bûne, li Tirkîyeyê ji bo zimanê kurdî azadî û wekhevîyê dixwazin û doz dikin ku kurdî li tevayîya Tirkîyeyê bibe zimanê resmî. Zimanê kurdî ji mekteba destpêkê heta unîversîteyê di hemû dezgehên hîndekariyê de divê bibe zimanê hîndekariyê, ew asteng û tengavkirinên ku li hember weşanên radyo û televîzyonên kurdî hatine derxistin bi tevayî divê ji navberê rabin û radyo û televîzyon 24 saetan karibin weşanan bikin. Ji bo vê jî hebûna kurdan û a zimanê kurdî divê bigihîje garantiya destûra esasî.

5- Beşdarên konferansê gazî li kurdan û dezgehên kurdan dikin ku zimanê xwe di her warê jiyânê de bi kar bînin.

6- Beşdarên Konferansa Zimanê kurdî biryar dan ku ji Hukumeta Federe ya Kurdistanê re pêşniyaz bê kirin da ew konferan-seke fireh li ser zimanê kurdî bicivîne. Ji bo vê, komîteyeka amadekirinê hat pêkînan. Lazim e ev konferans bi beşdarbûna berpirsiyarên dezgeh û komikên xebatên zimanê kurdî ên her çar perçeyên welêt pêk bê, pîrs û pîrsgirêkên zimanê kurdî bîn mînaqêşekirin û biryar bîn girtin.

7- Beşdarên konferansê biryar dane ku belgeyên konferansê bîn çapkirin.

8- Konferansa me balê dikêşe serê ku ji bo pêşketina zimanê kurdî, rewşeke aşîdar girîng e û ji bo çareserkirina pîrsa kurdî doza aşîyê dike.

# Yekîtiya Ewrûpayê, endametîya Tirkiyeyê û pirs a kurdî

Komîsyona Yekîtiya Ewrûpa (YE) li ser destpêkirina danûstandinên di derbarê endametîya Tirkiyê da sê rapor/belge weşandin. Yek ji wana, rapora Komîsyonê a peryodî li ser navê “2004- Rapora Li Ser Pêşvaçûyîyên Tirkiyê” ye. Ya duyem, “Beyannameya Komîsyonê ji Konsey û Parlemana Ewrûpayê ra” ye. Di rapora seyem da, qala pirs û encamên ku bi endametîya Tirkiyê va girêdayî tê kirin.

Vajoyî daxwaza rêxistinên Kurdan, Komîsyona YE di raporên xwe da, xasma di rapora peryodî da, Kurdan wekî hendikanî (mînorîte) dihesibîne. Bi gotineke din, wê Kurd wekî netew an gel bi nav nekiriye. Bi vê tewrê, dide xuyakirin ku, ew rûmetê nade hemdiya (îrade) Kurdan ya ku ji ber şertên halûhazir bi destê rêxistinên Kurdan ên siyasî û civatî tê temsîlkirin. Tenê carekê, (r.49) Kurd wekî grubgel (“Volksgruppe”) tên binavkirin. Grubgel binavkirineke nêzikî peyva gel e, lê Komîsyonê ew bi çi meneyê bi kar anîye ne diyar e. Eceba Komîsyonê çima hewce dîtiye ku gotina “grubgel” bikar bîne? Va nava carna ji bo yî gelan yên ku di dewleteke pîrgelî da dijîn û bi meneya hendikanîya netewî tê bikaranîn. Wekî tê zanîn, Tirkiyê rastîya xwe ya pîrgelî napejrîne, xwe wekî dewleteke yeknetew dibîne. Loma divê meriv hewlbide ku rastîya Tirkiyê ya pîrgelî bê qebûlkirin. Ma komîsyonê nexwastibe ku bi vê binavkirinê diyar bike, ku Kurd gel in jî, an jî pirs a kategorîze kirina Kurdan hîn

vekirî ye?! Ku wekî ehtimal bê hesibandin jî, gerek meriv wê paşçav neke û bikanibe li gora merema Kurdan bikarbîne.

Ji hêla din da, Komîsyonê bi giranî qala pirs a kurdî di beşê rapora peryodî ya li ser navê mafê meriv û hendikanîyan da kiriye. Komîsyonê di rapora xwe da, gotinên wekî, “mafên hendikanîyan”, “parêztina hendikanîyan” û “maf û azadî bo Kurdan” jî bi kar anîye. Lê wê gerek nedîtiye an nexwaztiye ku vekirî tarîfa hendikanî û ya maf û statûya wê bike; wê ev sernixmandî hîştîye. Di lîteretûrê da, hendikanî bi navên wekî, “hendikanîya etnîyî”, “hendikanîya zimanî”, “hendikanîya çandî”, “hendikanîya olî”, “hendikanîya netewî” tên rêzkirin. Yanê cîsn bi cîsn hendikanî heye. Ma li gora dîtina Komîsyonê Kurd çi cîsn hendikanî ye? Wê bi awayekî vekirî û zelal Kurd nexistine kategorîyeke ji vana û meriv dikane bibê, wê va pirs a bervekirî hîştîye. Lê ji awayê ku di raporê da hatiye katkîrin, meriv dikane derbixe ku, ew Kurda wekî hendikanîyeke çandî û zimanî dide xuyakirin.

Şayanî gotinê ye ku, di navbera hendikanîya netewî û yên din da, herçiqas bi minezere be jî, ferq heye. Li gora hen dîtîn û pretîkan hendikanîya netewî wekî netewekî piçûk di nav sînore dewletekê da, an parek ji netewekî parçebûyî tê dîtîn û layiqî mafê xwe bi xwe îdare kirinê tê pejrandin (qebûlkirin).

Kurd gel e û li Kurdistanê (Tirkiyê) pîranî ye, lê li tevayî Tirkiyê li gora krîtera

hêjmarîyê hendikanî ye jî. Li wir, meriv dikane bibê, ne Kurdên Kurdistanê, lê yên Anatolîyê hendikanî ne. Hendikanî pîr caran bi meneya nispeta hêjmarîyê û xasma boyî komên ku bi cûdatîyên zimanî, olî, etniyî û netewî jî piranîyê vediqetin, tê bikaranîn. Tirkîyê, ji ber ku naxwazê cûdatîyên li ser vê bingehê bipejirîne, dijî peyva hendikanî derdikeve. Ji ber vê jî, hewce ye ku meriv, wexta ew li dijî binavkirina Kurdan wekî hendikanî derdikeve, diqet bike ku ew nekewe pêş şîra “aslî unsur” û bi vê rê, nêt ne ew be jî, nebe piştbazê fen û fut, şaşî û şovenîya desthelatîya Tirkîyê. Divê meriv xwe di paş gotinên han da veneşêre û mereme xwe ya di derbarê maf û statûya bo Kurdan da bi awayekî eşkere û zelal bîne ziman. Hun li tirt û virtên Tirkîyê mezmekin, li dawîyê ewê, ger bibe endamê YE, mafê hendikanîyan li gora “Peymana Ewrûpa ya Çarçîva bo Parêztina Hendikanîyên Netewî” bipejirîne. Wekî tê zanîn, di statûya hendikanyan da, li gora vê peymanê mafê kollektîf, wekî yê xwe bi xwe îdare kirinê tune ye. Hendikanî, grubgel an gel, ji binavkirinê bêtirtir maf û statûya ku bê dayîn an bê xwaztin jî giring e. Divê mafê Kurdan hebe ku, ew di çarçîva sîstem û dewleteke pîrgelî û federalî li gîştî Tirkîyê, bêyî ku sînor bèn guhêrîn, di derbarê jîyana xwe ya aborî, îdarî, sîyasî, çandî û pêşeroja xwe da bi serî xwe û li herêma xwe bikanin kollektîf biryar bidin. Loma, gerek Kurd bi statûya hendikanîyê, ger va mafa tê da tune be, qet razî nebin.

Komîsyonê nexwaztiye an newêriye ku navê welatê Kurdan, Kurdistanê bîne ser zimanê xwe. Şûna vê, wê gotina fermî ya Tirkîyê, “başûrê rojava” bi kar anîye. Ewropî bêşik navên welatên ku bi cîh û coxrafîya xwe

wekî Kurdistnê ne, mînak Katalanya, Bask, Kosova, Korsîka û yd. tînin ziman. Lê kîngê dor tê Kurdistanê, ew dev û lêvên xwe nûre serhev dikin û xwe li lalîyê dinin.

Di raporê da, meriv dikanê bibê, di derbarê her mijarekê da kêma û zêde rexne û pêşniyarê Komîsyonê cîh girtiye. Tenê, di derbarê sîstema Tirkîyê ya ûnîter-merkezî da qet tiştek nehatiye gotin. Ma ne va sîsteme ye, ku li ber bikaranîya mafê xwe bi xwe îdare kirinê yê Kurdan astenga herî mezin e ?

Helbet di raporê da, tiştên baş jî, xasma di derbarê demokratîze kirina Tirkîyê da hene. Berî her tiştî, eger Konseya YE, li ser tewsiya Komîsyonê sînyaleke pozîtîf boyî destpêkirina danûstandinên endametiye bide, hîngê guman heye, ku heyamekî hînî çêtir dê boyî guhêrînên nû û berferêh pêda bibe. Şayanî gotine ye, ku destpêkirina danûstandinên endametiye û bi rû wê da destketîyên li Kurdistanê (Irak) ê wekî du faktorên pozîtîf û sereke bêguman tîneke tîr li çareserkirina pîrsa kurdî bikin.

Xuya ye, ku endametiya Tirkîyê dê di pevajojê dirêj û dijwar ra derbas bibe. Di vê pevajojê da, eger meriv berendamên wekî Bulgarîstan, Hirvatya, Romanya, Tirkîye û Kurdan jî wekî teref bide ser, bîst û heft aktor dê xwedîyê rol bin. Ji ber vê jî, gerek e, Kurd rojkê pêş da, li gora vê hazîriyên xwe bikin. Divê rêxistinên Kurdan berê di nav xwe da diyalog û yekdengîyeke pîr pêk bînin. Eger va nebe, ewê di vê pevajojê da roleke kêleki bilzîn û di rêya bidestxistina merêma xwe da bi ser nekevin; dest betal bimên.

Têbinî: Ev nivîsara (şîrove) bo kovara Bîrnebûn, hêjmara 25 an hatiye amadekirin û ji rojnameyên Kurdî Dema Nû û Peyama Kurdî ra bo weşandinê hatiye şandin.

## *Komîsyona Yekîtiya Ewrûpayê*

### **Belge I:**

#### **RAPORA PERYODÎ SER PÊŞVA ÇÛYÎYÊN TÏRKÎYÊ DÎ RÊYA ENDAMETÎYÊ DA**

##### **B. Krîterên Endametîyê**

##### **1. Xurtkirina diyaloga sîyasî û krîterên sîyasî**

(...)

Tirkîyê peymanên sernetewî û ewropî ên girîng, wekî peyman (Pakta) internasyonal di derbara mafên sîyasî û hemwelatîtiyê da, peyman li ser mafên sosyal û aborî û protokola şeşan ya Konvensiyona Ewrûpa ratîfîze kiriye.(...)

(...)

Boyî rakirina qedexeya li ser weşanên radyo û televîzyon û dersdayîna bi zimanê xêrî tirkî gav hatine avêtin. Lê reformên di vî warî da, di pretîkê da hîn tîna xwe nenimandine.(...)

##### **1.3. Mafên Meriva û Parêztina Hendikanîyan**

(...)

Tirkîyê Ji sala 1999 an vir da gelek peymanên sernetewî yê di derbara mafên meriva qebl kiriye: Peymana (Pakta) Yekîtiya Milletan (YM) di derbara mafên sîyasî û hemwelatîtiyê, Peymana YM li ser mafên aborî, sosyal û çandî (lê bi êhtiraz), Protokola 6a ya Konvensiyona Ewropî bo parêztina mafên meriva û azadiyên bingeh (EMRK) bi mebesta rakirina ceza yê kûştinê, Peymana YM li ser rakirina her çeşid

rasîzmê, Peymana Ewrûpa ya di derbara mafên zarokan da. (...)

(...)

Tirkîyê (...) peyman çarçive bo parêztina hendikanîyê netewî (...) hîn îmze nekiriye.

(...)

Li gora agahdariya fermî, li Tirkîyê, li gora peyman Lozanê tenê hendikanîyên ne Muliman hene. (...) Lê li Tirkîyê, Kurd jî tevê, grubgelên ("Volkgruppen") din jî hene û divê mafê wana yê parêztina nasnameya zimanî û çandî di çarçiveya huquqa sernetewî da bê dîtin. Ji ber vê jî, êhtirazên ku Tirkîyê daniye ser peyman (Pakt) YM di derbara mafên sîyasî û hemwelatîtiyê da û ser mafê perwerdeyî û mafên hendikanîyan li ser bingeha peyman YM boyî mafê aborî, sosyal û çandî dê bibin sedemên tahlîyan. Guman heye ku, van êhtirazan li hemberî pêşvaçûyîyên teze û pozîtîf û gavên nû di derbara parêztina hendikanîyan da wekî asteng bînan bikaranîn. (...)

Di warê parêztina mafên çandî da, ji sala 1999 an vir da, pêşvaçûyîyên girîng pêk hatin. Bi guherîna makqanûnê qedexeya li ser zimanên xêrî Tirkî hate rakirin.(...)

Li hember van pêşvaçûyîyan dîsa jî li ser bikaranîna mafên çandî qeydûbendê giran hene.(...)

(...)

Di qanûna helbijartinê da hîn tu guhêrîn çênebûye, ango hendikanî ji ber astenga %10 nikanin bi partiyên sîyasî di parlemanê

da bèn temsilkirin. Bikaraniya zimanê xêrî Tirkî, ji partiyên siyasî ra hîn qedexa ye. (...)

## Belge II:

### BEYANNAMEYA KOMÎSYONÊ JÎ KONSEY Û PARLAMENA EWRÛPAYÊ RA

Tewsiyên Komîsyona Ewrûpa Di Derbara Pêşvaçûyîyên Tirkîyê Li Ser Rêya Endametiye

2. Nirxandina li ser bicîhanîna krîterên siyasî

(...)

Tirkîyê peyman û biryarên dadigehên sernetewî ên bijarte êpêy pejrandiye. Mînak, rakirina cezayê kûştinê û azadkirina kesên ku ji avûrûyê îfadekirina ramanê ceza xwaribûn. Herçiqas di pretîkê da hen tengî hebin jî, Tirkîyê bo hemwelatîyên Tirk azadiyên bingeh yên ramanî û civandinîyê pir berfereh kiriye. Civatiya sîvil bi rûmet bûye. Qedra mafên Kurdan yên çandî her diçe tê zanîn. Sazûmana awarte li her derê rabûye û herçiqas li herêma başûrê rojavayê Tirkîyê dijarî hebin jî, pevajo normalîyê dewam dike.(...)

(...)

Di warê reformên siyasî da, Tirkîyê, xasma di saye gûhêriyên di makqanun û qanunan da yên ku li gora hevalbendîya endametiye pêwîst bûn, gavên giring avêtine. Lê li hemberî vê, qanuna komela û qanuna ceza ya nû hîn nehatiye qebulkirin.(...)

(...)

Tirkîyê sewa bicîhkirina van reforman, di pretîkê da pir li ber xwe dide. Lê dîsa jî, gerek e, bicîhkirin û berferehkirin bidome. Xasma, "politîka sifir-tolerans" di derbara berterefkirina eşkencê û ezîyetê û pîtkirin û bicîhkirina biryarên di derbara azadiya ramanî û olî û

mafên jina, sendikayan û hendikanîyan da.

Li ser bingeha pêşvaçûyîyên di pêvajoya reforman da, û eger qanunên kê mî jî bèn qebûlkirin, komîsyon di wê bawerîyê da ye ku Tirkîyê krîterên siyasî bi awayekî berbaş bi cîh anîye û destpêkirina danûstandinên endametiye tewsiye dike.

3. Nirxandina pirsên ku bi endametiya Tirkîyê va girêdayî

(...)

Guman heye ku, ji ber encama faktorên wekî hêjmara nifûs, mezinahiya welêt, cîhê wî yê coxrafî û potensiyala wî ya aborî, ewlekariya siyasî û leşkerî endametiya Tirkîyê ji ya yên berî wê cûda bibe. Bi vekirina rêya endametiye pêwendiyên navbera Tirkîyê û cîranên wê, dê li ser prensîba lihevhatinîyê ya ku Yekîtiya Ewrûpa li ser ava bûye, baştir bibin.(...)

(...)

Tirkîyê di nav dewreke bi gûhêriyên kûr ra derbas dibe. Pê ra, nêrîn û taybetên merivan jî dê zûbizû bèn gûhêrîn.(...)

Tirkîyê dikane bibe modeleke giring ya welatekî ku, piraniya rûniştvanên wê Musliman in, lê li nirxên bingehî ên wekî azadî, demokrasî, dadî xwedî derdikeve û qedra mafên meriva û azadiyên bingeh dizane.

(...)

Vekirina danûstandinên endametiye dê hewldanên Tirkîyê di warê xurtkirina aboriya makro û şixûlandina sermiyanê, mezinbûna aborî û pêşvaktina sosoyal bipekîne. Di bin van mercan da, divê bê payîn ku, li Tirkîyê bera hundurî ya brut bi ser ya navînnîrxê YE keve.(...)

(...)

Herçiqas encamên lêkolînên di vî warî da hevûdu negrin jî, divê bê payîn ku li pêy endametiye, koçberên din jî ji Tirkîyê werin



YE. Divê meriv bide berçavan ku demeke dirêj, bi rêya tedbirên parêzîyê, ber li dijwariyên ku bi ser bazara kar ya YE bên xwarê, bê girtin.(...)

4. Alîkarî û xurtkirina pêvajoya reforman li Tirkîyê

Pêwîst e ku bicîhkirina reforman bêrawestandîna bêtir kirin.(...)

(...)

Pêwîstiya pîtîkirin û berferehkirina reformên ramyarî di warê rehetkirina rewşa li herêma başûrê rojavayê welêt û tevî vê tedbirên boyî çetîrkirina rewşa aborî, sosyal û vegera peneberan û herweha gerentîkirina maf û azadiyan bê bendûqeyd ji Kurdan ra.(...)

6. Geşkirina diyaloga navbera Yekîtiya Ewropayê û Tirkîyê

Diyaloga derbarê hen aliyên pêwendiyên di navbera YE û Tirkîyê da bê geşkirin. (...)

(...)

Divê cûr bi cûr forum bêt lidarxistin û tê da merivên ji welatên YE û ji Tirkîyê bêt ba hev, serbest û vekirî li ser tirs û tahlîyan dîtînen xwe ji hev ra katîkin. Mijarên wekî cûdatiyên olî û çandî, problemên koçberiyê û yên di derbara mafên hendikanîyan û terorîzmê da li wir werin mineqeşekirin. Di vê diyalogê da, gerek e rola mezin sazîyên sîvîl bilîzin û YE ji alîkariyê bide wana.(...)

7. Encam û tewsiye

(4) (...)

Komîsyon meşandina stratejiyêke li ser sê lîngan pêşniyar dike. Hevkarî di warê xurtkirin û alîkarî dayîna pêvajoya reformên li

Tirkîyê, xasma di warê bicîhanîna krîterên Kopenhagê, lingê yekem e. (...)

(5) (...)

Ger dijraberiyeke giran û domdar li hember prensîbên azadî, demokrasî, dadî û rêza ji mafên merivan û azadiyên bîngeh yên ku hîmen Yekîtiya Ewropayê ne, pêk bê, Komîsyon dê rawestandîna danûstandînen endametiye tewsiye bike. Konseya Ewropa divê di derbara vê tewsiyê da bi raya piraniyêke qualîfîze biryar bide.

(6) (...)

Lingê duyem yê stratejiyê di derbara birêvabirina danûstandînen endametiya Tirkîyê da ye. Danûstandînen endametiye dê çarçiveya konferansa hukumetan da bêt meşandin. Di konferansa da, gerek e ku endamê YE gişt beşdar bibin û biryar bi raya giştan werin dayîn. (...)

Pêdank(îlawe):

Encamên Rapora periyodî li ser Tirkîyê

(...)

Di derbara pîrsa parêztina hendikanîyan û bikaranîna mafên çandî da, boyî ku qedexeya li ser zimanê kurdî û li ser zimanên din bê rakirin, makqanun hat guhertin. Li başûrê rojavaya Tirkîyê çend dbistanên zimanê kurdî hatin vekirin. (...)

Divê gavên di derbara mafên çandî da hatina avêtin tenê wekî destpêk werin pejrandin. Xasma di warê weşana radyo û perwedeya bi zimanên hendikanîyan da pir astengi hene. (...)

Têbinî: Ev beşên raporê ji nûsxeyên bi zimanê elmanî ji alî Nuh Ateş ve hatine wegerandin ser kurdî.

RAPORA PLATFORMA KURDÊN LI EWRÛPA PKE – PLATFORM) LI SER

## Berendametîya Komara Tirkîyeyê ya ji bo yekîtiya Ewrûpayê

Pêşgotin:

(...)

Ne dewletên rojava û ne jî dewletên din yên di siyaseta cihanê de desthilatdar in, heta nuha ji bo çareserkirina pirsê Kurd û Kurdistanê tu gavên ciddî neavêtine. Di pirsê çareserkirinê de gelê kurd heta îro jî wek xwediyê pirsê, wek muhatab an wek terefê sêyem nehatiye qebûl kirin.

(...)

Kêmasîyeke pîrr mezin e ku heta nuha tu dewletên YEê, milletê kurd bi awayeke fermî ne wek teref û ne jî wek xwediyê pirsê qebûl kiriye.

Şaşîtiyek pîrr mezine ku YE, pirsê Kurd û Kurdistanê (Bakurê Kurdistanê) bi Komara Tirkîyeyê(KT) wek “pîrsa mirovî, çandî û ziman” çareser bike.

Em careka din dîyar dikin ku gelê kurd ne kêmneta ye û bi dîroka xwe, bi ziman û çanda xwe neteweyêke bi serê xwe ye. Loma jî divê di pirsê çareseriyê de gelê kurd jî cihê xwe bigre. Heger ewa ne be, dê pîrsa kurd û Kurdistanê wek pîrsgrêkeke girîng di rojê YEê de bimîne. Herweha ew ê careka din Tarîx Dubare bibe. Wek nimûne : Sala 1639 û sala 1923.

(...)

Komara Tirkîye(KT) jî destpêkê heta îro hebûna kurdan wek millet înkâr kiriye û gava ku gelê kurd doza mafê xwe yên neteweyî

û demokratîk kirîye, bersiva KT her zilm û zordarî û jenosîd bûye.

(...)

Em Platforma Kurdên li Ewrûpayê PKE – PLATFORM, li pîrsa kurd û Kurdistanê weke pîrseke siyasî ya miletekî û weke we-latekî bindest û dabeşkirî dinêrin. Em rêya çareseriyê di qebûlkirina mafên milletê kurd yên neteweyî û demokratîk de dibînin. (...)

### PIRSA NASNAMEYA KURD

Li KT yê kurd bi nasnameya xwe nayê naskirin û hebûna kurdan wek Netewe an Gel bi awayeke fermî heta îro jî nehatiye binavkirin.

– Divê nasnameya kurdan ya neteweyî û hemû maf û azadîyên ku bi vê nasnameyê ve girêdayî ne di Qanûna Esasî ya KTyê de weke mafên kollektîf bînin bicîhkirin û garantîkirin.

– Divê nasnameya kurd, zimanê kurdî û welatê kurdan Kurdistan di qanûna esasî ya KTyê de bê bicîhkirin û garantîkirin. Divê hemû maddeyên îdeolojîk û fanatîk ên ku di qanûna esasî ya KTyê de hene werin derxistin û qanûna esasî ya nuh bê amadekirin.

– Komara Tirkîye, bi zanebûn navên gund û bajar û hemû deverên cografîk yên ku bi kurdî bûn guherandîye û kirîye bi tirkî. Divê evan guherandinan careka din ji nuh ve, di bin çavdêriya YE ê û Rêxistinên Civakî yên Sivîl yên kurdî ve serast bibin.

Statuya ZIMANÊ KURDÎ û mafê PERWERDEKIRINÊ :

Divê zimanê kurdî jî wek zimanê tirkî

bibe xwedî statuyeke resmî. Loma jî, ji bo KTYê pêwistîya bernameyek taybetî ji bo pêşveçûn û parastina zimanê kurdî heye.

Bi alîkariya aborî ya YE ê û di bin çavdêriya Rêxistinên Civakî yên Sivîl (NGO=Rêxistinên nehukumetî) û yên kurdan zimanê kurdî wek zimanekî perwerdeyê were bikaranîn. Mamosteyên zimanê kurdî werin perwerdekirin. Di vê hazirîyê de divê bikaranîna bîrûbawerîyên îdeolojîk û nijadperest neyên bikaranîn û di warê naverokê de mudaxuleya dewletê ne be. Heta ku endametîya resmî ya KTYê ji alîyê YE ê ve bê qebûlîkirin, divê her hemwelatî bi zimanê xwe yê zikmakî di hemû sewiyeyan de, ji sinifa yekê û heta dawîya xwendina bilind bibe xwedîyê mafên xwendin û perwerdeyê.

– Divê enstîtûtîyêke taybetî ji bo parastin û bipêşdexistina zimanê kurdî were damezrandin û Komara Tirkîyê jî, ji bo bicîhanîna van erkan berpirsiyar (mukellef) be.

### MAFÊN XWEÎFADEKIRIN Û XWE BIRÊXISTINKIRINÊ :

(...)

– Azadîya fikir û serbestîya damezrandina rêxistinên sîvîl, demokratîk û siyasî bi naxnameya kurdî divê wek mafên bingehîn di qanûna esasî ya KTYê de bê bicîhkirin û garantîkirin. Herweha, divê qedexeyên ku heta îroj jî li ser mafên axaftin û propagandaya siyasî ya bi zimanê kurdî hene, werin rakirin.

### PEYMANÊN NAVNETEWÊYÎ Û

### KONVENSIYONÊN KU KT ÎMZE KIRIYE :

(...)

– Divê KT hemû şerh û şertên xwe yên ku ji bona pêşilêgirtina maf û azadîyên gelê kurd ku ne li gor pîvanên peyman û konvensiyonên navneteweyî ne rabike û pêwistîyên pîvanên wan peymanan û konvensiyonan bi tevahî bi cîh bîne.

### PIRSA WEŞAN Û ÇAPEMENÎYÊ :

(...)

– Divê hemû weşanên çapemenî û ragîhandinê yên weke weşanên TRTYê, ji bernameyên zarokan bigre heta bernameyên li ser ziman, kultur, dîrok, nûçe û magazînan çawa bi zimanê tirkî amade dibin, herweha bi zimanê kurdî jî amade bibin.

(...)

– Divê YE ê û KT ê, ji bo bipêşdexistina herêmên Kurdistanê bernameyêke taybetî amade bike û di zûtirîn wext de vê BERNAMEYÊ derxîne pêş û têxe jiyane.

(...)

### PIRSA ABORÎ:

– Divê ji alîkariya aborî ya ku ji terefê YE ê ve ji bo hazirîya berendametîya KTYê hatiye qebûl kirin, beşek ji vê alîkariyê li gor hejmara kurdan, ji bo bipêşxistina herêmên Kurdistanê, zimanê kurdî, xwendin û perwerdeya bi kurdî û ji bo bi serbestî vegera penaberan were serf kirin. Ev alîkarî divê di bin çavdêriya NGO yên kurdî û yên Ewrûpayî de were serf kirin.

(...)

– Ji bo ku di vê pêvajoyê de neheqî li kurdan neyêkirin, heta tarîx dayîna muzakereyên bi KTYê re, divê di bin berpirsiyariya YE ê de dezgeheke çavdêriyê pêk were.

### Pirsa Kurdên li Ewrûpayê :

(...)

– Divê li hemû welatên YE ê de, ji kurdan re mafên kulturî û kêmneteweyî bête naskirin. Herweha civata kurd, weke civateke ku ne xwedî dewletek serbixweyê bête nixrandin û qebûlkirin.

Îroj, hejmara kurdan ya li tevahîya Kurdistanê jî 35 mîlyonan zêdetir e. Bi tenê li Dew-

leta Komara Tirkîyeyê (KT) ji % 30 yê nifûsê kurd in. Di hundirê sînorên Yekîtîya Ewrûpayê (YE) de nêzikî milyonek kurd dijîn.

*Di pêvajoya çareserîyêke adil û rewşa ya ji bo pîrsa kurd û Kurdistanê de, van daxwazên li jêrîn, divê berîya destpêkirina muzakereyên endametiye ya di navbera KTYê û YE ê de pêk werin. Herweha divê YE ji bibe çavdêr û garantorê vê yekê!!!*

(...)

3- Divê KT dev ji sîstema xwe ya kevnare, merkezî û otorîter berd e û sîstemeke desentralîze hilbijêre. Divê ji bilî kar û barên bergirîya welêt û ji bilî karûbarên derve, hemû karûbarê din dewrî Îdareya Herêmî ya Kurdistanê û Parlementoyê Herêmî ya Kurdistanê bibe.

4- Divê rê li ber legalîzekirina tevgera siyasî ya kurdî bê vekirin û partiyên kurdî bi nav û nasname û programên xwe ve karibin bîn damezrandin.

Divê partiyên siyasî neyên qedexekirin û girtin. Herweha, divê ji bo temsîleke adil û rewşa baraja ketina parlementoyê li gor pîvanên dewletên YE ê bê seraskirin ango ji %10 bê %4an.

(...)

Bi pîr kurtî jî be armanc û prensîbên Platforma Kurdên Ewrûpayê PKE – PLATFORMÊ evana ne.

(...)

Platforma Kurdên Li Ewrûpayê (PLATFORM), di wê bawerîyê deye ku, muzakereyên di pêvajoya berendametiya KTYê û danûstendinên wê yê bi YE ê re, li ser rewş û pêşeroja kurdan jî xwedîyê tesîreke mezin, girîng û pîralî ye. Li gel vê yekê jî kurd bi îradeya xwe ya siyasî û azad weke xwedîyê dozê û teref di vê pêvajoyê de cîhên xwe nagirin.

Dive kurd, di pîrsa kurd û tesbîtkirina statuya Kurdistanê de xwedî peyv û desthilat bin.

21.08.2004

Platforma Kurdên Li Ewrûpayê

PKE - PLATFORM

Platforma Kurdên li Ewrûpayê (PKE – PLATFORM), ji nûnerên sê beşên civata kurd;

1. Platforma Neteweyî ya Kurdistanê Bakur - PNK-Bakur,

2. Însiyatîfên Kurdên li Ewrûpayê – IKE - ÎNSIYATÎF,

3. Koordinasyona Demokratîk a Kurdên li Ewrûpayê - DEM-KURD ve di 20-21.07.2002 de li Swêdê li bajarê Stockholmê hate damezrandin.

PNK – Bakur : Partiya Azadî Demokrasî ya Kurdistanê - PADEK, Partiya Îslamî ya Kurdistanê - PIK, Partiya Sosyalîst ya Kurdistanê - PSK, Rêxistina Sosyalîst û Demokratîk ya Kurdistanê - RSDK, Partiya Rizgarîya Kurdistan - PRK-Rizgarî

ÎKE - ÎNSIYATÎF : Insiyatîfa Kurdên Almanya-IKA, Insiyatîfa Kurdên Danimarka-IKD, Insiyatîfa Kurdên Fransa-IKF, Insiyatîfa Kurdên li Swêdê-IKS, Insiyatîfa Gelê Kurdistanê li Swîsre-IGKS.

DEM – KURD : Civata Kurd (Giessen) , Civata Kurd li Elmanya (Koln), Dengê Kurdan li Duisburgê , Hevkar-Elmanya, IVK (Mainz) Komela Navnetewî ya ji bo Mafên Mirov li Kurdistan (Elmanya), Yekîtîya Komelên Kurdistan-KOMKAR(Elmanya) FKKS Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, Kitêbxaneya Kurdî li Stockholmê, Komela Kurdistan li Belçîka, Komela Çanda Karkerên Kurdistan-KOÇ-KAK, Komela Karkerên Kurdistan - Avusturya, Komela Karkerên Kurdistan- Danimarqa, Komela Karkerên Kurdistan Swîsra, Komela Karkerên Kurdistan-Frensa, Kurdish Advice Centre (Britanya Mezin), XOYBÛN-Berlin, XOYBÛN-Danîmerqa, Yekîtîya Karkerên Kurdistan li Holland, ) Mala Kurd li Biremen, Mala Kurd li Lubek, Mala Kurd li Paris

(Ji malpera PSK-Dengê Kurdistan hatiye wergirtin)

# KONGRA-GEL: Ne tenê Tirkiye wê kurd jî bikevin YE'yê

**ROJ TV** - KONGRA-GEL, berî rapora li ser endamtiya Tirkiyê ya komîsyona Yekîtiya Ewrûpa ya ku wê di 6ê cotmehê de were eşkerekirin, bal kişand ser pirsgirêka Kurd. Komîteya Têkiliyên Derve ya KONGRA-GEL, bi belgeyekê de cîh da daxwazên berçav ên gelê kurd û xwest ev yek di Destûra Bingehîn de cîh bigirin. KONGRA-GEL destnîşan kir, daxwazên 40 milyon gelê kurd, nabe ku were paşçavkirin û got, „Ne tenê Tirkiye, gelê Kurd jî ê bikeve Yekîtiya Ewrûpayê.

Komîteya Têkiliyên Derve ya KONGRA GEL, bi navê „Ji bo Kurdan Yekîtiya Ewrûpayê û Tirkiye“ belgeyek weşand û di endamtiya Tirkiye de, hêviyên gelê kurd destnîşan kirin.

KONGRA GEL, di belgeyê de cîh da pêşniyarên aşiyane û weke belgeyekê şand ji bo Komîsyona Ewrûpayê, Serokê Parlamena Ewrûpayê Josep Borrell, Komîserê Ji Berfirekîrîna Yekîtiya Ewrûpayê Berpirsyar Gunter Verheugen, parlamenê Parlamena Ewrûpayê û serok dewletên welatên endamê Yekîtiya Ewrûpayê.

Di belgeyê de KONGRA GEL destnîşan dike ku ew li dijî pêvajoya endamtiyê nînin, lê belê heger Tirkiye beyî ku hebûna gelê kurd, nasname û çanda wî di Destûra Bingehîn de bi ewle bike, bibe endama yekîtiyê, ev ê were wateya dewama polîtîkaya îmha û înkare.

## **KONGRA GEL ji YE'yê re daxwa-zên Gelê Kurd pêşkêş kirin**

Komîsyona Têkiliyên Derve ya KONGRA GEL di belgeyê de ji bo polîtîkaya neçareserî û xitîmandinê were rakirin, daxwazên gelê kurd wiha rêz kirin:

–Ji bo pirsgirêka kurd bi aşiyêke berdewamî were çareserîkirin û Tirkiye pîvanên Kopenhagê bi cîh bîne, divê komîsyoneke navendî ku kurd jî tê de cîh bigirin, were sazîkirin. Divê komîsyona mijara gotinê bi kurdan re bikeve diyalogê û di navbera Tirkiye-Yekîtiya Ewrûpayê û kurdan de têkiliyê deyne.

–Ji bo çareserîkirina pirsgirêka kurd, divê „planeka acil a çalakiyê“ were amadekirin û derbasî pratîkê bibe.

–Divê di navbera kurd û tirkan de pêvajoya agirbesta dualî were destpêkirin û di vê de Yekîtiya Ewrûpayê li gorî prensîba béalbûnê, rola navbeynkariyê bilîze.

– Ji bo agirbesteke dualî divê operasyonên artêşa Tirk werin rawestandî û li herêmê leşkerên fuzûlî tunebin.

–Li hemû sazî û dezgehên divê Qanûnên Rewşa Awerte OHALê werin rakirin û sistema cerdevaniyê were rakirin.

–Di serî de Serokê gelê kurd Abdullah Ocalan, divê afûyêke giştî ku hemû girtiyên siyasî bide ber xwe, were îlankirin.

–Ji bo gundên hatine valakirin û şewitandin werin avakirin û zîyanên kesên bi darê zorê koçber bûne, tazmînat were dayîn û ji bo vegera gundan derfet werin pêşxistin.

–Ji bo di qanûnan de nasnameya kurd were naskirin û çand û zîmanê kurd pêş bikeve, pêwîst e derfet were dayîn û gelê kurd jî bibe xwedî hemû mafên ku gelê tirk xwedî ye.

–Ji bo pêşxistina çand, zîman, dîrok û muzîka kurdî divê navend werin sazîkirin.

–Hemû navên cografî û navendên wargehan ku di encama polîtîkaya asimilasyonê de hatine guhertin, divê ji nû ve bibin kurdî.

–Ji bo herêmên Kurdan werin pêşdebirin, planeke aborî û civakî derbasî pratîkê bibe.

– Divê qedexa û astengiyên li ser rêxistinên kurd bi giştî werin rakirin û ji bo bi awayekî serbest siyasîyê bikin, derfet werin dayîn.

–Divê li gorî biryarên Parlamena Ewrûpa û Komîsyona Ewrûpayê yên derbarê pirsgirêka kurd de gav bînin avêtin.

– Ji bo bi awayekî rast pirçandîtiyê pêşbikeve, divê reform di pratîkê de bi cîh werin.

–Ji bo netewe û hindikahiyên din bi awayekî hêsan mafên xwe bi kar bînin, divê derfet bînin dayîn.

(Ji malpera KONGRA-GEL hatiye wergirtin)



# Tarîxa têkilîyên Yekîtiya Ewrûpayê û Tirkîyê

## (Kronolojî)

### 1959

31 Tirmeh 1959: Tirkîyê muracaata endametiya Civata Aborî ya Ewrûpa (CAE) kir.

### 1963

12 Îlon 1963: Îmzabûna Peymana Ankara li ser hevparî di navbare CAE û Tirkîyê û Protokol a Malî Yekemin.

### 1964

**1. Bercile 1964: Peymana Ankara destpêkir. Konseya hevparî civina yekemin cêkir.**

### 1966

16.-17. Gulan 1966: Komisyona Pevgihani (tirkî: karma) ya Parlamento ya Tirkîyê û CAE civina xwe yekemin cêkir.

### 1970

23. Ciriya Pasin 1970: Îmzabûna „Protokola îlawe“ û Protokola Malî ya duwemin.

### 1971

5. Tirmeh 1971: Parlamena Tirkîyê (TBMM) „Protokola Îlawe“ qebûl kir.

1. Îlon 1971: Bi „Paymanek Miqewet“ (tirkî: Gecici Anlasma) hukmên ticarî yên Protokola Malî merî bûn.

### 1977

12. Gulan 1977: Îmzabûna Protokola Malî ya sêhemîn.

1. Tirmeh 1977: Evantajên CAE ji bo Tirkîyê ji aliyê cotari destpêkirin.

### 1980

30. Tirmeh 1980: Civata Ewrûpa ji bo rabûna vergîyên gumrik heta sala 1987 biryar kir.

### 1982

22. Cileya Navin 1982: Civata Ewrûpa biryar li ser sekinandina têkilîyên xwe bi Tirkîyê ra derxist.

### 1986

16. Îlon 1986: Konseya Hevparî ya CAE û Tirkîyê ses sal sûnda civinek cêkir.

### 1987

14. Nîsan 1987: Tirkîyê muracata Civata Ewrûpa ji bona endameti kir.

27. Nîsan 1987: Konseya Wezirên Civata Ewrûpa muracata Tirkîya da Komîsyon a Civata Ewrûpa.

### 1989

18. Bercile 1989: Komîsyon biryara xwe we-san kir ku, Tirkîyê da sertên polîtîk û biabor ji bo endameti tûnen.

### 1990

6. Heziran 1990: Komîsyona Civata Ewrûpa “Raporêk Hevkari” ji bo Tirkîyê nivîsî û da Konsey a Civatê.

### 1991

30. Îlon 1991 Konseya Hevparî ya Yekitiya Ewrûpa (YE) û Tirkîyê ji sala 1986 vir da disa civinêk nû cêkir.

### 1992

21. Ciliya Navin 1992: Di navbera YE û Tirkîyê da “Programa Hevkari ya Teknik” hat amade kirin.

3. Bercile 1992: Komîteya Hevkari ya Gumrik deh sal sûnda civinek cêkir.

## 1995

6. Adarê 1995: Biryar li ser Yekitiya Gumrik di navbera YE û Tirkîyê da.

13. Bercile 1995: Parlamenta Ewrûpa biryara Konseya YE li ser Yekitiya Gumrik qebûl kir.

21. Bercile 1995: Peyman a Ticareta Serbestî di navbera YE û Tirkîyê da hat parafe kirin.

## 1996

1. Ciliya Navin 1996: Yekitiya Gumrik destpêkir.

25. Tirmeh 1996: YE û Tirkîye Paymena Civata Komir û Celik ya Ewrûpa (CKCE) îmze kirin.

1. Tebax 1996: Peymana CKCE despêkir.

## 1997

12.-13. Bercile 1997: Yekitiya Ewrûpa endamên nû tespît kir û Tirkîyê li derva cihist.

## 1998

3. Adar 1998: Komîsyona YE raporek bi sername "Stratejiya Ewrûpayî ji bo Tirkîyê" amade kir û wesand.

4. Ciriya Pasin 1998: Ji bo Tirkîyê "Rapora Pêsvécûnê" hat wesandin.

## 1999

13. Ciriya Pêsin 1999: Komîsyona YE "Rapora Pêsvécûn" ya duwemin ji bo Tirkîyê amade kir.

11.-12. Bercile 1999: Konseya Ewrûpa civina xwe ya diwanî li Helsînkî çêkir û biryara xwe li ser statûya Tirkîyê ya berendametî eskere kir.

## 2000

11. Nisan 2000: Konseya Hevparî ya YE û Tirkîyê cara 39 civina xwe çêkir.

13. Ciriya Pêsin 2000: Komîsyona YE "Rapora Pêsvécûn" ya sihemîn wesand.

8. Ciriya Pasin 2000: Komîsyon dokûmenta "Hevpari ya Tevbûn" amade kir.

## 2001

26. Sibet 2001: Raporek li ser alikariyên YE ji aliyê malî û teknîk hat qebûl kirin.

8. Adar 2001. Konseya Wezirên YE dokûmenta "Hevpari ya Tevbûn" qebûl kir.

19. Adar 2001: Parlamenta Tirkîyê (TBMM) "Programa Netewî ya Tirkîyê ji bo Qebûlkirina Muktesebata (Hiqûqa) Yekiti" qebûl kir.

13. Ciriya Pasin 2001: "Rapora Pêsvécûn" ya caremin hat wesand.

## 2002

16. Nisan 2002: Konseya Hevparî civîna xwe ya 41an çêkir.

5. Ciriya Pêsin 2002: "Rapora Pêsvécûn" ya pencemin derket.

12. Bercile. 2002: YE, Civina xwe Diwan li Kopenhagen çêkir û biryar kir ku, 10 dewlet 2004 dikarin bibin endamê Yekiti. Bulgarîstan û Romanya gerek 2007 bibin endam. Ji bona Tirkîyê, biryara li ser danûstandinên endametî gerek di meha bercilê 2004 tespît bibe.

## 2003

1 Sibet 2003: Peymana ku li Civina Diwan li Nice hati bû qebûl kirin destpêkir.

20.-21 Heziran 2003: Li Selanîkê serokwezîr û serkomarên YE li ser Qanuna Bîngehî ya Ewrûpa civîn çêkirin.

5. Ciliya Pasin 2003: "Rapora Pêsvécûn" ya sesemin hat der.

## 2004

6. Ciriya Pêsin: Komîsyona YE "Rapora Pêsvécûnê a 2004" wesand. Komîsyon di raporek din da despêkirina danûstaninên endametiyê Tirkîyê pêsniyar kir. Ev rapor bi sername "Danezana Komîsyon jib o Konsey û Parlemana Ewrûpa – Tewsiya ya Komîsyon Ewrûpa li ser pêsvécûnên Tirkîyê di riya endametiyêda" derket.

29. Ciriya Pêsin: Qanûna Bîngehî Ya Ewrûpa hat qabûl kirin. Tirkîyê jî îmze avet.

# Rapora Komisyona YE û pozîsyona kurdan

Komisyona Yekitiya Ewrûpa (YE) di 6.10.2004an da “Rapora Pêşveçûnê a 2004” ji bo Tirkîyê weşand. Ev rapor, ji bo civinên Konsey û Parlemana YE di meha danzdan da (meha bercile) gerek giring e. Komisyonê di rapora xwe da destpêkirina danûstaninên (muzakereyên) endametiya Tirkîyeyê pêşniyar (tevsiye) kir.

Li ser raporê nîqaşek di nav dewletên Ewrûpayê, kurdan û raya gelemperi ya Tirkîyê da destpêkir. Li vir gerek ew çend aspektên nîqaşê bi kurti bèn nivîsîn.

## Nîqaş di nav dewletên YE de

Ew nîqaş di nav welatên Ewrûpayê da bi pirrani li ser “problema Tirkîyeyê” ye. Em

dikarin bêjin, ku li ser pirsra endametiya Tirkîyeyê, du grûbên zid (hember) hene û pozisyonên wan ji hev gelek dûr in. Gelek xwedîwelatên YE naxwazin, Tirkîye bibê endama wê yekitiya nawnetewî. Li gora dîtina wan kesan, Tirkîye ne dewleteke Ewrûpayê ye û şertên wê yên ji bo endametiye tûnene.

Ji aliyê din, siyasetvan û “dostên” Tirkîyê hene, ku ew jî, ji bo endametiye ne. Li gora vê grûbê, sedemên ji bo heynandina Tirkîyê gerek siyasî, jê-stratejik, gerek jî ji aliyê abori pirr in. Bi kurtî, menfaetên YE û Tirkîyeyê endametiye ji bo herdu aliyan mecbur dike. Endamên Komisyonê jî vê dîtine diparêzin. Bandûra endametiya Tirkîyê li ser YE yê di tabloyekê da wisa tê nivîsandin:

**Tablo 1: Bandûrên berfirehkirinên berê û niha li ser YE’yê**

	Mezinbûna heremê INCREASE IN SURFACE AREA)	Mezinbûna Nifûsê INC RASE IN	Mezinbûna Hasileta Hundur Welat (INCREASE IN TOTAL – GDP) (Euro)	Guhertinên Besîna Derametî Serê kesan (CHANGE IN PER CAPITA GDP)(2003)	Wasatiya Besîna Derametî Serê kesan (AVERAGE PER CAPITA) (EU15=100, 2003)
EU15/EU25	23%	20%	4,7%	-8,8%	91,2
EU25/EU27	9%	6%	0,7%	-4,3%	87,4
EU27/EU27 +TR	18%	15%	2,2%	-9,1%	79,4

Jêderk: Eurostat, NSI, Hesabên GD REGIO (Derket di: Rapora bi sername ”*Dokumenta Karên Grûbên Komisyonê*“, R. 38)

Ditîn û argûmanên du grûban de di rojên pêş da gerek bèn gotin û nivîsandin. Ji aliyê din, tiştêk eşkere ye ku li ser endametiya Tirkîyê ya YE karên siyasî û diplomatik bê westan û her roj berdewam dikin. Dewleta tirk hemû imkanên xwe “seferber” kirine, ku pisporên dewletan, wek Fransa, Avusturya hwd. di civina meha yanzdan da qerereke dijî endametiye dernexin.

Bi rastî, Tirkîye nêzikî çel salan endametiya tam guhdar kir. Di vê tarîxê da tu caran ewqas nîqaş di nav dewletên Ewrûpada li ser li gel û li dijî (pro and contra) endametiye nû û endametiya Tirkîyê çênebûn. Lê dawîya rapora pêşdeçûna 2004ê reaksiyonên mezin derketin. Reaksiyonên li gel û li dijî endametiya Tirkîyê eşkere kir, ku pirsê heynandina Tirkîyê a nav YE dibe problemek dûr û direj.

### Nîqaş di rojeva Tirkîyê da

Dawîya raporê, di navbera raya gelemperî ya Tirkîyê da du pirs û babet ketin rojevê. Yek li ser pirsê kêmtewîyên etnîk û olî (Elewi, xiristiyan hwd.) bû. Ya din jî li ser statuya kurdan bû. Bi rastî, di tarîxa tekiliyên YE û Tirkîyê da, pirsê kurd tu car ewqas neket rojeva her du aliyan jî. Komîsyonê, bê îtiraz eşkere kir, ku kurd gerek xwedî maf û azadîyên xwe bin. Lê siyasatvan û rojnamevanên Tirkîyeyê li bendî van xwestinan di rapora Komîsyonê da nedikirin. Ji bona vê, li aliyê kirinê rexne li raporê kirin, li aliyê din jî nîqaşek li ser statuya kurdan li Tirkîyê ajotin.

Li gora piraniya siyasatvan û nivîskarên tirk, kurd ne netew in û ne jî kêmtew in. Ew kes dixwazin, ku statuya kurdan ya îro neyê guherandin. Çima ku Komîsyon hem navê kurdan û mafên wan di rapora xwe da nivîsandîye û hem jî li pir derên raporê, jî Tirkîyê qebûlkirina maf û azadîyên kêmtewîyan dixwaze. Ji bona vê yekê, hêzên li dijî mafên kurdan ditînên Komîsyonê

qebûl nakin. Ew dibêjin ku kurd wek tirkan xwedîmaf û wekhev in. Di vê nîqaşê da gotinêk “nû” hat icat kirin: “*unsurê esilî*”.

Bêguman, bikaranîna “*unsurê esilî*” demagojî ye û qet mana wê tune. Kurd 80ê salan di nav Tirkîyê da ne tenê hemwelatîyên sinifa diduyan bûn, ew neteweyek bêmaf û bindest in. Ziman, çandî û tarîxa kurdan jî aliyê dewletê bi qanûnan û zilm-zordariya dewletê hat înkâr kirin. Nasnameya netewî ya kurdan hat înkâr kirin. Niha jî, ji bona YE behsa kurdan dike, Tirkîye xwedî li wan derdikeve û dibêje; “*kurdan wek tirkan Komara Dewleta Tirkîyê damîzrandin û ew jî elementê esilî ne*”. Ev dek û dolavek (hîle) vekirî ye û hindî pere nake.

Rapora Komîsyonê jî bû sedema nîqaşêke mezin û berfireh a li ser statuya kurdan. Pir nivîskar û ilmdarên tirk wek Mehmet Ali Birand, Mehmet Altan, Enis Berberoğlu hwd. dikarin niha li ser mafên gelê kurd, bê tirs ditînên xwe bêjin û binivîsin.

Pisporên Tirkîyê niha wek cambazan karekê siyasî û diplomatik dikin, ku YE jî bo destoe kirina danûstandinên endamatiyê tarîxekê bide. Çi heye ku ew tiştêkî nahesebînin yan jî dixwazin manîpule bikin: Komîsyona Ewrûpayê di rapora xwe da eşkere kiriye ku Tirkîye di prosa (pêvajoyê) danûstandinê (muzakereyan) da xwe gerek *bi tûnî reformize û demokratize* bike. Di nav gavên reforman da pirsê kurdî serê navorekê digre.

### Despêka nîqaşêke nû di nav kurdan da

Kurdan rapora Komîsyonê bi heyecanek mezin guhdar kirin. Temamiyên kurdan jî aliyê pirsê kurd hevîdar bûn, ku YE mafên gelê kurd eşkere bike û jî dewleta Tirkîyê bixwaze. Lê tiştên di raporê da li ser rewşa kurdan hat nivîsandin ji bona pir kurdan ne bes bû.

Hinek kurd, piştî weşandina raporê rexne û êriş li ser YE kirin. Li gora ditîna wan, li ser kurdan di navbera YE û Tirkîyê da "Lozanek nû" tê çêkirin. Kesên van ditînan dibejin û dinivîsin hindik in û berê jî li dijî YE û endametiya Tirkîyê û Kurdistanê bûn.

Partî, rêxistin û nivîskarên kurd bi pirranî kemasiyên raporê dan ziman û xuyan, lê perspektifên nû jî ji çareserkirina pirsra kurdan re dibînin. Di nav wan grûbên kurdan da jî du tendens hene. Hinek partî, rexistin û kes (PSK, PDK-Bakûr, HAK-PAR hwd.), heta dema pirsra kurd çareser nebû, despêkirina danûstaniyan red dikin. Yê din (Kongra-Gel, DEHAP hwd.), dibêjin gerek prosesa endametiye berdewam bike û mafên kurdan jî bide berçav.

Niqaşa li ser "kêmetewê"tî di nav raya gelemperî ya kurdan de jî berdewam dike. Temamiya kurdan ev statuya "kemetewî"yî red dikin. Bê şik, kurd netewek e û ji wan ra mafên netewî yên di dinê da û ji bo hemû netewên din tên qebûl kirin hewce ne. Ji bona vê jî, xwestinên YE li ser maf û azadiyên mirovatî jî bo kurdan ne bes in. Hemû kurd vê ditîne diparizin, ku îro dewleta Tirkîyê naxwaze pirsra kurd çareser bike û bi gotina "unsurê esilî" demagojî dike.

## Naveroka rapora a li ser kurdan

Komisyona YE karê xwe yê li ser "rapora Tirkîyê" 6ê çiriya pêşin a 2004an de xilas û eşkere kir. Serokê Komisyone Günter Verheugen berî weşandina raporê çûbû Tirkîyê û Kurdistanê. Wî bi çavên xwe rewşa siyasî, aborî û civakî dît û bi endamên Komisyone yê din ra qerera xwe da.

Komisyona YE biryara xwe li gora sê gavên (sitûnen) stratejîk dide berçav:

– Sitûna yekemîn: Reformên li Tirkîyê di rêya cihgirtina şertên Kopenhagên de bête berdewam û destek kirin.

– Sitûna duwemîn: Şertên ji bona despêkirina danûstandinên endametiye piştî biryara Konseya YE bête tespit û îcra kirin.

– Sitûna siyemîn: Dîyaloga siyasî û çandî di navbera mirovên Tirkîyê û dewletên YE de kûr bibe.

Karê Komisyone di sê dokumentan da hat nivîsîn û bi van sernameyan hat weşandin:

– Dokûmenta yekemîn: "Danezana Komisyone ji bo Konsey û Parlemena Ewrûpayê – Tewsiya Komisyona Ewrûpayê li ser pêşveçûnên Tirkîyê di rîya endametiye da". Di vê raporê da biryara tewsiyeya Komisyone heye û di 16 rûpelan da argumanên wê hatîne nivîsandin.

– Dokûmenta duwemîn: "Dokûmenta karên grûbên Komisyone – Pirsên bi endametiya Tirkîyê Yekitiya Ewruyê ve girêdayî". Ev xeber (nûçe) bingehe qerara Komisyone bû û di bin heft sernavan da 53 rûpel (bi zimanê îngilîzî) derket. Li dawiya dokumentê îlaweyeke îstatîstîkan jî cih girtiye. Heft servên vê dokumentê ev bûn:

1. Dîmena jeopolîtîk
2. Dîmena aborî
3. Bazara hundur û aliyên polîtîk yê ku pê va giredayî ne.
4. Cotkari, tendurustîya (xwesi) ya heywan û nebatan, masivani.
5. Polîtîkaya herêman û strukturê
6. Hiqûq û karê hundur
7. Aspektên dezgehan û pirsên budceyê.

– Dokûmenta siyemîn: "Rapora pêşveçûna 2004an". Her salê Komisyon li ser reform û rewşa Tirkîyê lêkolînan dike û diweşîne. Rapora 2004an bi îngilîzî 187 rûpel girtiye û analizên li ser rewsa îdarî, aborî, siyasî û çandî hatine weşandin. Di Rapore da li pir deran rewşa kurdan tê nivîsandin. Ev gotin li ser kurdan di rapora direj da cih girtine: kurd (îngilîzî: Kurds, 3 car), Kurdî (îngilîzî: kurdish, 42 car), başûra rojhelat (îngilîzî: south-eastern/south-east, 7 car) û anatoliya rojhelat (îngilîzî: eastern anatolia, 2 car).



Komîsyon ji aliyekî ji ber tirsaya yan jî zora Tirkîyê gotinên wek “Kurdistan”, “gelê/netewê Kurd”, “mafên netewî yên kurdan” nekiriye rapora xwe. Statûya kurdan gora ditîna Komîsyonê ne eşkere ye. Bi zora hikûmeta AKP, Komîsyon gotinên xwe wek “gelê Kurd” û “civata Kurd” hwd. yan nenivîsiye yan jî ji rapora xwe derxistiye. Di du deran da Komîsyonê behsa “kêmetewên li Tirkîyê û welatên din li vê herême” (binêr: Rûpel 10/“Dokumenta Karên Grûbên Komîsyonê” ) û “rewşa kêmeteweyê kurd û yên din” (binêr: Rûpel 22/“Dokumenta Karên Grûbên Komîsyonê”) dike.. Gerek Komîsyon gerek organên din wek Konsey hîn ji bona binavkirina pirsaya kurd ne amade ne. Bona vê ne rast e, ku bêjin YE statûya “kêmetewî” ji bo kurdan “layiq” dibîne. Pirsaya statûya kurdan di hunduri YE da vekirî ye.

Kêmasîya raporê ew e, ku YE nabîne yan jî naxwaze eşkere bike ku pirsaya kurd pîrsek siyasî ye û bi prensiba qedera xwe tayin kirinê va giredayî ye. Lê, ev nayê wê manayê, ku kurd dewletek nû çêkin û ji Tirkîyê û YE biqetin. Divê ji aliyê YE bê zanîn, ku mafên ziman û çandî ji bo çareserkirina pirsaya kurdan bes nînin.

Komîsyonê di biryara tewsiye (binêr: dokumenta yekemîn) xwe da sê caran li ser maf û azadiyên kurdan sekinîye (binêr: rûpel 4,7,14). Pirsên ziman û çanda kurd tîne eşkere kirin (binêr: rûpel 13, 14, 17).

Komîsyonê di rapora xwe ya tewsiye “*Danezana Komîsyonê ji bo Konsey û Parlemena Ewropayê*” da behsa “kurdan” (îngilîzî: Kurds) dike, ne behsa “kêmeteweyê Kurd” (îngilîzî: Kurdish minority). Li gora ditînen Komîsyonê di rûpala 4an da wiha dinivîse: “...*Mafên çandî yên kurdan hêdi hêdi tîne qebûl kirin. ...*”

Di rûpela 7an da ji aliyên berdeewamkirina reforman da Komîsyon tewsiya xwe dike: “Hewceyê firehkirin û cihgirtina reformên politîk ji bo normalbûna rewşa başûrê rohilatê welat (îngilîzî: southeastern of country) ... *garantîya maf û azadiyên bêsinor (bêtixub) ji bo kurdan ... jî derbas dibê.*”

Komîsyon ji bona rewşek normal li Kurdistanê “*qebûlkirina maf û azadiyên kurdan bêsinor*” (rûpel 14) şert dibîne. Ev xwastinek eşkere ye û gerek ji aliyê Tirkîyê da rast bê famkirin.

Di dokumenta li ser xebat û lêkolîna grûben Komîsyonê da du car ev gotin “*kêmeteweya Kurd*” û “*kêmeteweyên Kurd*” cih girtiye.

Komîsyona YE gavên Tirkîyê di rêya demokrasîyê da di rapora xwe da dipesînîne û berdeewamkirina wan reforman dixwaze. Di çend derên raporê da li ser pirsaya zimanê kurdî jî tespitên Komîsyonê hene. Komîsyon eşkere dike ku ji aliyê mafên çandî Tirkîyê hîn nû gavan davêje û tiştên serbestbûn (dersên zimanê kurdî, programên radio û televizyon hwd.) ne bes in (binêr: rûpel 14).

Di naveroka raporê da hemû pirs û perspektîfên endametiye ji aliyên siyaseta, aborî, idarî, çand û hwd. cih girtine. Rexneyên û daxwazên Komîsyonê gelek in. Lê ditîne û biryara Komîsyonê ew e, ku ji bo despêkirina danûstendinên endametiye êdî asteng nemane.

Komîsyon di lêkolînen xwe da (binêre: rapora duwemin) ferqa rewşa aborî ya Kurdistanê û Tirkîyê jî eşkere dike. Lê li ser sedemên wan ferqan ji aliyê siyaseta û tarîxa qet tişt nehatiye nivîsandin. Dîsa jî, ji bo kurdan û pisporên Tirkîyê maneya wê, ku ev babet di raporê da girtiye, gelek mezin e. Li gora lêkolînen komîsyonê ew ferq di tabelaya jêrî da tê berçav.

**Tablo 2: Beramberkirina Rojhelat û Rojavayê Tirkîyê**

	Nîspeta nifûsê (share of population)	Nîspeta hasileta hundur welêt (share of GDP)	Besîna derametî serê kesan (GDP/head ; TR = 100)
Rojhelat	37%	22%	60
Roava	63%	78%	123

Jêderk: Rapora Komîsyonê bi sername „Dokumenta Karên Grûbên Komîsyonê“, R. 40.

### Berpirsiyar û perspektîfên kurdan

Rapora 2004an a Komîsyona YE ji bona hatina kurdên hundurî Tirkîyê dokumentek gelek giring e û tê pir maneyan. Ne hewce ye, ku bê gotin, ji Peymana Lozanê vir da carek din dewletên Ewrûpayî bi Tirkîyê ra li ser pirsê kurd salên pêş muzakere bikin. Rapora Komîsyonê di prosesa danûstandinan da wazîfeyêke rênîşander dibîne. Kesên raporê naxwinîn û fam nakin, nikarin prosesa endametî teqîb bikin.

Jê pê ve merhaleyên çareserbûna pirsê kurd li Tirkîyê bi prosesa danûstandinan ve giredayî ye. Lewra, gerek sîyasetwan û pisporên kurd di kar û sîyasetê xwe da dest bi guhertinên bingehî bikin, li reyên nû bigerin. Li vir pîvana (tirkî: kistas) kurdan ew be ku kurd gelek serbixwe ne û mafên netewî ji wan ra hewce ne.

Bi *program û sîyasetên berê*, bi *armancên kewn û nerealîst*, bê zanîna hiqûqa Ewrûpayê û Tirkîyê tevgera kurd nikare mudaxeleya prosesa endametîyê bike. Peymanên Romayê, Maastrichtê, Nizzayê û şertên Kopenhagenê gerek rast bînin zanîn. Ev tespît, ji bo hemû rêxistin, komel û şexisên kurd jî derbas dibe. Divê kurd bi temamî di karên sîyasî û çandî de tekiliyên YE-Tirkîyê baş bizanin û li gora vê gavên xwe bavêjin.

Dema ku Parlamena û Konseya YE despêkirina danûstandinan qebûl kirin, ne tenê Komara Tirkîyê, divê kurd, elewî û kêmteweyên li Tirkîyê jî hin pîr bala xwe bidin prosesa endametîyê. Ji bo kurdan *perspektîf û şansên nû* derdikevin. Ji aliyê din *rîzîkoyên mezîn* jî ji bo kurdan hene. Lê, kurd dîsa bi xebat û imkanên xwe dikarin rîzîkoyan kêmtir bikin.

Bêguman, her biryar û reformên ji bona *azadbûna ziman û çandîya kurdî* dibe gawek giring e ji aliyê çareserkirina pirsê kurd ve. Lewra, partî û rexistinên kurd divê gavên ûlo jî silavkin û kêfa xwe ji YE ra baş nîşan bikin. Kesên gavên piçûk qebûl nakin û xwedî lê dernekevin xeyalperest in yan jî sîyasetê qet fam nakin.

Belê, *dawiya prosesa danûstandinên endametîyê vekirîye* û tu garantiyên serkeftinê jî tûnen. Pasdaciya prosesa endametî tistekî ne baş e û zerara xwe bi kurdan û tirkan heye. Komara Tirkîyê ketîye rêya Ewrûpa û bi xwe ra kurdan jî dike *hevparê veşartî* (tirkî: sakli ortak) yê YE. Çima ku 20 milyon kurd di hundurê dewleta Tirkîyê de dijîn û di bin tesîra endametîyê da ne. YE dizane, ku bê çareserkirina pirsê kurd îstîkrara sîyasî û aborî ya Tirkîyê ne mimkun e. Ji bona vê berfirehkirina YE hatîyê nokteyek krîtîk.

**Tablo 3: Pêvajoya Berfirehkirina Yekitiya Ewropayê**

Pêvajoya Firehkirinê	Dewlet	Nifûs (1000)	Aqar (km <sup>2</sup> )
Endamên damezrêner 1956	Elmanya	83.029	356 854
	Belcîka	10.258	30 158
	Fransa	59.551	550 000
	Hollanda	15.981	41 864
	Îtalya	57.679	301 263
	Lüksemburg	442	2 586
1. Berfirehkirin 1973	Qiraletiya Yekbûyî	59.647	242 500
	Danimarka	5.352	43 094
	Îrlanda	3.840	70.000
2. Berfirehkirin 1981	Yewnanistan	10.623	131 957
3. Berfirehkirin 1986	Îspanya	40.037	504 782
	Portekîz	10.066	92 072
4. Berfirehkirin 1993	Awistiriye	8.150	83 858
	Fînlandiye	5.175	338 000
	Swêd	8.875	450 000
5. Berfirehkirin 2004	Komara Çek	10.264	79 000
	Estonya	1.423	45 000
	Slovenya	1.930	20 000
	Letonya	2.385	65 000
	Lîtvanya	3.610	65 000
	Kıbrıs	862	9 000
	Malta	394	316
	Macaristan	10.106	93 000
	Polonya	38.633	313 000
6. Berfirehkirin 2007	Komara Slovak	5.414	49 000
	Bulgaristan	7.707	111 000
	Romanya	22.364	238.000
7. Berfirehkirin	Tirkîyê/Kurdistan Bakur	66.800	775.000

Jêderk: <http://europa.eu.int/>

Kurd dikarin bi xebat û konseptên nû xwe wek terefê sisêyan bidin qebûlkirin. Heger kurdan xwe nedan qebûlkirin, wê demê mimkûne ku YE ji bona pirsê kurd pir hindik daxwazan bîne ziman û yan ji di bin tesira Tirkîyê da bimîne. Divê kurd ne tenê bang û protesto bikin yan ji daxwazên pir gelemperî bêjin. Hewce ye, ku kurd *konseptên ji aliyê hiqûq, idarî, çandî û aborî* derxin û bidin pisporên YE.

Jibonamudaxeleyprosesadanûstandinan yekbûna tevgera kurd di vê babetê da şert e. Divê kurd xwedî otoritek netewî bin û bi dengêkî daxwazên xwe tespît û eşkere bikin. Mixabin tevgera kurd îro ji pir ji hev dûr ketiye. Lê di salên pêş me da *programeke newetî ya kurdan bo YE* hewce ye. Ji aliyê din, hewce ye, ku hemû partî, rêxistin û şexsiyetên kurd *alîkariya belediyên Kurdistanê* bikin.

*Îdareyên herêman* (tirkî: yerel yönetimler) di polîtîkaya YE da cihek mezin digrin û bo kurdan û Kurdistanê rolek navendî dilîzin.

Kurd karên xwe yên li ser têkiliyên YE-Tirkîyê di du babetan da gerek kûr bikin. Babetek qebûlkirina nasnameya kurdî ye. Kurd, YE û demokratên Tirk, gerek zorê bidin hikûmeta Tirkîyê, ku nasnameya netewî ya kurdan resmî li Tirkîyê bê qebûlkin. Babeta duwemin ew e, statuya kurdan ji aliyê YE da bibe tespît. Çima ku Komîsyon di rapora xwe da şîrove yan ji nas nekiriye, ma kurd netew in yan jî “kêmetew” in? Di çend deran da navê “kurdan” derbas dibe, di çend deran da jî behsa “kêmetew”-tiyê tê kirin. Ev gotinên jî bo tespîtkirina statuya kurdan ne bes e.

Bona vê jî lazim e kurd stratejiyêk ji bo naskirina kurdan wek netewe û gel bibînin. Nimûneyek, Hikûmeta Kurdistanê Başûr dikare tekiliyên xwe bi YE ra bi pêş de bibe û li ser pirsê nasname û statuya kurdan bisekine. Wexta ku YE kurdên Başûr wek netewe yan jî “gel” qabûl kir, divê ev tesbît jî kurdên Bakur û Tirkîyê ra jî derbas bibe.

Kurd mecbûr in, ku ne tenê li ser pirsê kurd, li ser tevayîya Tirkîyê siyaset û perspektîfan çekin. Nivê kurdan li Tirkîyê dijî. Kurdên Anatoliya Navîn ji sedsalan vir da di hundurê Tirkîyê da kêmetewe ne. Heger kurd endametiya YE dixwazin, gerek li gora vê jî program û konseptên xwe hebin. Lewra, hemû partî û rexistinên kurd *program û armancên xwe biguharin* û di rêya YE da “entegre” bikin. Çawa Tirkîyê xwe demokratîze û reformîze dike, kurd jî li gora xwe gavên nû ji aliyê ditinên Ewrûpayê, demokrasi û plûralîzm (pirdengi) bavêjin.

Tevgera kurd, di têkiliyên YE-Tirkîyê da daxwazên xwe dikarin tenê li gora hiqûqa Ewrûpa bidin qebûlkin. Tiştên di hiqûqa Ewrûpa da tûnene nikarin çêbin. Misal,

pirsên netewî ne babetek naveroka dewletên YE ye. Bi gotinên din, YE nikare pirsê kurd li Tirkîyê çareser bike û yan jî mudaxele bike. Lê, organ û rexistinên YE alikariyê dikin, wexta ku terefan xwest dest ji konfliktan (pevçûn) berdin. Ji bona vê, kurd gerek bizanin, ku çareserbûna pirsê kurd li Ankara û Amedê mimkûn e.

Li Ewrûpayê nêzikî 1,5 milyon kurd dijîn û roj bi roj dibin hemwelatîyên YE. Komîsyon jî di rapora duwemin da bala kurdên diasporayê li YE dikşîne binê: R. 10/ *Dokûmenta karên grûbên Komîsyonê*. Tesira ewan kurdan ji aliyê Komîsyonê jî hatiye fam kirin. Mafên wan kurdan jî hewce ye di nav hemû dewletên Ewrûpa ku kurd tê de dijîn, bê naskirin û qebûlkin. Rola kurdên Ewrûpayê pir mezin e, lê rexistinên îro jî bo organize û pêşvacûna ewan ne bes in. Divê imkanên dewletan yên jî bo hemû mirovan û mihacir bas bizanin û îstîfade bikin. Ji alî karên diplomasi, polîtîk, civatî û çandî kurdên Ewrûpayê potansiyeleka mezin û giring in. Di pêvajoya danûstandinan da kurdên Ewrûpayê gerek rola xwe baş fêhm bikin û bilîzin.

Van rojan 25 dewletên YE û sê dewletên berendam *qanûna bingehî destûra Ewrûpayê* qebûl kirin. Tirkîyeyê jî wek dewleteke berendam îmze avet bin wê dokûmenta YE. Ji bo Tirkîyê ev gawek gelek nû û mezin e. Li aliyê din, li Tirkîyê mafên mirovatî hîn tînen kêmet kirin, êrîş û îşkence li ser kurdan berdewam dikin. Rewşa Tirkîyê jî bo endametiya YE ne bes e. Dîsa jî, YE dixwaze şanseke din bide Tirkîyê.

Di deh salan da pir tişt bînen guherandin, ne tenê jî bo Tirkîyê jî bona kurdan jî. Roj bê, YE ê daxwazên kurdan jî pirsê bike. Axaftina Leyla Zana di Parlamena Ewrûpayê da gava siftehê bû. Kî hazirî û karê xwe baş bike, serkeftîna wî nikarê bê sekinandin.

# Di peymanana Lozanê de mafê kêmneteweyan

Bend 38: Hukimeta Tirk, kesên ku ji neteweyeke din in û li Tirkîyê dijîn (nasyonallite), ferq naxe nav ziman, nijad an jî cudabûna wan a olî û ji parastina jiyana û azadiya wan berpirs e. Her kesî ku li Tirkîyê dijî, ji aliyê ol, mezhep û baweriyê ve çî vekirî û çî taybetî bi awayekî serbestî û vekirî mafê wî / wê hene.

Bend 39: Hemwelatîyên Tirkîyê yê ku ne musulman in, ew jî wek heman hemwelatîyên musulman xwedî mafên hemwelatî(huqûqa medenî) ne û ji mafê polîtîk payedar in. Her kesî ku li Tirkîyê dijî, bêcudatiya olî li hember qanûnî wekhev in. Cudatiyên olî, bawerî an jî mezhebî ne li peş mafê hemwelatîyê asteng (mafên medenî) e, divê kelk ji mafê polîtîk were girtin û bi taybetî pêwîst de ku di kar û barê dewletê de, payedayîn an jî di karen curbe cur û pişeyî de, di dibistanên de an jî di beşên industriyê de li pêşî xebata wan asteng tune bin.

Bend 40: Hemwelatîyên Tirkîyê yê ku kêmneteweyên ne musulman in, hem ji aliyê huqûqî û him jî ji aliyê pratîkî ve, maf, kirarî û garantiya ku ji bo hemwelatîyên tirk hene û tên kirin, divê ji bo wan jî ev maf, garanti hebin û sûd û kelk bîn wergirtin. Kêmneteweyên ne musulman dikarin bi hatin û pereyên xwe her cureyên xêretxane û dezgehane vekin, dem û dezgehên olî û civakî, her cureyê dibistan, dem û dezgehên perwerde û hîndekariyê damezrîn, birêve bibin, kontrol bikin, li cihên weha bi awayekî azad zimanê xwe bi kar binin û xwedî maf in ku bi awayekî serbest îbadetên xwe bikin.

Bend 41: Di mijara hînkirin û perwerdeya giştî de, hukimeta tirk pêwîst e ku ji bo hemwelatîyên xwe yê ne musulman li bajar û bajarokan ku lê dijîn ji wan re derfetên ku bi zimanê xwe bixwînin û hîn bibin pêk binin. Ev li dijberî perwerde û hîndekariya ku bi zimanê tirkî li dibistanan tê kirin ne asteng e. Kêmneteweyên

ne musulman yê ku li bajar û bajarokan dijîn, pêwîst e ku ji butçeya dewlet, belediye, dem û dezgehên xêrxwaz an jî butçeyên din, para wan a hînkirin û perwerde were beşkirin û dayîn.

Bend 42: Hukimeta tirk divê rewşa malbatên kêmneteweyên ne musulman, statuya wan, li ber çav bigre, ji bo xurtkirin û geşkirina edet û çanda wan hewl bide û xebat bike. Ji bo vê yekê, divê ji kêmneteweyan û ji hukimeta tirk komîsyoneke taybetî were damezrandin û hejmarê endamên komîsyonê yê herdu aliyên wek hev bin. Heger lihevnekirin hebe, di navbera hukimeta tirk û huqûqvanên Cemiyeta Ewropayî de dê hakimekî were tayîn dikin. Hukimeta tirk ew kêmneteweyên ku navên wan derbas dibin, dêr, havra, goristan û hemû dem û dezgehên wan ên olî divê diparêze.

Bend 43: Kes nikare ji ber dîn an jî baweriyê zorê bide hemwelatîyên tirk yê ne musulman, dema ew di rojên tatil û cejnan de beşdarî mehkeme û daîreyên fermî nebin, mafê wan yê qanûnî wenda nabin. Ev jî nayê wê wateyê ku ji bo asayîşa giştî ew ji hemwelatîyên tirk ên din bêtir xwedî hindêk mafên taybetî ne.

Bend 44: Ev bendên jorîn her çiqas li Tirkîyê ji bo kêmneteweyên musulman bin jî, herweha bar û berpirsiyariyên navnetewî tîne holê û garantiya Cemiyeta Navnetewî qebûl dike. Ev bend û prensîp heta ji aliyê piraniya Cemiyeta Navnetewî ve nehêne guhertin, kes nikare biguhere. Hukimetên Împaratoriya Brîtanya, Fransa, Îtalya û Japonya, Meclîsa Cemiyeta Navnetewî heger bi piraniya denga guhetinê di cih de bibîne, wê demê peymanê qebûl dikin.

Bend 45: Ev bendên ku ji bo mafên kêmneteweyên ne musulman li Tirkîyê hatine danîn û mafên ku ji bo wan hatine pejrandin, herweha ji bo musulmanên li Yunanistanê jî derbas dibin.

**Wergera ji tirkî: Amed Tîgrîs**



# Kurd wek gelê esilwar û mafên wan, YE û Tirkiye<sup>(\*)</sup>

Mijara vê nivîsarê ew qaîdeyên navneteweyî ne ku li dora mefê gelên esilwar (indigenous people) beramber bi dewletên xwe geş bûn. Li vê derê ez dixwazim ji xwe re di çarçeveya Rojhilata Navîn de wek gelekî asilwar kurdan bingeh bigirim.

Li dora 40 milyon kurd li ser cografyayekê dijîn ku jê re Kurdistan tê gotin. Di warê navneteweyî de kurd wek yek ji wan gelên esilwar nayên hejmartin. Ji wan elementên basît ên wekî etnîkiyê û mişterekiyên etnîkî tê hereketkirin û kurd weke kêmasiyeke kulturî tîen tesbît(tarîf)kirin. Gelê kurd îro bêyî statu û mewqîfêki tesbîtîkirî yê diyar e. Mefhûma kêmayetiyeke kulturî ji bo tarîfîkirina vî gelî ne gotineka qaniikîr û têrkîr e. Berî ku meriv tarîfa mafên gelekî bike divê meriv zelal bibîne ka ev gel ji kîjan hebûnê bingehê xwe digre, ev hebûn xwedan çi mafan in, çi statuya wan heye. Di programa YE de a ji bo endametiya Tirkiyeyê gelek pîrs bêbersiv dimînin. Berî ku li ser pîrsa kurdan a li ba YE wek mefhûmeke nezelalkirî ez pêş de herim ez dixwazim çend tiştan li ser kurdan diyar bikim.

Kurdistan wek dergûşa medeniyetan tê hesab kirin. Di dîrokê de Kurdistanê mazûbaniya (mêvandariya) gellek medeniyetan kiriye. Meriv şopên van medeniyetan hem di warê tebieta welêt û hem jî di warê kultura wê de dibîne. Her wiha di dewr û zemanan de hêzên serdest ên cuda ên herwekî tirk, faris û ereb tesîreke mezin li Kurdistanê kirine. Ew, bûn sedemên wan trajediyên ku

gelê kurd di tarîxê de jiya. Lê di eynî demê de ev trajedî bûn çavkaniyên giring ên avakirina mişterekiya etnîkî ya kurdan a dema nuh.

Gelê kurd bi 40 milyon nifûsa xwe, li çar welatan (Îran, Îraq, Sûriye, Tirkiye) perçekirî dijî. Perçebûn û bêpariya ji warekî coxrafi yê tespîtîkirîya huqûqî, wê yekê bi xwe re tîne ku dîaloga li dora pîrsên kulturî yê bi mîrasê kulturî ve girêdayî û bîra kulturî ji ber dewamiyê bêpar bimîne û xwedilêderketina mîrasa kulturî diwartir dibe. Rewşa siyasî ya kurdan ew qas xerab e ku mîrasa kulturî di bin şertên gellek giran de maye. Hemû elementên kultura kurdî; mîtolojî, sembol, hêjayî, havîze û kodên di rabûn rûniştinan, adetan, saziyan, dîn, huner, muzîk, govend û mîmarî, jiyana malbatî û ziman, hemû tiştên ku hevpariyekê didin kurdan û wan weke malbatekê bi hev ve dijdîdîne perçe perçe, hûr bûne. Hemû kurd di xeteriya wendabûna hêjayiyên bingehîn ên kurdewariyê de dijîn. Ev dibe sedemê kesayetiyeke kurdî ya jar û qels.

Berdewambûna jiyana etnîsîteya kurd bi moment, hukumranî û mehdûdkirinên jeopolîtîkî ve girêdayî ye. Ev di têngîhîştina mefhûma etnîsîteya kurdî de girîng e. Hîskîrîna etnîsîteya kurdî her wiha bi welatê bav û kalan Kurdistanê – warek ku kurd li ser esasê mafekî dîrokî, welatê xwe dibinin- ve jî girêdayî ye.

Bi vê minasebetê ez dixwazim mefhûma ku di peymanên navneteweyî de wek gelê esilwar (indigenous people) tê binavkirin

şilovekim. Gava ev mefhûm tê gotin qesd jê ew grûbegel in ku ew di nava dewleteke serbixwe de li ser welatekî an warekî cografî dijîn ku hîn ji berî avabûna wê dewletê de, an ji berî diyarkirina hudûdên wê dewletê de li wan hêrêman bûn. Ji bo ku grûbegelek wek gelê esilwar bê hejmartin divê wî gelî kesa-yetiya xwe ya gelî heta niha parastibe.

Bingehên navneteweyî yên ku xwedî li gelên esilwar ên nava dewletekê derdikevin ji alî dîrokî ve kevntir in ji mesela xwedîlêderketina mafên însanî yên şexsan, vedigerin sedsala 16ê, wan demên ku hêzên ewrûpî li Afrîka, Asya û Amerîkayê xwe belav û berfirêh dikirin. Ji sedsala 15ê û pê ve pirsra gelo li ser erdên klonîkirî çi mafên gelên esilwar ên wan deran beramber bi mafên hêzên ferman-derên kolonyalîst hebûn pêşde hat. Hîn ji sedsala 16an ve bîrûbaweriyek pêş de hat ku gelên cih xwediyên rastîn ên ser erdên xwe ne û wan maf heye ku hebûna xwe ya civakî bi sazîyên xwe ve wek hebûneke hiqûqî berdewam bikin. Ev bîr û bawerî cara pêşin di sala 1532yê de ji bal konferansên Francesco de Vittoria ve hatin eşkerekirin.

Konvensiyona ILOyê (International Labour Organization) bi vî awayî gelê esilwar tarîf dike: *"Gelê ku bi tevayî an qismî kultur, hêjayî û sazîyên xwe yên tradîsyonî parastin û hîn berî ew sazîyên mezin ên dewletê xwe bi cih bikin ew li wan deran dijîyan."* Her wiha divê bê binavkirin ku YN sala 1983yê grûbeke xebatê damezirand (WGIP – Working Group on Indigenous Populations-) ku wê deh salan kar kir da miswedeyê eşkerekirina (dekle-reqirina) unîversel a li ser mafên gelên esil-cih amade bike. Herwiha YN ji bo pirsên gelên esilwar di bin îdareya ECOSOC (Şewirmendiya aborî û civakî) de Forumeke Berdewamî danî. Li ser bingehên van perspektîvan hin xal û pîvan hatin danîn:

1. Gelê esilwar têkiliyêke xwe ya taybetî bi herêmên xwe yên cografî û warên xwe re heye.

2. Gelê esilwar xwedanê xweidarekirina xwe ye ya ku li ser hêjayî û hebûn, maf û hêjayiyên xwe yên mişterek e.

3. Gelê esilwar xwediyê ziman, kultur, bawermendiya dînî û zanyariya xwe ye.

4. Gelê esilwar xwediyê sazîyên xwe yên siyasî, civakî û kulturî ye ku ew ji hiqûqiyet, bîryardarî ya tradîsyonî û ji awayên jiyana civakî ya hevbeş tên.

5. Herêmên jiyane û warên gelên esilwar û her wiha sazîyên kulturî yên wan ji bal serdestîya dewletan û kar û muamelyên wan ve hatine piçûkxistin û jirûmetxistin.

Têkoşîna kurdan ji bo xweidarekirinê, her wiha ji bo jiyaneke aram û bi ewle ya li ser warê xwe, li ser hebûnên xwe yên tebiyetê û çavkaniyên xwe yên avê ye. Herwiha ji bo avakirina dezgehên hîndekariyê yên bi zimanê xwe ye û ji bo wê yekê ye ku rêz li serbixweyîya kulturî û ewlekariya li hember piçûkxistinê bê girtin. Gelê kurd daxwaza kontrola li ser jiyana xwe û hebûnên xwe û peydakirina îmkanan ji bo parastin û pêşdexistina kultura xwe dike. Kurd wekî gelê esilwar dixwazin xwe pêş de bibin û ji zilm, îşkence, komkuji, tengasî û bindestiya aborî, civakî –dînî- û kulturî rizgar bibin.

Li gora qanûnên navneteweyî û konvensiyona ILOyê ya 169ê ji bo ku gelek gelê esilwar bê hejmartin divê ew ji gelekî wiha hatibe ku li wî welatî an li beşeka mezin a wan waran hîn beriya ku ew erd ji bal devleta nuh ve hatibin dagîrkirin an hidûdên wê hatibin tesbîtkirin jiyabe. Şertê duduyan ji ew e ku wî gelî bi vî an wî awayî kesayetiya xwe ya gelî parastibe.

Gelê kurd li gora van prensîb û krîterên van qanûn û peymanên navneteweyî yên ku ji bal NY û konvensiyona ILO yê hatine bir-

yardan dikare wek gelekî esilwar bê hejmartin. Pirsar rewş û statuya kurdan perçeyekî gelek tebîî yê mînaqeseyên navbera Tirkîyê û YE li ser endametiya Tirkîyê ye. Xalên han divê bîn ronîkirin:

- \* Mafên însanî yên bîngêhîn ên kurdan divê her wekî mafên gelên din ên nav wan dewletên ku ew lê dijîn bîn pejirandin, divê ew karibin maf û azadiyên bîngêhîn bêyî astengiyên an neheqîlêkirinan bi kar binin. Ev maf divê bîn garantîkirin.
- \* Ji bo bicîhanîn û bilindkirina mafên kurdan ên civakî, aborî û kulturî, ewlekariya kesên û dezgehên, millîyeta kurdan, kar, kultur û jîngeha wan divê dewlet karûbarekî sistematîk û bi rêk û pêk li dar xê. Her wiha divê kurd karibin awayê jiyana xwe ya kurdewarî û kultura xwe biparêzin û pêş de bixin.
- \* Daxwazên kurdan ên ku dewlet her gava ku dixwaze qanûnên wiha an biryarên îdarî yên wiha bistîne ku dikare rasterast an bi wasîte li ser jiyana kurdan tesîr bike divê bi wan jî bişêwîre û bi wan re mîsterek konsultasyonan bike, lazim e bîn çih. Divê kurd xwedanmafê wê yekê bin ku beşdarî avakirin, meşandin û pêşdestîna plan û programên herêmî û merkezî bibin ku ew dikarin rasterast tesîrê li ser jiyana kurdan bikin (Projeya GAPê, avakirina bendavan, projeyên petrolê û hwd.)
- \* Kurd divê wê îmkânê bi dest xînan da

bikaribin wek şexs yan ji di riya organên xwe yên temsîlî re doza derxînan ber mehkemeyan da maf û azadiyên xwe bi awayekî efektiv biparêzin û garantî bikin ku di demên meşandina karûbarên edlî de hem endamên civaka kurd ji îdarekaran fahm bikin hem ji îdarekar ji wan fahm bikin.

- \* Kurd dixwazin bizava wan a sinâî girêdayî bi çavkaniyên wan ên tebîetê ve be û wekî encama vêya awayê jiyana û kultura kurdan bi wê yekê ve hatibe parastin ku mafê wan ê bikaranîna çavkaniyên xwe yên tebîetê qanûnîyên hatibe naskirin, parastin û rêz li maneya taybetî ya cografyaya kurdan hatibe girtin.

Loma jî daxwazên gelê kurd û kurd bi xwe di mînaqeseyên li ser YE de divê bibin hevparekî guftûgoyan. Kurd dixwazin ku wek gel beşdarî vî prosesê bibin, çimkî ev mesele bi armanc û pêşeroja kurdan ve girêdayî ye.

Sê pîrs hene ku divê ji bal YE û Tirkîyeyê ve bîn bersivdan:

1. YE di programên xwe de dixwaze kurdîtiyê bi çî awayî û ji alî kîjan statû û pozîsyonê ve tarîf bike
2. Tirkîye di serlêdana xwe de ya ji bo endametiya YE kurdîtiye çawa û ji alî kîjan pozîsyon û statûyan tarîf dike.
3. Kurd li nav YE û li nav siyaseta Tirkîyê statû û pozîsyoneke çawa dixwazin?

(\*)Ev nivîs ji norvejî hatiye wergerandin

# YEKÎTÎYA EWRÛPAYÊ Û ENDAMETÎYA TIRKIYÊ

Ev mesela ha, di warê siyasî, abûrî, çandî û ciwakî de qasî ku Tirkîyê alaquadar dike kurdan jî alaquadar dike.

Yanî ev mesela ha ne tenê mesela Tirkîyê ye. Ji bona çareserkirina pîrsa kurd YE (Yekitiya Ewrûpayê) jî bo me kurdan girîng e. Di van demên dawîn de mijara endametiya Tirkîyê ya YE rojevê zêde zêde mijûl dike. Li Tirkîyê yasayên lihevkerinê derxistin, di çerçewa YE de hinek guhartin hatin kirin. Lê înkarkirina pîrsa kurdî di rastiye da ne hatiye guhartin. Hebûna gelê kurd hîn jî bi awayekî fermî nehatiye qebûl kirin. Ji bona çareserkirina pîrsa kurdî tu gavên ku tên daxwazkirin nehatine avêtin. Hîn jî bi zimanê kurdî weşan û perwerde bi sînor e.

Bi rastî jî niqaşkirina mesela kurd bê ka "kêmetewe" ye yan na, bi min pir seyr e. Ji ber ku dunya û alem dizanin ku gelê kurd ne "kêmetewe" ye, ew bi dîrok, ziman û çanda xwe neteweke serbixwe ye.

Berî her tiştî divê dewletên YE pîrsa kurdî di sewîyeke bilind de niqaş bikin. Lê mixabin em dibînin ku îro ev sewîye pir nizm e. Disan mixabin ku dewletên YE gelê kurd bi awayekî fermî ne wek teref û ne jî wek xwediyê pîrsê qebûl dike

Ev pîrs, pîrsa me ye, divê ew ne bi komara Tirkîyê re çareser bike, divê teref em kurd bin.

Bi bîr û raya min divê Tirkîye hin hengavina baveje ji bona bicihanîna pîvanên Kopenhagê û bide xuyakirin ku ew guhartin çêbûne paşîngê jî bona endametiye dikarin li hev rûnin. Yanî YE gerek vê wek erk û merceki deyne ber komara Tirkîyê.

Em kurd wek rêxistin, dezgeh yan jî ferd, ji bona çareserkirina pîrsa kurdî, çî têkeve ser mile me, divê em tixsîr nekin.

Bi destxistina mafên demokratîk tenê bi endametiya YE wê bibe. Kurd wek gelên din yê dunyayê divê xwedî hemû mafên demokratîk bin.

Ayşe Güler

# Dostê Baranê

Hesenê Silo ji baranê pirsî:

– Tu çima konê min şil dikî?

Baranê got:

– Tu çawa diwêrî bêyî vir? Dakeve jêr û tev gundiyeş xwe mîna berê bijî, miqatî mala xwe be.

Hesenê Silo bi hêrs ket:

– Ev êdî karê min e, ez li kuderê xaniyekî ji xwe re şên dikim. Ji te re çî?

Baranê aveke gur reşande konê Hesen, ew jakand û ji erdê rakir. Paşê baranê vekir, Hesenê Silo dîsan carekê dakete gundê xwe û konek din ji xwe re kirî. Wî didît, ku pîrejîn awirân diavêjinê û zilam pê dikenin: “Lê Quran li te ketiyê, teba te li gund nayê? Te jin-zarokên xwe radestî merivên xwe kirin û bi xwe hildikişî ser van giran. Xanebêzarê bêşerm, te li wir çî winda kiriye?”

Baranê jî herdem ev pirs didayê:

– Gelo te li vir çî winda kiriye? Teba te li gund nayê?

Îro jî baranê konê Hesenê Silo tev ava qirêj berda çemê Erezê. Lê Hesenê me li ser ya xwe sekini û konekî nû danî.

Barana westiyayî gazinên xwe kirin:

– Ez li duniya-alemê digirim, lê rastiye bêjime te, min serhişkên mîna te hên nedîtine. Tu jî rind dizanî: Kes tune, ku bi dilxwaziya te re qayil be. Her dirawiseyek (hevû, cînar) berhingarê te ye. De bêje, ez ê avê çawa bireşînim ser deşt û zozanan, ser berm û rûbaran û xelk jî di ser de tuf li rûyê min bike? Gunehê te li min nayê?

Hesenê Silo gunehê xwe pê anî, lê ji armanca xwe daneket. Wî konê xwe danî û rahişte mer û keviran. Berêvarê sekoya xaniyê

nû hatibû danîn. Niha mabû ew xwalya zêde biavêje jêr û şivê bixwe. Hesenê Silo serê xwe bilind kir, li ezmanan nihêrî û ji şabûnan bazda. Xuya ye, ku îro ne ewrayî ye û baran nabare. “Ez ê bi şevê jî bixebitim, mala xwe ava bikim, cihê xwe li vir dayînim.”

Roja din rûyê Hesenê Silo ji xwêdan û tozê reş dikir, lê mala wî ji kevireş ku wî ji dor goristanan kom kiribûn, tik û bedew bala xwe dida Dara Herherî. Gava baran barî û konê Hesen dîsan tevlihev û pirtî-pirtî dikir, ciwamêr xwe di mala xwe de veşartibû û simbêlên xwe badidan.

Ji îro şûnde baranê çî bikira, çî nekira – êdî ne xema Hesen bû. Li bin piyên wî gundê wî bû. Welatê, yê ku ji bona bavê wî yê rehmêtî dîrddest xuya dikir, niha jê re dibîşkurî. Wî aliyê çemê Erezê xaka kurdan bû. Eger meriv li berjêr seyr bike - milê Îranê ye, eger li destê rastê biferice – milê Roma Reş e.

– Te bi ya xwe kir, aferim! – baranê gotê û keniya.

– Çarê, bavê min Siloyê Ceferê rehmêtî gelek li ber xwe diket, ku wî welatê xwe hiştibû. Min jin anî, zarok mezin kirin û niha dixwazim, ruhê bavê xwe şa bikim. Ez ji vir zozanên bereka wî baş mêze dikim. Xwedê bike, rojek bê û ne ala Tirkan zemîna me heram bike, ne jî sînorvanên Farisan.

Hema baranê ev gotin bihîstin, peya bû, li kêleka Hesen rûnişt û ew hembêz kir:

– Tu ji min nexeyide, min rê nedida te, lê tu bi xwe dizanî, neyarên te bi çendî fêlbaz û pîs in. Ez salê diwanzdeh meh gef dixwim, ku warê Kurdan geş nekim. Ev avraban û lehiyên ku tene serê te, wana ev daxwaz kirine. Ez çî



bikim, delalê min? Xwedê fermanan dide min, dibêje: „Cihanê avde!“ Xelk jî bi duhayan zorê li min dike, ku ez mala te xerab bikim. Sawa wan ev e, ku eger te welatê bavê xwe bi ronî û zelal dît, hebe-tunebe, tuê rojekê wî jî xwe re paşde bistîni.

Hesenê Silo dev ji gundiyeş xwe yêş bêtap berdabû û bi xwe bû sedema tirsaxê nexwez û dizekan. Mala wî mîna şaxêş serberz û serberf di navbera ewr-ezmanan de quloz dikir. Carinan Hesen çavêş xwe jî

Xwedê re diqurçandin. Xwedayê hebûn û nebûnê serê xwe bi loman dihejand û bihna baranê teng dikir:

– Tu bi Hesenê Silo nikarî, ez bi wî nikarim, desthilatêş cihanê bi wî nikarin, gelo halê me ê çawa be? De bila ev duniya han hilweşe û bibe geremol! Wê çaxê belkî Hesenê çavsor bibe xwediyê welatê bavê xwe! Tenê ez bi çî rengî qirkirina dijminêş wî asteng bikim? Ne ez Xwedayê wana me jî?

# Xewna Dîrokê

DR. ZORABÊ BÛDÎ ALOIYAN

Nivîsarêş lêkolînî yêş zanyariya gelêş

**Weşanxaneya  
APECê**

ISBN:91-89675-40-1

Navnîşana xwestinê

Box: 8121


SE- 163 08 SPÅNGA

Têlêfon: +46 8 761 81 18

Fax: +46 8 761 24 90

E-post: apec.t@telia.com

Malper: www.apec.nu



## HEWIK ANÊ

Ez nexwaş im were ser min an anê  
Çiyekî xwe dîne li emper min an anê  
Ma sewt solix were ber min an anê  
Derdê hawikê derdê merî malan e an anê

Vê tîranê xûşe-xûş e an anê an anê  
Mala toxtira bişewite an anê an anê  
Kêr meqesa li ser canê Hewikê xûşe-xûş e  
Hewêsa bi Hewikê re mayî an anê  
Destê xwe navit darî dergûşe an anê

Derdî Hewikê derdekî giran e an anê  
Derdî Hewikê derdê merî malan e an anê.

Anqere bişewite çar alî ye an anê  
Hewikê goştê gewr de yarelî ye an anê  
Xeberê ji gawirê gawir re bişînin an anê  
Bên anika minê di singê gewr de yarelî ye an anê.

Bejna Hewikê dara zêtûnê an anê  
Biruzita li Anqerê ber Hastexana Nûmûnê an anê  
Mala toxtira bişewite an anê an anê  
Goştê anika min dane ber meqes-kêrane an anê.

GELERÎ

## KANÎYA GUND

Kanîya gundê me mermer e  
Keçik bûk neman xwe dan ser e  
Ez heyrana singê gewrî kale  
Mede serê xwe şarpa zer e.

Êdê were yar zêwikê  
Va çi sewda te kirê ye  
Dilê min derd û mitik e.  
( Neqeret )

Çem e çem e Zêwo çem e  
Ez î dîsa ji mala metê tême  
Hevalno lewma mekin  
Ez sewdaliyê çave Zêwikê me

Te dî te dî Zêwikê te dî  
Xelk zewicî miradê xwe dî  
Yê ku bi dilê xwe zewicî  
Koşa cenetê bi çavê xwe dî  
Yê ku bi dilê xwe nezewicî  
Li dinê tu xêr nedî.

GELERÎ

## EYŞA MILQATÊ

Eyşik ez hilkiştim serê kelê  
Keçik bûkê gund neman çûn xerdelê  
Hevalno lewma mekin  
Ezî di dest vî dilî de ketme belê

Eyşik ava bîra germe kelî  
Li ser peya bî ye Hezret Elî  
Ez çûm dest nigê vî kalî  
Go miradê te Eyşikê ma dina walî

( Neqeret )

Dikeve govendê çi rind lê tê  
Jê derdikeve kela xwe dê tê

( Neqeret )

---

Ez im ez im Eyšik ez im  
Bavê te yî gawir li min ketîyê qerezê  
Çima pênce hezarî ji min dixwazê  
Eyšik vî motirî gure gure

Ezî derece didê me sêp nabire  
Herin vi bavî Eyšikê re bivên  
Ma were qelinê Eyšikê min bibire.

## GELERÎ

### KEWÊ

Qaz-qulingê têne bir bi biro  
Çima yêk li yêkê ranêbiro  
Xwedê dil-miradê min te bikiro  
Derketê ji min te re êdam qeraro  
Eyšik ava bira germe kelî  
Here lê lê kewê kewê  
Here lê lê kewê kewê  
Li ser zinara li neqewê  
Ber siya zinarekî ketîye xewê.

( Neqeret )

Ez hilkiştîm serê gira  
De pismamno werin vira  
Hewara min tune ji her sê bira  
Omdî tune ji her sê bira  
Eskerîya min Sariqamiş e  
Dane ser min başçawiş e.

## GELERÎ

# Anna û mişkê wê

Hewake sar bû, ezman bê roj, hewake ku meriva ji jiyane sar dikir. Sil li hewalanîya (balefirgeha) Swêdê peya bû. Welatekî xerîb, kesî nasnake. Ji eskerîyê bêtir tu cara bi der gundê xwe neketiwû. Li hewalanîyê peya bû, mîna pisikê ku dikirin çala û diavitin der gund û çolê li dor û alîyê xwe dinêrî. Ew jî, mîna herkesî ji bo dewara dinê ketibû rê û hatibû xerîbîyê. Du-sê deqqa dor paş xwe nêrî, hertişt bi wî xerîb dihat û dinê li serê vî teng bû. Bi dengê Osê pismamê xwe bi xwe hêsiya. Os, neh-deh salwûn li Swêdê dijîya. Li wir karker wû. Hatibû der rêya (pêrgiya) Silê, pismamê xwe bibe mala xwe û bike mîvan.

Osê, sê-çar meha Sil li mala xwe kire mîvan, qîmeta vî rind zanî. Ji bo ku Sil bi cî û war bive çî ji dest dihat dikir. Ji Silê re li jinekê digerîyê da wî bizewicînê. Bi wê re Sil ê mafê xwe yî rûniştinê û mafê karkirinê bidest xwe xe. Anna dît. Anna ya finî wû û bî wû. 25-30 salan ji Silê mezintir wû. Vaya pir jî ne girîng wû. Ji bo ku Sil bi cih biwe tu qîmeta sal û rindîya Annayê tunewû. Bi rastî Sil î li welatê xwe zewicî û bawê sê kurika wû. Ji bo formalita, dixwast Sil 4-5 sala vi Annayê re bijî û mafên xwe bigire.

Dema Sil çû mala Annayê bi cih bû, pir kêfxwaş bû. Bûyîwû xwedîyê malekê. Maleke di xevne şeva de newîne. Maleke pir baş raxistî, maleke bi avsark (saricok), bi tv. Tu malên weng li gundê xwe neditiwû. Êdi di ser wî re mêr tunewûn.

Annayê qedr û qîmeteke mezin dida Silê. Bi Silê ve tev dikirin û tev dixwarin. Jîyan xwaş derbas diwû. Lê li mal zindîyekî din, zindîyekî ku kêfê Silê direvandî hewû; mişkek. Mişkê Annayê... Hebûna vî, pir bi

Silê xweş nedihat. Vî rehetîya Silê direvand. Silê qe ne mişk nasnedikirin. Li welêt, li gundê wî jî mişk hewûn. Lê ewana ne wek mişkê Annayê bi qedr û qîmet wûn. Mişkê Annayê tenakî din gir wû. Lê, qîmeta xwe wek merîyekî ji malê wû. Nanê wî, ava wî wek merîyekî dihat dayînê. Annayê wek li merîyekî mêsdikir, qîmet dida mişkê xwe.

Sil î neh-deh salî wû, bi havalên xwe ve, li gund dewl tijî av dikirin, li dawîya gund, li şûnê xermana, ew ava bi qule mişka de berdidan, mişk ji qula derdixistin. Hen ji wana dikuştin, hen jî qetran dikirin û berdidan hev û du. Mişkan bi xwe û xwe hev û du dikuştin. Tu were vê qederê, dixwast (diviya) Sil ji bo ku li Swêdê bi cih bive çar sala ji wan mişkana bi yekî ve di malekê de bijî. Ma kêfê Silê nereve yê kê bireve. Silê fiqare, ji tirse mişk re ne diwêrî li mal rehet lingê xwe dirêjke. Xeva şeva lê tune wû. Dîtirsîya ku mişk ê bi şev di xewê de guh û pozê wî gezke. Rojekê, gilîyê xwe kire ber Osê pismam û got: "Ez dikarim wî bikujim û jê xilasbim."

Osê got : "Eman ha, vira Ewrûpa ye, mafên heywên ji mafên merivan li welatê me zêdetir e, ew ê te bavên hepisê û ê te ji Swêdê derxin, tu yê vegeerî herî gund. Tu li wir bi cih nawî." û qêm şîret kir, ku tişteki weng neke. Bi ser van gotin û şîretên Osê ve Silê got: "Ê de sewê riziqê kurika (zarokan), çî bikim. Ez ê çar sala didanê xwe biguvêsim."

Rokê Sil ji bo ku xet û beratên zewacê çêke hate gundê xwe. Çend roya şû va Anna jî hat. Dayîka Silê bes li benda bûka xwe wû. Yeke ji Eşê; bûka li mal rindtir, yeke dirêj dipa. Anna hat yeke dev lêv qalin, ji Besê pîrtir, serçav qerçimî û tijî xwe bi goşt wû. Besê got: "Silî

## Ji “Vurucu unsurê” heta Kunsurê

Minaqêşeyek tê kirin, ne bête, ne jî qalê bikin. Heta ku ez ji nav derketim, ez tê da îmanrêş bûm. “kurucu unsur”. Min “kurucu” baş fehm kir, bi tirkî ye, meneya xwe sazdar e. Lê “unsur” çi ye? Min ew şaş, wekî kunsur fehm kir, min got, qey eşîreke kurd bi navê kunsur heye, wekî, çavreşan, henîbeşan û kumsuran. Paşê ez tê gihêştim, ku ne kunsur e, unsur e.

„Un“a tirkî (ard) bi „sur“a (sor) kurdî va bi hev va delîqîne, jê “unsur” peyda bûye. Dîsa jî ez lê ketim gumanê, kûr û hûr li ser fikrîm. Min got, bibe ku, sur ji surên Dîyar-

bekrê hatiwe. Niha hun ê bibên, una tirkî û surên kela Dîyarbekrê, ma çi eleqeya van bi hevdu ra heye? Ehtimal e, ku di zemanekî demên bê zeman da, di şerê zeptkirina surên Dîyarbekirê da, tirkan ard avêtibin serçavên kurdan, da ku ew ber xwe nebînin.

Unsur, kunsur, ard û sur... Merem ez ji nav derneketim. Xewên şevan ji min revîyan û kêf û sefa li min herimîn. Ez çûm cem cîranê xwe, Mîrê Viran. Ew merivekî zana ye, di ser ra ilmdar heram e. Wî ez pê hêsandim. Li gora katkirina wî, hekata “kurucu unsurê” veng bûye:

Dema herba îstîqlalê, kurdan li hemberî dijminên “gawir” mîna şêran, li Ruha û Entabê, li Heymanê û Çelenqelê bi meranî şer kiriye û welat xelas kiriye. Paşê, wexta Cumhuriyetê bê êlankirinê, Atatürk ji begler û meglêrên kurdan ra xewer şandiye, gotiye, “hun jî mezinekî xwe wekî temsildar bişînin meclîsê”. Kurda jî yekî ku pir kêma dibihîze şandine. Kerrê me çûye Anqerê, di meclîsê da, li rêza paşiyê rûniştîye û guh daye ser dengkirina Atatürk. Atatürk gotiye, “Kurdan bi mêranî şer kirin aferî ji wana ra! Ez, sewa vê, li huzura we, kurdan wekî “vurucu unsur”a Cumhuriyetê êlan dikim”. Kerrê me vedigere welêt, civat li dorê kom dibe. Dibê, “Kurdino, ji niha şûn da, Atatürk go, em ‘kurucu unsur’ in.”

Yê Kerr jî “vurucu unsur”ê “kurucu unsur” fehmkiriye. Ne pir e. Lê min, heştê salî şûn da, jê kunsur fehm kir.

De werin, hun ji nav vî îşî derkevin!

mino te ji cîran û hevala jî fedî nekir, te di ser welatan re vava ji min pîrtir anî. Li wî welatî jin teva bûbûn, tu bi vê mayî.”

Silê got: “Etê ez çend roke din bimama derengîyê, min va jî nedidît. Niha Ereba va jî biriwûn. Çi bikim, sewa xatirê we û kurika, ji bo ku bi karker bim, ez ê çar sala vê re herim verim.” di dilê xwe de jî got “Te hale mişk ji ne ye”.

Silê xet û beratê xwe çekirin bi Annayê ve tev vegerîn Swêdê. Çar sal tiji kirin. Bi cî û war bû, mafê rûniştinê û bikarbûyîna bidest xwe xist. Rokê Anna yê li kar bû, çû mitfexê rahişte destiyê badikê bi qûna badikê şiqînî jî şilkê enîya mişk anî. Mişk carekê dudîya pêşta û paşta çû û hat li ser hêlekê gêr bû, ling ji bin xwe berdan û ji xwe derbas bû.

Silê xwe ji mişk xilas kir. Lê Annayê dû çar salên xwaş derbasbûyî him Sil wenda kir him, jî mişkê xwe.



- \* K c k hatayı b y tmenin en iyi yolu onu savunmaktır.  
R ya her  bař ku řař y k biřtik mezin biki, parastina w  ye.  
LENIN
- \* Oturan  c bilgin y r yen  c aptal kadar bile yol almaz.  
S  zanay n r niřti qas  s  hiřsivik n dimeřin ji, bi r  narin.  
METELOKA  INA
- \* Anı yazmak  l m n elinden bir Őey koparmaktır.  
Nivisandina B ran nan; qetandina tiřtek  ye ji dest mirin .  
ANDRE GIDE
- \* Yařlılık da bir konuk gibidir, onu ađırlamak gerekir.  
Kal b y n ji wek m vana ye, gere w  bi m vank .  
HARIRI
- \* Arkada bıraktıklarımızın y ređinde yařamak,  lmektir.  
J yana di dil n y n ku me li d  xwe ve cihistin mirin e.  
CAMPBELL
- \* Her  m r kendi gençliđinden vurulur.  
Her umrek di xortaniya xwe de t  l xistin.  
YILMAZ ODABAŐI
- \* Anneler çocuklarının aklından tutacađı yerde,  ođunlukla ellerinden tutarlar.  
Day k ř na bi hiř n zarok n xwe bigirin, bi piran  bi dest n wana digirin.  
DUPONHOUP
- \* Ne denli  ok okursan oku, bilgine yakıřacak biyimde davranmazsan cahilsin.  
 ikas pir dixw n  bixw ne, te bi řikila zan na xwe radan nekir tu y  nezan  .  
SADI
- \* Amaca g t ren her yol m bahtır.  
Her r ya ku te bibe armanc  mubah e.  
MACHIAVELLI
- \* Kamil ile yoldař olan yorulmaz.  
Y  ku hevr  ye meriv  kamil e neweste.  
HATAYI
- \* Bir amaca bađlamayan ruh yolunu yitirir,  nk  her yerde olmak hiřbir yerde olmamaktır.  
Ruh  bi armancek  negir day  r ya xwe řař dike,  imk  b y na li herderek , qet nebuy na  
li tu dera ye.  
MONTAIGNE

\* Sular yükselince balıklar karıncaları yer, sular çekilince karıncalar balıkları yer.  
Av bilind bûn masî mêrûyan dixwin, av daketin mêrû masîyan dixwin.

METELOKA KAMBOÇYA

\* En çok yitirilmiş gün hiç gülmeden geçen gündür.  
Roja herî windayî, ew roj e ku bêyî tu bikenî derbasbûye.

CAHMCORT

\* Ideoloji uçurumları aydınlatan hırsız fenerleridir.  
İdeoloji ( Bîrûbawerî ) fanosên diza yên ku kortala ronî dikine.

CEMIL MERİÇ

\* Güçlüklerin göbeğinde olanaklar yatar.  
Di navika dijwarîyan de îmkan radizên.

ALBERT EINSTEIN

\* Dumani kurcalayan islenir.  
Yê ku dû pelişandî, dorine bigre.

KAŞGARLI MAHMUT

\* Taşlar değil, yapılan işler anıtları oluşturur.  
Kevir ne, karên hatî kirin abîdeya pêktînin.

MOTLEY

\* Düşüncesiz bilgin kanatsız kuştur.  
Zanayê bêfikir çûçika bêper e.

H. BEKTAŞ VELI

\* Anlamak, beğenmenin başlangıcıdır.  
Fehmkirin, destpêka jê hezkirinê ye.

SPINOZA

\* Az anlamak, ters anlamaktan iyidir.  
Kêm fehmkirin, ji bi şaşî fehmkirinê baştir e.

STEFAN ZWEIG

# Sohbetek li ser koçberîya sedsalan Kurdên Anatoliya Navîn

– *Fikra programeke wek zencîre li ser kurdên Anatoliya Navîn ji ku hat û we çawa dest pê kir*

Sefkan Harûn: Ev fikir belkî hîn sê çar sal berê jî hebû: Em çawa organîze bikin û çêbikin. Lê derfet û îmkân çênebûn. Me vê carê got em têkin piraktîkê. Dema em hatin Swêdê tabî em li ekîbekî jî geriyan, çawa bibe, çawa nebe. Tabî me heval Ayşe û Qadir dît şun da, ew fikir zêdetir xurt bû. Me

got; tamam, vî ekîbî ciyê xwe dît, ew bawerî çêbû ku meriv kare vê programê çêke. Yanî berê jî ev fikir hebû ema ew bawerî tunebû, ew ekîb tunebû ku pê re bimeşe, program-  
eke wisa bi zincîr çêke.

– *Yanî wek Roj TV armanca we ew bû ku hûn programeke li ser Anatoliya Navîn çêkin ku seranser ji bal wan ve jî bê çêkirin, amadekar û pêşkêşkerên programa jî ji wan bin?*



Kadir Çelik, Sefkan Harûn û Ayşe Güler

Sefkan Harûn: Berê jî me beş beş program li ser kurdên Anatoliya Navîn çêkiribûn, lê ew germahiya ku me dixwast nedida. Programçêkeran kurdên Anatoliya Navîn û taybetmendiyên wan nas nedikirin. Programên wan kurt dibûn û zêdetir li ser hozan û dengbêjan dihat kirin. Hema me xwest em wan bi xwe nas bikin; kurdên Anatoliya Navîn kî ne, ji kuderê hatine. Me xwest em kurdên Anatoliya Navîn hem bi kurdên Anatoliya Navîn hem jî bi kurdên Kurdistanê bidin naskirin.

– Yanî ew ciyên we hilibijartin we bi zanyarî hilibijartin? We xwest ku hûn nîşan bidin ku ew jî kurdên Anatoliya Navîn in?

Sefkan Harûn: Erê. Yanî gava ez hatim vir ev fikir bi min re çê bû, min got heke bibe jî ev program bi pêşkêşvanê xwe jî bibe kurdên Anatoliya Navîn. Pêşkêşvan di vir de pîr muhîm e çimkî divê ew kurdên Anatoliya Navîn nas bikin. Li gora wê meriv programekê organîze bike. Bi giştî fikir ev bû.

– Gava we dest bi vê programê û gerra ji bo wê kir, tiştên herî girîng ên bingehîn ji bo we çi bûn?

Sefkan Harûn: Esasî di vê programê de ya ji bo me herî girîng dîrok bû. Çimkî her tişt bi dîrokê dest pê dika. Merivê ku dîroka xwe nizanibe nikare pêşeroja xwe jî ava bike. Rastiyeke me kurdên Anatoliya Navîn heye (Ez bi xwe jî ji kurdên Anatoliya Navîn im) em zêde dîroka xwe nizanin. Ev, tesîrê li jiyane dika. Nezanîna dîroka xwe giran giran tesîrê li kulturê dika, meriv zû asimîle dibe. Pîr kesî nedizanî ku ew ji kuderê hatine, koka wan ji ku derê hatiye. Ew tiştêkî pîr muhîm e. Min dixwest ku xelk bizanin ku ew ji ku derê hatine, xwe nas bikin.



Sefkan Harûn, Berpîrsê Roj Tv ê Stockholmê

– Em dizanin ku daxwaza çêkirina programeke wiha bi we re hebû. Lê gelo ji derva, ji nava xelkê jî, ji nav kurdên Anatoliya Navîn jî daxwazeka wisa hebû ku hûn programeke wisa çêkin? Ya hema we bi serê xwe xwest hûn vê valayiyê tije bikin?

Sefkan Harûn: Ji berê de min piçekî analîz kir ku dîtin çawa ne. Mesela kurdên me yê Anatoliya Navîn rasterast pêşniyar nakin, lê ew daxwaz û hêvî hebû. Dixwestin ku ew jî xwe di televîzyonê de bibînin, program li ser wan bèn çêkin. Me bi xwe jî kêmasî hebûn, me tek tek program li ser kurdên Anatoliya Navîn hebûn, emma tiştêkî wiha tam nehatibû ser ekranê.

– Gava we dest bi vî karî kir ji alî aborî û praktîkê, ji alî peydakirina pêşkêşker û beşdaran çi asteng derketin hemberî we?

Sefkan Harûn: Berî ku em dest bi program bikin em li ser van rewşan sekinîn. Mesela heke tu pîrsa aborî çareser nekî tu nikarî

tiştêkî cuda çêkî. Televizyonê bi xwe ji alî aborî hinekî alîkariya me kir, lê me bi xwe jî xwest em bi xwe hin îmkanan peyda bikin da em karibin rehetir tiştên cuda cuda ji têxin programan, bidin gel. Me xwest kurdên Anatoliya Navîn bi xwe programa bi riya reklam û sponsorayetî finanse bikin. Lê hûn dizanin ku piyaseya sponsoriyê di medyayên kurdan de rûneniştîye, ciyê xwe negirtiye. Loma di peydakirina sponsoran de me dijwarî kişand. Zor bû, lê kurdên Anatoliya Navîn bi alîkariyê û riya sponsoriyê ev program finanse kirin. Vê jî ji bo me rehetiyek anî ku em karibin program berdewam bikin. Heke ne ji alîkariya kurdên Anatoliya Navîn buya di dema filmkêşiyê de û tomarkirinê de, di dema gerra li wir de me yê ji alî aborî dijwariyên mestir bidîtana,

wê ji bo me gellek zehmet buya. Em gellekî sipasî kurdên Anatoliya Navîn dikin. Alîkariya wan piştgiriyeke mezin da me.

– *Niha ez ji Ayşe û Kadir pirs kim. Gava Roj Tv pêşniyariya programeke wiha ji bo we anî, we çi hîs kir û we xwe ji bo vê programê ciqas hazir dît?*

Kadir Çelik: Tu rastiyê bibêjî nîqaşa karekî wiha di nav Vegerê de jî hebû. Lê, awayê wê hîn tam nehatibû zelalkirin. Paşê wexta Sefkan ev pêşniyarî li ser navê televizyonê anî, ji bo min bû firsendek. Min daxwazek di xwe de dît. Çimkî heta niha medyaya kurdan ew ciyê ku kurdên Anatoliya Navîn layiqî wî ne nedabûn wan. Her çiqasî ku ew ji alî siyasî, kulturî, aborî û warên din da qasî kurdên din ciyê xwe digrin, li kêleka wan



Kadir Çelik û Ayşe Güler pêşkêşkirên programê





Kadir Çelik di dema weşanê de

mil bi milê wan tev digerin jî di medyayê de kêma behsa wan dihat kirin. Dilşikestinek di nava kurdên me de hebû ku zêde behsa wan nayê kirin. Gava pêşniyarî ji me re hat, ji ber vê jî bi bê dudilî me got em ê herin vê programê amade bikin. Ez jî Ayşe jî. Ayşe jî berê de ji televizyona Swêdî de tecrubeya wê hebû. Şertê me ew bû ku ev xebat bi profesyonelî bimeşe. Bi vî şeklî karê me dest pê kir.

Ayşe Güler: Fikreke wiha hîn ji salek du sal berê de di serê min de hebû, min digot çima di Roj Tv de li ser kurdên Anatoliya Navîn programên têrnaverok çênabin. Çimkî li vir jî, li welêt jî kurdên Anatoliya Navîn pîr li Roj Tv temaşe dikin. Hema hema li her malê parabol heye. Ev kêmasiyek bû. Min berê jî di televizyona Swêdî de program

çêkiribû, gawek avêtibû dinyaya medyayê. Gava ev pêşniyar hat, min got çima na, welle ez dixwazim vê gavê berdeyam bikim. Ez bi xwe jî ji kurdên Anatoliya Navîn im. Bi vê maneyê jî min ev kar ji xwe re wek wazîfe dît. Tevî ku karê min ê hergavî jî hebû min ev wazîfe qebûl kir.

– *We behsa profesyonelîyê kir. Gava meriv behsa wê dike divê meriv zanibe ku profesyonelî ji her aliyê de lazim e. Hem ji aliyê pêşkêşkirinê hem jî ji aliyê wext de. Ji bo ku tu ji bo hemî karan xwe amade bikî wext jê re lazim e, mesref lê dere. Gelo ji aliyê aborî de jî profesyonelî hebû yan we ev kar bi îdeel kir?*

Ayşe Güler: Ya îdeal a ku dil dixwaze ew e ku ji her aliyê ve bi profesyonelî be. Lê ev îmkân tunebû. Wek hevalê Sefkan jî behs kir. Ev program bi her awayî ji bal kurdên Anatoliya Navîn ve hat amadekirin. Sponsor ew bûn, pêşkêşvan ew bûn, berpirsiyar ji wan e. Yanî bi her awayî ew bi xwe bûn.

Kadir Çelik: Ji aliyê teknîkî ve hevalên studyoyê; ji makyajker bigre heta yê ku deng digre, ê kamerayê xebateke pîr întensîv heye, xebat dikin têdikoşin ji bo ku programeke bi rêkûpêktir derkeve. Dilê meriv hîn rehetir dibe.

Ayşe Güler: Li ser mesela profesyonelîyê... Ez bi xwe ne profesyonel im, min mekteba vê nexwendiyê. Gava pêşniyar ji min re hat, min got "baş e hevalê Sefkan, yekî ku ji min baştir bike, medya xwendibe û pisporê vî karî be, heye yan na". Hevalê Sefkan got "na welle tuneye, tu heyî, Kadir heyê".

Sefkan Harûn: Mesela ekîbî jî pêwîst bû. Min germayîyeke baş di vê ekîbê de dît. Mesela kesekî din ê pîr profesyonel hebe jî gava ev germayî pê re nebe, meriv nikare bi hev re bimeşe.

– *Ji aliyekî din jî meriv dikare bêje ku di amadekirina vê programê de hem ji alî*

*pêşkêşkirin û beşdarbûnê de hem jî ji alî aborî de kurdên Anatoliya Navîn pê re ne. Ew jî dikarin bi karekî wiha re rabîn û wî karî bi ser xî.*

Kadir Çelik: Hat îspatkirin ku derfet bê dayîn, yan îmkan bèn hazirkirin kurdên Anatoliya Navîn dikarin pîrr tiştan derxî. Gavên berê jî wekî **Bîrnebûn, Veger** û ev tişt nîşana wê ne ku kurdên Anatoliya Navîn tiştên bi îstîqrar dikarin bikin.

– *Dema we ev kar qebûl kir û we berê xwe da Anatoliya Navîn xelkê bi çi awayî pêşwazî li we kir? Ew germayîya ku di navbera kurdên vê derê de heye, we li wir jî dît?*

Ayşe Güler: Zêde zêde....

Kadir Çelik: Bi gotin nayê ziman. Min berê jî behs kiribû. Min gellek caran jî Ayşe re jî behs kir. Berî ku em herin meraq û tedirgîniyek di min de hebû: Min xwe bi xwe digot ku em herin gelo xelk wê bi çi awayî pêşwazîya me bike, wê cesaret bike? Di gundan de wê tişt derkevin pêşîya me, em ê karibin bi rehetî hereket bikin? Millet ê qebûl bike bi me re roportajan bike? Em tedirgîn bûn. Lê me dît ku ev tedirgîniyê bêbingeh e. Were nebû. Li gundan, gava me digot Roj Tv, bawer bike li gund kî hebû dihat, hemû bi ser me de dihatin, li dora me dicivyan. Dixwestin me bikin mêvan. Xwarin, rake-tin... Em bernedidan. Çi lazim buya ji me re peyda dikirin. Mesela me digot bilûrvanek lazim e, hema peyde dikirin. Me digot li vî gundî çi tiştên taybetî hene. Digotin, xerabe hene, tiştên tarîxî hene, antîk hene nîzanim şarek hene. Ji wî aliyê de ji Kirşehîrê bigre heta alî Polatlî, Haymana û Cihanbeyliyê seranser li wê deştê astengiyek piçûk jî derneket pêşîya me.

Ayşe Güler: Wan jî pîrr dixwest ku bira gundê wan jî derkeve, bira ew xwe tê da bibînin.

Kadir Çelik: Niha jî mesajan dişînin.



Ayşe Güler di dema weşanê de

Ayşe Güler: Em dizanin pîrsa kurdî ciyê tirsê ye, qedexe ye. Me digot belkî bitirsîn, qebûl nekin, xwe dûr bikin, lê ne were bû.

Kadir Çelik: Tê bîra te em diçûn dawetan, me digot em daweta we bikşînin digotin erê. Me digot em ji Roj Tv ne. Bêyî ku hîn em ji wan re bêjin hema radihiştin mîkrofonê digotin Roj tv niha li vê derê ye, wê daweta me bikşîne. Hema millet çoşek dihatê, dibû qîreqîr û kêfa wan dihat. Cesaretek dihat însanan.

Ayşe Güler: Yan jî digotin filan rojê dîsa dawetek heye, werin bikşînin. Yan tiştêkî din. Bi vî awayî pîr alîkariya me dikirin.

– *Ji aliyê hukumetê yan dewletê tu astengî ji we re hat derxistin yan na?*

Kadir Çelik: Na, qet.

Ayşe Güler: Ew jî belkî ji profesyoneliya ekîbê bû, lê nîzanim.

Kadir Çelik: Lê tiştekek derneket, mesela li aliyê Konyayê li stadyuma Ataturk, konsera Diyar hebû, me kişand. Qlebalixek pîr mezin hebû. Belkî bi sedan jî polîs, sîvîl û jendîrme û erebên wan hebûn. Me jî dikişand, keşî ji me re tiştekek negot.

Ayşe Güler: Ew girêdayî rewşa Tirkîyê ya niha ye. Tirkîye niha piçekî nerm bûye. Du sê sal pêş îro em biçûna belkî ji sedî sed astengî derketana

Kadir Çelik: Me bi xwe jî hin tedbîr girtibûn, tedbîrên me jî hebûn, tedbîr çewa.....

Divê em balê bikşînin ser ku ev cara pêşîn e ku li ser navê Roj Tv televîzyoneka kurdî, ekîbek dere li cîh programan dikişîne. Me tiştekekî tarîxî kir. Cara yekemîn e ku li cî li ser navê Roj Tv program çêdibe.

– *Hilbijartina gundan, we li ser ci esasî kir?*

Kadir Çelik: Me got cografîya ku kurdên Anatoluyê li ser dijîn ku derê be em ê çend gundan ji wê derê hîlbijêrin. Mesela li Kirşehîrê çend gund. Li Balayê, li Polatli, li Koçhîsarê li Haymanayê, Kulu û Cîhanbeylîyê. Bi rastî li van navçeyan em gerîyan û me kişand. Lê em ji sedîsed bi ser neketin. Mesela Yunaxê em nikarîbûn herin. Zemanê me têrê nekir. Bi riya Bîrnebûnê jî em lêborîna xwe ji wan dixwazin. Bi rastî gerek em biçûna. Lê cografîyayek pîr mezin e, ji hidûdê Sîwasê Yozgatê bigre heta Eskîşehîrê bêyi ku tu têkevî nav gundên tîrkan giş kurdin, gundên kurda ne, zemanekî mezin jê re lazîm e, organîzasyonêk mezin lazîm e. Ji alî aborî de cardin îmkanek mezin lazîm e ku tu gişan bigerî û bikşîni. Lê wekî min got li her navçeyê me çend gund kişandin.



Bîlal Ercan û Sefkan Harûn

Cardin me diqqet kir ku eşîret tê de hebin. Mesela şêxbizinî, canbegî, reşî û hwd. Li vê derê jî mixabin ku me gundên sewêdiyan nekişandin. Me nikarîbû em biçin. Lê di plana me de hebûn. Ku îmkân vebe careke din em herin, em ê herin wan gundan jî bikîşînin.

Ayşe Güler: Mesela li Cihanbeylî me Încov û Kelhasan hilbijartin. Kelhasan canbegî ne, Încov jî reşî ne. Me ew hilbijartin.

Kadir Çelik: Her du jî gundên mezin in.

Ayşe Güler: Gundên mezin in. Me got bira merkez ew gund bin. Em çûn li wan deran, me roportaj kirin. Gundên der û dorê jî me tenê dîmen kişandin. Yanî Hacilera heye, gundê Bulduk heye, çend gundên din hene.

Kadir Çelik: Ew jî ku tu derî gundekî rojekê ancax tu derdikevî. Yanî her çûna gundekî rojê me girt.

Ayşe Güler: Meriv dere gund bi milletê re

roportaja dike, wext têrê nake.

Sefkan. Yek jî ev kar cara yekem bû, me baş nizanibû wê çawa here, me got hela em binêrin çiqas bi ser dikeve. Ev cara yekê bû. Lê piştî vê tecrubê meriv dikare çêtir organîze bike. Em dizanin atmosfer çawa ye, meriv li gora wê xwe hazir dike. Di pêşerojê de meriv dikare tiştêkî bi kalîtetir çêke.

Ayşe Güler: Niha ku me ev kar kir, kêmasiyên me jî xwiya bûn. Me kêmasiyên xwe jî dîtîn. Carek din em bikin em ê bêtir organîzekirî bin.

– Baş e, kêmasiyên ku hûn niha dibînin, yek du nimûneyan hûn dikarin bidin?

Ayşe Güler: Kêmasiyek me ew bû ku me karîbû hîn organîzekirî em kar bikin.

Kadir Çelik: Pêş da ku hîn em neçûne, ev gundên ku em çûnê me tesbît dikirin. Di van gundan de kesên ku em wan bibînin,



Çend jinên gundî li Cûdikên heremî



alîkariya me bikin ji me re rêberî bikin me tesbît diki-rin. Pêş de me xeber dida û me teqwîmek çêdikir. Li gora wê em diçûn. Karê me hîn serî û rehetir diçû. Mesela em diçûn gundekî ber dukanekê, ber camiyekê, spontan dibû, em diçûn me digot selamunaleykum, em ji Roj Tv hatine em dixwazin bikşînin. Yan jî berî ku em têkevin gund me li neqewekê, li girekî gund dikişand paşê em diçûn nav gund. Lê tabî zehmetî derdiketin, carnan bi ser nediket. Lê ku meriv bi ewk biçûya... Yek jî ewkê me spesîfik me ewk nekirin, yanî em ê çî bikşînin, dîrok, kultur, çandinî, tîcaret pêşveçûn û ziman, dawet, pir tişt bûn. Me çî dît ew kişand ji bo ku em wekî mîksekê çêkin. Û wekî destpêkê vê bidine temaşevanên



Jineke kurd li Cûdikên heremî

Roj Tv yan jî ji bo hemû Kurdistanê. Da ji her aliyê de kurd bîr naskirin, dawetên wan, zewiyên wan, jiyana wan, xaniyên wan, gundên wan, pezên wan.

Ayşe Güler: Erê, li vê derê me mijar û tema ji xwe re hazîr kiribû, lê pîrr tişt me li wê derê nedidît.

Kadir Çelik: Erê, ez wê dibêm. Pîrr caran tu gellek tiştan hesab dikî, lê li wê derê der-nakeve.

Ayşe Güler: Me çî dît me ew kişand. Pez dotin bû, nan lêxistin bû. Wextê li vir me digot em ê tevnan bikşînin, wextê ew pêz dibin, heriyê dişon em ê wan bikşînin. Ew tişt êdî neman, meşk, tiştên din neman.

– *Belkî ne dema wê bû jî*

Ayşe Güler: Na tam dem jî dema wê bû...

Kadir Çelik: Niha ji 20 salan zêdetir ez li Ewrûpayê me. Berî wê jî ez derketibûm bajêr. Yanî jiyana dîrî gund tu hesab bikî 25-30 sal in. Di van salan de yê ku ez behsa wan dikim gihertinên pîrr radîkal çêbûne. Her tiştê ku berê di jiyana gundan de tiştên central bûn niha neman. Jiyana xwe bi xwe qezenc dikirin. Berê tevn û bêrî û penêr û rûn û mastê xwe bi xwe çêdikirin. Ji bo zivistanê hazîrî dikirin. Tiştên ji bo şewatê, kermên xwe çêdikirin. Niha ew neman. Li Qerejdaxê ji Ayşê re me got tiştêkî otantîk li xwe ke ji bo ku em bikşînin. Ji bo ku ji Ayşê re qiyafetekî herêmê yê otantîk peyda bikin ji her malê tiştêkî anîn, ku xeftanekî temam





Dawetek li gundê Omê

bikin, lê dîsa jî ji sedîsed bi ser neketin. Nemanê, li her malê parçeyek maye.

Ji alî zimên da hîn jî ez di bin tesîra wê de mame, heta riya Koçhîsar û Ankarê dakeve, Bala, Koçhîsar, gundên Kirşehîrê û wan gundên din... Di pîrr gundan de îdî kurmancî dengkirin nemaye. Birînek e însên têşîne. Tê bîra min Ayşe nefesa wê çikiyabû jî bo ku bi çend zarokan re bi kurdî roportajekê bike. Li Kirşehîrê eynî tişt... Tu jê dipirsî sebeb jî ne sebebî jî pîrr ciddî ne. Dibêjin mekteb naxwaziye em kurdî deng kin. Ji bona wê jî em bi zarokan re bi tirkî deng dikin.

– *Niha hin gund hene nêzî qezaya ne, hin gund hene li derveyî komunikasyonê ne. Ferg di navbera wan de hebû?*

Ayşe Güler: Kadir tê bîra te, me bi xwe jî dît, ew gundên piçûk, ew gundên pîrr

pêş neketine zêdetir asîmîle bûne. Niha li gundên Polatliyê, gundên Kirşehîrê, nakokî ye, ew gundên pêşketî mîna Încovê, gundê Omê, Omera, ew gundana hîn pîrr kurmancî deng dikin, yanî bi zimanê xwe deng dikin, nasnamên wan hîn xurttir in, hîn bêtir kurd mane, asîmîle nebûne. Lê ew gundên piçûk, ew ên pêşneketî, av tine, rê tine, gundê Polatliyê yê canbegan hene, kurmancî nizanin. Nizanin, ne mezin ne jî gende, zarok. Em difikirin ku wê tam tersê vê be...

Sefkan Harûn: Yek jî pîrraniya wan çûne derveyê welêt, kes di gund de nemaye, ew pîrr xwiya dike...

Ayşe Güler: Me digot qey ew gundên dûr ên dûrî bajarên wê asîmîle nebûbin, na ne weng e...

Kadir Çelik: Yanî bifikire li Tirkîyê zimanê

ticaretê yê esnafiyê tirkî ye. Tirkî serdest e. Lê ne were ye. Adliye, avokat, qereqol gerek bi tirkî bana lê ne wisa ye. Dihêrî Incovê kes bi tirkî deng nake, zarok, her kes kurdî deng dike, kurdîyeke xweş...

Ayşe Güler: Ji bo ku însanên ku dixwînin li wan gundan zêde ne.

– *Gelo meriv dikare bêje ku ji berê de dewlemendîyeke wan hebû. Mesela gundê Incovê ji berê de eşîrên mezin hebûn bîngehekî wan hebû. Gelo ew ne ji tesîra wê ye?*

Kadir Çelik: Dibe... Nasnameyeke wan a eşîrî hebû, ew jî rihekî liberxwedanê dide jiyana wan, nahelin. Ew gundên din piçûk in, eşîrên wan zêf in, pirê wan ji gund derketine, zû dihelin. Lê dîsa ku meriv bifikire sazîyên ku dihelînin li Încovê, li Omeran, li Kelhasan zêdetir in. Mekteb in, lîse ne, rojname ne, buroyê awuqata ne, belediye û sazîyên din in. Lê tu dibînî ku ruhekî kurdî

tê de ye û bi kurdî diaxivin. Pêwendiyên tî-carî jî bi kurdî dikin. Gundên der û dorê tên Încovê tiştan dikirin, ziman bi kurdî ye, tiştê sanayî bi kurdî ye, bi kurdî deng dikin. Lê mesela gundên piçûk, asîmîlebûna wan derdek e û pêşva diçe.. Tiştêk neyê kirin çend salan şun de belkî kurdî nemîne.

Ya din pêwendiyên wan gundan bi Ewropa ra tesîrek xerab kiriye. Pereyên ku ji van deran diçin wan gundan, însanan ji berhemê bi dûr dixin. Perê ku ji vir dere ne produktîv e, esla tiştêkî wisa tune. Li dor Kulu û Cihanbeylî û wan der û doran, pere tên û meriv li ber derî du kûçikan jî xwedî nakin, mirîşkên xwe jî tune. Mastên xwe jî hazir dikirin, sibê radibin derin ji firnê hazir nan dikirin. Nanê teze jî firin tîne li gundan belav dike. Mastê xwe jî, hêkan jî hazir dikire mîvanek tê tere mirîşkek cemidî distîne tîne çê dike. Ev û rastiya me ya berê li hev nakin. Însan ji berhemê dûr ketine.



Keriyê pêz di mexel de. Gundê Omê

– *Ew gund îdî bûne havîngeh, havînan xelk ji Ewrûpayê diçin li wir vedihesin.*

Kadir û Ayşe Güler: Rast e.

Ayşe Güler: Ji bajarên, ji Awrûpayê havînan tèn li wan gundan tehtîla xwe derbas dikin. Tişteki din ez dixwazim bêjim. Ew gundên piçûk ên paşmayî, cahil mane hişyariya wan a netewî zêde tineye. Niha yên wan gundên mezin dixwînin, nêzikî bajara ne jî, haya wan pirtir ji pêşveçûnên dinyayê dibe, hişyar dibin.

Kadir Çelik: Tê bîra te Ayşe em li Têcirê bûn wan gundên Polatliyê. Li ber pozê Ankarê bûn lê ji gundê Şîrnexê jî xerabetir bûn. Riya wan, ava wan tinebû. Rihê neteweyî heye di nava gencan de, alîkariya me dikirin, şiyarbûnek jî heye lê di mesela ziman de....

Ayşe Güler: Gêncên nuh hîn nuha teze teze dixwînin. Gundên mîna Încovê, Omeran ji berî vê ya bi çel salan xwendeyên xwe hebûn.

Kadir Çelik: Lê ruhîyen neheliyane, tirkî jî biaxivin bes kurd in. Wexta tercîha xwe ya siyasî dikin bi ruhê kurd dikin. Di dawetên xwe de bi kurdî distirên, govendên kurdî dilîzin. Lê ji alî ziman de bi tirkî deng dikin.

– *Gava we bi kurdî bi wan re qise bikira zanîbûn bi kurdî deng bikirana yan na?*

Kadir Çelik: Zarok nizanin. Yên ji 20 salî û berjortir karin deng bikin, lê yên zarok nikarin.

Ayşe Güler: Gava meriv bi wan re deng dike fahm dikin, lê nizanin deng kin. Mezin jî carina were ne. Hebûn 60-70 salî, dest pê dikirin du kelîme bi kurmancî digotin, pişt re çerxî ser tirkî dikirin. Tirkî zimanê resmî ye belkî ji ber wê jî.

Sefkan Harûn: Nizanîm ji wî aliyê de dîtina min ew e ku, di roportajan de jî xwiya dike aliyê Kirşehîr û aliyê din yanî aliyê Kulu û Cihanbeylîyê pîr cudabûn jî heye. Mesela çawa? Em bêjin kalekî 60 salî hebû bahs



Dawet li Încovê



### Dehol û zirne li gundê Omê

dikir. Dibêje ev 40 sal in ez li Îstanbûlê dijîm. Carcaran tê wê derê. Pirranî wisa ne. Kes di gundan de nemane. Di mesela berhemê de jî welê ye. Erdên wan kêmin, mecbûr mane koç kirine, li wir di nava hev de nemane, belav bûne. Çûne Ankarê çûne derên din, ziman ji bo wê çûye.

Kadir. Wekî din jî ev 300 sal in li ber xwe dane. Dewlet bi mekteb televizyon û hertiştên xwe yên din tîn ser wan, tu saziyên wan ên ku ew pê di ber xwe bidin jî tunene. Meriv fahm dike.

– *Em werin ser pîrseka din. Hûn çûn li gundan gerîyan. Tiştê ku pirtirîn bala we kişand ku hûn ji bîr nekin, çi bû?*

Kadir Çelik: Bi rastî her gund bi serê xwe bibîranînek e. Meriv her ji bîr nake. Mîna fîlmekî ez di ber çavê xwe re derbas dikim, lê bilûrvanekî li gundekî Şêxbizina, li gundê Şawlû bala min kişand. Em bûn mêvanê malekê. Bilûrvanek hat got ev 17 sal e min

lê nexistiye, lê ji bo xatirê we ez ê lêxim. Sohbetek xweş dikir. Me fahm kir ku şivan e, ji gundê xwe jî qet derneketiye. Heyateke wî ya ew qas zengîntir heye ku ji ya min belkî hezar qatî zengîntir e. Şêxbizinkî pîrr pîrr baş diaxivî û kurmanciya wî jî ji a min çêtir bû. Kurmanciyeke pîrr otantîk. Di program de heye, tu dikarî temaşe bikî. Bilûrvanekî baş bû. Mîzahçiyekî û dengbêjekî pîrr pîrr baş bû. Mesela kilama Mîrê Hekariyan li wê derê li Haymanayê ji mer e got. Min qet bawer nedikir. Min jê pîrsî ku ev çi kilam e (min got belkî nizane hem a tenê ezber kiriye) got ev kilama Mîrê Hekariyan e. Bi bilûrê zirave digotin him jî behs dikir ka çi zirave ye. Mesela ji Bîngolê nizam kîjan kilam. Ji aliyê din de sohbetçiyekî pîrr xweş bû. Bi saetan bê yî ku ez nefes bigirim, min guhdariya wî kir. Ez çûm Kutluxe. Gewendê kurd in, mitribê kurd in. Tev da bi dehol û zirnê îdara xwe dikin, lê çandiniyê jî dikin.





Dûkana gundê Omê

Gundekî pîrr enteresan bû. Mêvanperwer, ji însanan re dilê xwe vedikin. Tesîrek pîrr mezin kir ku em bûn mêvanên wan. Me çay vexwar. Alîkariyeke pîrr mezin dane me. Li zîrnê xistin, govend kişandin, nîsk li makînê xistin. Ji bo xatîrê me.

– *Dibên ku dema tu diçî vî gundî ji bo ku def û zirneçikî bo dawetê binî, hema te derî yê kijan malê lêxist, divê tu wan dawet bike bo def û zirne, rast e?*

Kadir Çelik: Rast e. Tev da meriyê hev in, tev da vî karî dikin. Lê kurdîyeke pîrr orîjînal li ba wan meriya heye, tesîreke mezin li ser min kir. Me bi jînekê re roportajek kir. Em ê niha nîşan bidin hûn ê bibîn. Ji hemû cografyaya Kurdistanê kesê ku kurdiya wê fahm neke tune. Însanîni muhterem, mêvanhez û dilvekirî ne. Hemû zurnecî ne, ji wê jî şerm nakin û dibên em hemû havînan geçîma xwe ji wê dikin. Lê erdên wan jî hene, pez û gayên wan jî hene. Mîna hemû gundên din. Zarokên piçûk jî dehol û

zirne lê dixin. Min pîrsî, got jin jî dizanin? Gotin na mêr tenê dizanin. Cil milên wan, xaniyên wan, rabûn û rûniştina wan eynî wek yên me ne. Bi her awayên xwe kurd in meriv tu ferqiyê nabîne.

– *Ayşe baş e, bîranînên te çi ne?*

Ayşe Güler: Welle belkî ez mîna keke berbiçav nikaribim bidim. Lê dibê ez bêjim ku berê qet min ev gund û navçe nedîtibûn. Heta Kelhasan bi xwe carekê qasî 2 saetan ez lê mabûm. Ez pîrr bi heyecan bûm, min digot hema ez herim wan gundên Kirşehîrê, Haymanayê, Polatliyê bibînim. Gundên kurdan bûn Tîştê ku ez motîve kirim jî ew bû. Ez çûm geriyam. Ew pîrr germ bûn, wê germayiya wan tesîr li min kir. Di nav ekîb de ez tenê jin bûm. Em diçûn ku, qîmeteke mezin didan min, ez li jor didam rûniştandin. Digotin ev keçîka me ye, ev xunga me ye, ew qas qîmet didan min ku ... Hûn dizanin mesela mêr û jinan li cem me çawa ye. Mesela jinên wan li derva disekinîn,



lê ez li hundur li seriya hemû mêran li ser mînderê rûdiniştim. Carina min ji ber vê hurmeta wan fedî dikir.

A din jî ez wî kalê me yê rindik heta mirinê jî bîr nakim. Ez bûm aşîqê wî kalî. Gava qala xerîbiyê dikir, giriya. Ev çel sal in ew li Îstanbûlê rûdinê, zarokên wî li wir in, havîna tê gund. Gava ew kal tê ber çavên min, ez hîn jî kelogirî dibim.

Kadir Çelik: Tişteki din jî zêde bala min kişand. Em di ber malekê re derbas dibûn nan li tendûrê dixistin. Me hema erebe sekinand çû nan xwest. Gotin ka dakevin werin em ji we re xwarinê çêkin Germayîyeke mezin li her derê, li gundê Şêxbiziniyan jî li gundê din jî heye.

Nêzîkayîyeke mezin nîşanî meriv didin. Meriv dibîne ku mişterekîyeke meriv a zêde heye.

Ayşe Güler: Meriv diçe kuderê, meriv dibê qey em çûne nav meriyên xwe. Em rastî însanan dihatin ku ne me ew dîtine ne jî wan em dîtine. Lê dibêjî qey bi salan e, em hevdu nas dikin. Ew qas germî çêdibe di navbera meriv da. Tu dibê qey mala xalê min, yan xaltiya min e.

– *Baş e, hûn çûn û veşeriyên. Her çiqas kêmasiyên we hebin jî gelo hûn dikarin bêjin ku hûn di karê xwe de bi ser ketin.*

Ayşe Güler: Erê, pirr rehet. Em bi xwe dibînin ku kêmasiyên me habûn û ew çî bûn, lê me karekî pirr baş ê pirr pîroz kir.

– *Heta niha çend programên we ji bo weşanê hazir bûne?*

Ayşe Güler: Heta niha me heşt program kişandin. Yanî em çûn sê hefteyan em li wir geriyên, me film kişandin. Em hatin vira, karê herî zor ê vira yê studyoyê bû. Mêvana bibîne, hunermendan bibîne. Wext dixwaze. Mêvan ji derve tîn, divê çûn hatina wan bê organîzekirin. Kar lazim e. Lê heta niha

zehmetiyên ew qas dijwar jî derneketin. Em kê dawet dikin, kerem dikin tîn, memnûn jî dibin. Me heşt program kişandin, me heta niha du program jî nîşan dan.

– *Ew programên ku heta niha hatine belavkirin, reaksiyona li hemberî wan çî bû?*

Ayşe Güler: Heta niha yên ku ji me re gotine, hemuyan rexneyên pozîtîf anîne.

Kadir Çelik: Di nav xelkê me de ew tradîsyon tune ku telefon bikin, mailan bişînin, dîtînen xwe bibêjin. Heta niha çend mail hatine. Û gava em bi xelkê re têkiliyan datînin, em telefon dikin. Em dibînin ku çoşeke mezin heye, gellek kes program temaşe dikin. Ew bi xwe dibêjin karekî gellek pîroz e. Heta nuha du beş hatin weşandin, heta çend rojan wê ya sisiyan bê weşandin. Gel bi hîssî nêzî programan dibe. Li ser detaylan, kêmasiyên me ranaweste, wan dernaxe ber çavan. Bi awayekî giştî lê dinêre û kêfa xwe diyar dike. Ez bawer dikim di pêşerojê de wê reaksiyon pirrtir zelal bibin.

Ayşe Güler: Bêtir ew bi çavekî dilsozî lê dinêrin, naxwazî kêmasiyên me bêjin. Pirr memnûn in. Li bendê disekin. Heta cara ku em bername diweşînin, ji Danîmarkayê, ji Tirkiyeyê jî vir telefon ji min re tîn, dibêjin me seyr kiriye, pirr xweş bû, programa din kengî ye, îja hûn ê kîjan gundî nîşan bidin? Û hwd. Ew pakêtên me yên li ser gundan gellek bala wan dikîşîne, jê hez dikin. Helbet beşên studyoyê jî ji bo ku mêvan hene, sohbet hene, hozan hene ev gellek bi dilê wan e, lê pakêtên li ser gundan ciyekî taybetî digrê. Ew dixwazî beşên pakêtan hîn dirêjtir bin.

– *Roj Tv tabî li dervayî welêt programên xwe çêdike. Pirranî tiştên wan li studyoyê tîn kişandin. Ez Bawer im ev belkî zêdetir nebe jî yek ji wan programan e ku ji studyoyê derdikeve. Hîn intensîv dibe. Ji bo wê pirr bal kişandiye.*

Sefkan Harûn: Mesela ewkek hebû. Di serî da berî em dest bi programa bikin ew dîtin hebû, me digot ji sedîsed em programa li Anatoliyê çêkin. Em bingehe wê ji wir bigirin. Çimkî mesela di Roj Tv de jî em mînaqêşe dikin, dibêjin herin derveyî studyoyê xwe bigihînin welat. Mesela hin îmkân hene em li vê derê bikar tînin, dibe nîmûne. Me da nîşandan ku tu dikarî çêkî. Zorati miheqeq çê dibin, ji aliyê ekonomî de pîrsgirêk çêdibin. Pîrsgirêkên me ji serî de endîşeya ji alî siyasî bû. Dewlet wê misaade bike yan na? Me di vir de dît eger tu bixwazî tu dikarî tabuyan bişkîni. Di nav xebatkarên Roj Tv de jî mînaqêşe dibin. Dibêjin dêmek em karin herin li cîyê cih programan wiha çêkin. Yanî tabuya hundurê me jî dişkîne.

Ev ji bo me pîrr baş bû. Niha ku program dest bi weşanê dike xebatkarên me bi xwe jî rûdinên li program temaşe dikin. Telefon dikin me pîroz dikin. Tecrubên me yên Roj Tv jî, yên televizyonên berê ên wek Med Tv jî nîşan dan ku divê tu di nav gel da bî. Heke tu di nav gel de bî ew program cîyê xwe digire. Lê heke tu nekevî hundurê Kurdistanê yan ew warên din ên ku kurd lê dijîn, dibe kêmasiyeke mezin. Ev programa me destpêka rakirina wan kêmasiyan e. Em pê kêfxweş in.

– *Xelk xwe nêzîkî vî îşî dibîne germayiyekê nîşan dide?*

Kadir Çelik: Pîsikolojiya temaşevanan pîrr muhîm e. Tiştê pakêr ên wek filmê dublaj hazirkî pîrr lê temaşe nake. Lê

wexta te him li welêt, di nava xelkê de dibîne him jî li studyoyê dibîne tesîreke mezin li ser dike. Dibêjin meriv jî derveyî welêt çûne, zeman dayinê, keda xwe dayine, serê xwe êşandine, geriyane bi xwe tesbît kirine û hatine. Vê weke xebateke ciddî dibîne. Pakêrên bi awayên din jê re basît e, tu dikarî rûnê çend hunermendan binî roportajan bikî û xelas.

Ayşe Güler: Bi saetan rûnê sohbetan bike ew qas zêde tesîrê li wan nake.

Sefkan Harûn: Ji alî rojnamevaniyê jî wisa ye. Her tişt di cîyê xwe de....

– *Em ber bi dawîya sohbeta xwe tên. Lê hin pîrsên min mane. Ew gundên ku hûn çûn însanên taybetî ku alîkariyeke taybetî ji we re kirin hene?*



Kevirê antîk li gundê Omê

Ayşe Güler: Nav pirr in. Lê ne hewce ye em navan bêjin. Lê li her gundî yek dudu hebûn ku bi awayekî taybetî xwe diêşandin, alîkariya me dikirin. Bilal Ercan wek rêvebirekî di nav projeyê de hebû, ciyê wî diyar bû.

Kadir Çelik: Em diçûn gundan me digot em filan kes in, mesela em diçûn Qerejdaxê me pirsî kî kare alîkariya me bike, Koma Xelikan. Bi riya wan me Dr. Mem Xelikan neskir. Mem Xelikan alîkariyek mezin bi me re kir. Ya Mem Xelikan jî digot here filan gundî û navekî din dida me, em diçûn wî kesî em didîtîn. Carina em diçûn teşkilatê DEHAPê wan alîkarî didan me. Yanî merkezê jî nav didane me. Teşkilata Haymanayê, ya Polatliyê, ya Kuluyê. Lê wekî din gel ji xwe rehet bû. Ti diçûyî ber camiyekê gel li te kom dibû, dibû rêber.

Ayşe Güler: Em diçûn, me digot em ji bo Roj Tv hatine em ê programeke wisa çê bikin, ha digotin filankes ê ji we re bibe alîkar. Te didît ku yan muxtar e, yan yekî DEHAPê ye ji wî gundî, yan jî yek din ku em nas dikin heye, ha digotin filankes e. Yan jî hîn ku em nehatine wan gundan me berê tesbît dikir. Wextê ku em herin gundê Şêxbizinan, çend nav hebûn, Polatî jî... Tim hebûn yanî însanên ku ji me re bibin destek hebûn.

– *Ewana giştikan nas dikir ku Roj televizyona kurdî ye û hûn kurdî dipeyivin?*

Kadir Çelik: Erê, tê temaşekirin.

Ayşe Güler: Erê.

Ayşe Güler: Roj Tv, jinên pîr û gede, zarok ew jî nas dikin. Me digot Roj Tv, a wisa (*işareta zaferê dike*) dikirin.

Kadir Çelik: Li Bilika, Bilal Ercan ji jinekê pirsî got "em mala muxtêr dipirsin." Got "çima hûn ê çî bikin." Bilal got "em ê ser navê televizyona kurdî pê re deng bikin." Tevî ku pê re kurdî deng dikir jî ruyê jinikê sar bû. Bilal got "em hatine vê derê bikşînin

kamerayê. Kanala televizyonê." "Çi kanal e?" got. Got "Roj Tv." Sûretê jinikê yê cemidî yê sar guherî got "ha qurban Roj Tv ye (kenê Ayşe). Kerem kin ka werin, va dera jî mala we ye." Nan jî lêdixist. Me zikê xwe jî têr kir. Bi vî awayî bû.

– *Wê çaxê meriv kare bêje ku dizanin Roj Tv ye û li gor wê alîkarî dikin.*

Ayşe Güler: Erê erê, dizanin yanî îdî parabol hene li gundan ew li Roj Tv guhdar (temaşê) dikin.

Kadir Çelik: Te bernade, her kes dibêje ka were min jî bikşîne, gotinek min jî heye.

Ayşe Güler: Dibêje ez jî dixwazim kilamekê bêjim. Roportajekê bi me re jî bike. Yanî diketin dorê, ji me nedireviyan. Tam eksî digotin em jî derkevin, bira me jî bikşînin.

Kadir. Gundê me jî bikşînin.

Ayşe. Herin filan gundî jî. Herin filan malê jî bikşînin.

– *Baş e, ew programek heye, heftê niv saetê, di televizyona tirkî de, xelk ji bo wê çî dibêjin.*

Ayşe Güler: Ew programa kurmançî dibêjî? Kes lê nanêre. Ji ber ku TRT3 ye. Danê sibê dest pê dikin. Ew kanal li her derê jî nayê seyrkirin.

Kadir Çelik: Tirkî xeberên xwe yê tirkî tercumeyî kurdî kirine, wan dixwînin. Ne balkêş e. Xelk ihtiyac nabîne, nêzikî xwe nabîne. Ji xwe di serê xelkê da ew jî heye ku dibêjin televizyona me û televizyona wan. Dibêjin eva ne televizyona me ye.

– *Yanî xelk wê ferqê dibîne ne?*

Kadir Çelik: Erê pirr eşkere. Mesela tişteki balkêş min dîtiye, belkî ne hewce ye meriv binivîse. Mesela tu dibêjî hûn tirkî diaxivin. Li Kesikkopriyê li parkê em rûniştine. Kalekî extiyar got "Yaw biz Kürt olduğumuz için devlet bize bir şey vermiyor. Kürtler kendi kendilerine adam olmazlarsa birşey olmaz".

Dizane siyasetmen riya wî li ku derê ye, cephê wî li ku derê ye, gerek li ku be. Yanî mesela em û ew heye pir vekirî meriv dibîne. Li Kuluyê, gerçî me nekişand, me kişand lê, Tu dibê xaltiyê tu tere ba toxtorê tirk yan kurd Dibê kurd. Serafê kurd yan tirk, dibê kurd. Tişê xwe ji kîjan mexazan distîni. Ji yên kurdan. Yanî li Kuluyê eleqa wan û tirkan bi hev tune. Ticaret jî li wî alî dimeşe, pêwendî jî bi wî alî dimeşe. Ayşe Güler: Ji bo wê xwe parastine heta îro. Kurd mane, zimanê xwe ji bîr nekirine.

– *Tiştên ku ez bipirsim ew bûn, gelo tiştê ku hûn bixwazin bêjin heye?*

Kadir Çelik: Tiştêkî enteresant ê din min dît. Gundê Burunaxinê. Serhed e, yanî weke giravekî ye. Di nav wan gundê reşî û canbegan de ye. Serhedek e bi serê xwe . Tu derî tu dibê qey li Serhedê yî. Yanî hîn kurmançiya

Serhedê ye. Gundekî pîrr germ e. Bi min pîrr balkêş hat, ji bona wê jî em çûn wir. 80ê sal e, ji Eleşkirtê û ji Agriyê qetiyane hatine wir. Gundekî pîrr germ, dost û dilsoz jî bûn. Yanî gundekî wiha. Wekî din em sipas dikin ji bo Bîrnebûnê. Bîrnebûn jî ev program jî ev gî emekê kurdan e, li gora min. Saziyên wan in. Divê hîn zêde bibin, mezin bibin. Kurdên Anatoliyê jî li ser orîjînaliya xwe rengê xwe bimînin, ne ku wek hinên din bikin ji xwe dûr Kevin.

Ayşe Güler: Mesela kurdên Şêxbizin. Kurd têra xwe wan nas nakin. Min ji diya xwe pirs kir ku ew kî ne. Got ew dibêjin ”vitim vitim” Yanî ji wê zêdetir tiştêkî din nasnakin. Li ba hev in, nêzikî hev in, lê hevdu nasnakin. Ev program ji wan re jî firsendek e. Kurdên Anatoliyê yên din ew jî bibînin ku adetên wan ji yên me ne ew qas dûrî hev in, ew ê bêjin ha evana ji me ne. Mesela gundê



Koma merivan li gundê Omê





Kurdên Swêregî li gundê Beşkardeşê

Burunaxin, ev 80ê sal e hatine, hîn jî ji wan re dibêjin gundê mihaciran. Li ber çavê wan ew hin bicih nebûne. Bi vê programa em ê wan nêzikî hev bikin.

Kadir Çelik: Yanî kurdek liku bijî wê zanibe ku li Anatoliyê kurd hene. Hejmara wan gelek in û hîn jî jiyaneke kurdewarî dajon. Nasnama wan pîr xurt e û kurdbûna xwe heta niha parastine. Tişteki enteresant e, di tarîxê de pîr nehatiye dîtin. Ji bo wê jî ev program wê di nav wan de bibe pirek. Di navbera kurdên Anatoliyê û kurdên Kurdistanê û hemû kurdan de. Her wiha daxwazek min ji kurdên Anatoliyê jî heye. Divê kurdên Anatoliyê di nava saziyên kurdan de cih bigrin, saziyên xwe ava bikin. Hingê dikarin tiştan jî taleb bikin.

Her wiha divê lêkolîn li ser kurdên Anatoliyê hebin. Belkî di paşerojê de programên din jî

li ser kurdên Anatoliyê hebin. Ji aliyê hunerê de. Kurd divê tiştan taleb bikin, ji bo tiştan taleb bikin divê bi xwe jî tiştina bikin. Bêjin em hene û em dikarin bikin û tenê rê li ber me vekin.

– *Televîzyon gellek muhîm e, întensîv e heke ne li her malê be jî li her du malan yekê televîzyon heye haya gişan jê çê dibe. (Ayşe Güler: Li her malê televîzyon heye, hin rast e)*

Ayşe Güler: Gotina min a dawiyê ye. Kurdên Anatoliya Navîn heta niha kurdiya xwe çawa dom kirine bira niha jî dom bikin. Bira teslîmî teknolojiyê nebin, zimanê xwe, kurdiya xwe terk nekin, ji bîr nekin. Ez bi xwe pir pozîtîf im, bi hêvî me. Wek Kadir jî got kurdên Anatoliyê çi qas gund bi gund jî bin eşîr bi eşîr jî bin, pîr ew qas têkilî di nav wan de tune, gundê me berê keçik



nedidan gundekî din, digotin; xerîb e. Ev program wê nêzikayî û germayî di nav wan de jî çêke.

Kadir Çelik: Xwexurtkirin pîrr muhîm e. Binêre îro li tîraja Veger û Bîrnebûnê binêre meriv dibê eybek e. Kurd naxwînin. Ji hêla din jî derdekî wan heye dibê ez ji ku hatime, bila hinek binivîsîn, yan jî pîrsek min heye hinek cewabê bidin. Ji ku hatiyê baş e. Evna tiştê kollektîf in. Ên ku destên wan qelem digrên di nav vê xebatê de divê bên dîtin ji bo wan xurt bikin. Û yên din jî divê wan bixwînin, belav bikin, mezin bikin ku ev kovar bi ser kevin. Program jî wisa. Kollektîvîzmek lazim e.

– *Helbet, vekiriye. Heta em bi xwe nekin, nabe. Tê bîra min gava me nuh dest bi weşandina Bîrnebûnê kir, pîrr kesan digot quweta wan çiyê, çend hejmar derkevin wê bisekinin. Lê me dît eva ye 25 hejmar derketin, bi sedan kesan tê de nivîsîn û ew berdeyam dike. Ev tê wê maneyê ku kurdên wê derê divê bi xwe xwedî li doza xwe derkevin.*

Sefkan Harûn: Ev program jî wisa ye. Gava me dest pê kir, gellek kesan, hin kesên gellek nêzî me jî digotin hela hûn yekê çêkin em bibînin ka hûn ê berdeyam kin yan na. Ev pîrr balkêş bû. Me digot na em ê çêkin em ê bigihîjin armancên xwe. Divê meriv xwedan îddîa be. Îddîa hebe meriv digihîje mexseda xwe. Bîrnebûn jî Veger jî wisa ye.

Ayşe Güler: Kurdên Anatoliyê zû bi zû tiştêkî bi xwe nakin, lê gava tiştêk çêbû jî, xwe

didin ber eleqa xwe zêde dikin. Ev program jî, kovarên Bîrnebûn û Veger jî delîla vê ne. Em çûn Kirşehîrê behsa Bîrnebûnê dikirin. Çimkî Hecî Erdoğan, Bekir Dari ji wir in. Em çûn Gölyaziyê, li wir standek hebû kovara Bîrnebûnê li ser difrotin, Veger tunebû. Min got Veger çima tuneye, gotin negihîştîye nehatiye vira. Li wan gundan haya xelkê ji van her du kovaran hene. Ji bo ku xelk xwe di wan de dibîne, stiranên xwe, çîrokên xwe, dîroka xwe di wir de dibînin. Însanên ku ew nas dikin di wan de dinivîsîn, alaqa heye.

Sefkan Harûn: Ez dixwazim li ser ciwanên kurdên Anatoliya Navîn tiştêkî bêjim. Dikarin di pîrr karên cuda cuda de xwe bi pêş xî, lê wê fikra ku ”ez herim Awrupê xwe bi cî bikim, şaş e. Meriv dikare li ciyê xwe pîrr tiştên mezin bike. Di pêşerojê de jî ez alîkariya wan dixwazim. Dikarin alîkariya televîzyon, radyo, Veger û Bîrnebûnê di her aliyê de bikin. Dikarin tevî karên van dezgeyan bibin. Mesela ez dinêrim zêde ciwan tê de tune, pîrr kêr. Wek muhabîr dikarin ji kovaran re xeber û nivîsan verêkin. Ez ji berpirsiyarên Veger û Bîrnebûnê re jî pêşniyar dikim ku zêde cih bidin ciwanan, wan teşwîk bikin.

– *Gelek xwendevan û genc hene, di nav wan de kêr be jî meyla kurdî heye. Divê ev potansiyel heba nebe. Sipas ku we wexta xwe da me û me ev sohbeta xweş kir.*

# Kalê xiş û xal û keçikên wî

Di wext zemanekî da gundekî piçûk û sîrîn hebûye. Li wî gundî malbatek, di wê malbatê da jî mêrikek, jinikek û du jî keçikên wan hebûne.

Rojekê ji nişka va dayika malê dimire. Malbat bê dayik dimîne. Kar û barê malê gî tevehev dibe. Mêrik demekê wê rewşê îdare dike. Lê mês dike ku şûna jina wî tiji nabe. Wê çaxê mêrik tê digihêje ku kar û barê malê ne karê mêra ne û qîrarê digre, ku ji xwe ra jineke din bîne. Ji dost û hevala pirs dike, ka jineke munasib li cîwarê ji bo wî û keçikên wî heye yan tune.

Pir zeman î najo, mêrik ji gundekî cîran ji xwe ra jineke din tîne.

Gava jinikê tîne mal, pê ra dibire ku gereke ew qîmeta keçikên wî rind bizane. Jinik jî daxwaza mêrik qebûl dike.

De tu were wê, jinik suyakê serê keçikan dişo, du suyan serê keçikan dişo, suya sisiyan tere ba mêrik û pê ra dibê: "Ma ez xudanê xwe û keçikên te me? Ez êdin tu li keçik- meçikên te mês nakim. Yan tu ê rêyekê li keçikên xwe bikî, yan jî li min."

Bavê malê, li hemberî wê helwesta jinikê ziq dibe, dadiweste û nizane bê çi. Zaten tîrsa wî jî ew bû. Ku bavê malê xwe topî ser hev dike şu va, li jinikê vedigere û dibêje: "Jinik meke, ew keçikên min in, perçeyek ji canê min in. Ez ê çîng ji keçikên xwe bibim?"

Jinik dikeve eynatê û ji gotina xwe venagere.

Mêrik ber digere-ser digere lê jinikê ji

eynata kûçikan nikane vegeerîne.

Gava mêrik fam dike ku vegeerandina jinikê ji daxwaza wê ne mimkîn e, bi awayeke bêçare careke din çexî jinikê dibe û dibê: "Madem tu min mecbûr dikî ku ez rêyekê li keçikên xwe bikim, hînga tu bê ez çir bikim."

Ser vê gotina mêrik, jinik dibê: "Li kaniya jêr bireke kolayî û bêav heye. Li hêla birê ji dareke palûta (berûyan) heye. Tê siftê li ser birê postekî raxî û paşê jî bi keçikên xwe ra bibêyî, werin em herin kaniya jêr ku ez ji we ra palûta top kim. Ku keçikan ningê xwe çîng avêtin ser post, ew ê yek bi yek têkevin nava birê."

Dora din a rê, mêrik siftê tere kaniyê û wekî gotina jinikê postekî li ser birê rêdixe.

Paşê jî tê ba keçikên xwe û ji wan ra dibê: "Keçikno, de werin em herin kaniya jêr, ku ez ji we ra palûta top kim."

Ser vê gotina mêrik, ji her tiştî bêxeber, keçik didin dû bavê xwe û tîs ser kaniyê. Gava tîs ser kaniyê, mêrik bi keçikên xwe ra dibê: "De hûn li ser vî postî han rûnin, ku ez ji we ra palûta top kim."

Ku her sê keçik çîng ningê xwe davên ser postê raxistî, gî bi hev ra dikevin nava birê.

Mêrik jî cara paşiyê di ser birê ra li keçikên xwe mês dike û çexî mala xwe dibe.

Keçik di hundirê birê da dikin qîreqîr, dikin wêrewêr, lê ne bavê wan û ne jî kesekî din tê hawara wan.

Di hundirê birê da ne av, ne jî xwarinek heye. Heft ro-heft şeva her du xwang tî û

birçî dimên. Ser vê yekê xwanga mezin bi ya piçûk ra dibê: "Xwanga piçûk, di vê bîrê da heft ro- heft şev in me tiştekek nexwariye. Êdin tu dermanê min nema. Yan tu ê çareyekê ji me ra bibîni yan jî ez a te bixwum."

Xwanga piçûk bi vê şora xwanga mezin diqehire. Dest bi girî dike û bi qurçikan bi bîrê dikeve. Ji bîrê kêreke paskî derdixîne. Bi wê kêrê dîwarê bîrê dikolê, heta ku quleke piçûk vedibe. Bi wê kêrê dixwaze qulê mezin bike, ku jê bi derkevin û xelas bin. Lê wê carê jî, kêra paskî ji nişka va dişkê û qul piçûk dimînê. Xwanga mezin tê xwe di qulê ra dike, lê ji ber ku qul pir piçûk e tê helnayê. Hînga xwanga piçûk serê xwe di qulê ra derdixe ku çî derxe; dibîne ku gomeke bi bîst kirîşa, tê da pence hespî beglikê û hewuz e, li ber wan jî tiji hêcîr e. Xwanga piçûk cîlê di qulê ra baz dide û tere pêşa xwe ji hêcîrên li ber hespan tiji dike û tîne ji xwanga xwe ya mezin ra, ya di bîrê da. Her du xwang bi wan hêcîran zikê xwe têr dikin. Bi wê siklê, zemanekî dirêj rê li xwe dikin.

Xudanê hespan jî ku du bira ne, mes dikin ku hespên wan bi her roja ku derbas dibe jar û jartir dibin. Birayê mezin dikeve gûmana. Li gora wî di nav vî karî da dizek heye. Birayê mezin tere xwe di quncikekî gomê de verşêr dike (vedîşêre), lê tişteki nabîne. Ji wî bi şu va birayê piçûk mîna birayê xwe yê mezin xwe di quncikekî da verşêr dike. Bi carekê ra mês dike, ku ji binê erdê keçikek weke berfa spî derdikeve. Keçik li ber çavên wî tê û pêşa xwe bi hêcîrên li ber hespan tiji dike û tere di bîrê de vala dike. Birayê piçûk cîlê ji şûna xwe difilte û radihêle guliyan. Siftê xwe dide naskirin, ku ew du bira ne û xwediyê wan hespana ne. Pasê jî jê dipirse û dibê: "Keçê, tu çî ins î çî cins î?" Keçik ji tirsra ra mat dibe û devê wê dikeve hev. Ser vê yekê birayê piçûk hêrs dibe û pirsra xwe careke din dubare dike:

"Keçê, yan tu ê bibêyî tu çima hêcîrên li ber hespên me didizî, yan jî em ê te bikujin."

Heta hînga xwanga piçûk xwe topî ser hev dike û dibê: "Em du xwang in. Dayika me rojekê ji nişka va mir. Bavê me jî çû jineke din ji xwe ra anî. Jinik ê siftê ji me ra rind bû, lê paşê paşê ê xêr bi me nedikir. Bavê me jî em bi topkirina palûta xapandin û em avêtin bîreke bêav, ku em heta niha têda ne. Di wê bîrê da wext û zeman derbas bû. Em tî û birçî bûn. Rojekê ji rojan xwanga min a mezin bi min ra got, gerek e yan ez çareyekê ji halê wan re bibînim, yan jî ew ê min bixwe. Min jî li ser wê yekê, ji neçariyê dest bi kolandina bîrê kir. Ji bîrê kêreke paskî derket. Bi kêra paskî jî min qulek di dîwarê bîrê de vekir. Ku hîn qul bi têrahî mezin nebû bû, kêra paskî şikest. Ji ber ku qul piçûk bû, tenê min kanî xwe jê bi derxim. Ku ez di qulê ra derketim şu va, min goma we û hêcîrên li ber hespên we dîtin. Ji wê rojê vir da, tenê ji bo ku em ji birçîna nemirin ez hêcîrên we didizim."

Li ser van gotinên xwanga piçûk, birayê piçûk serê xwe di qulê ra dike û wekî gotina xwanga piçûk, xwanga mezin ya di bîrê da dibîne. Gava birayê piçûk ew xwanga mezin ya di bîrê da dibîne, hêrsa wî tere û bi xwanga piçûk ra dibê: "Min baweriya xwe bi we anî. Ez ê we ji vê bîrê derxim. Lê ez mecbûr im we bibim cem birayê xwe yê mezin. Ewê yan we efû bikê, yan jî cezayekî li we bibire."

Birayê piçûk li ser şora xwe dadiweste û xwanga mezin a ku di bîrê de ye derdixe. Her du xwangan dide dû xwe û rêya mala wan digirin. Gava tîne ber deriyê malê, birayê piçûk bang li birayê xwe yê mezin dike û dibê: "Birango, ka were derva meske min ji te ra çî aniye."

Birayên mezin çing dengê birayê piçûk dibihîze, bi satkê ra derdikeve derva. Derdikeve derva ku çî derkeve, li hêla birayê

piçûk, du keçikên mîna lokizê vêdikevin dawestiyane. Birayê mezin dilê xwe dikeve keçikan, le bi ruyê xwe naxîne. Birayê mezin bi awayeke şaşbûyî ji birayê piçûk dipirse û dibê: "Va keçikana çi tewa ne birayê piçûk."

Birayê piçûk jî yek bi yek hal û rewşa keçikan bi birayên xwe ra kat dike. Ji dengkirina birayê piçûk şuva, birayê mezin çexî her du xwangan dibe û dibê: "Keçikno, em ji halê we fam dikin. Lê gereke hûn jî ji halê me fam bikin. Her çiqas we hêcîrên li ber hespên me ji ber biçûbûnê dizibin jî, we zîyanek li me daye. Yan hûn ê daxwaza me bînin şûnê, yan jî em ê we bikujin."

Xwanga mezin gavekê pêşta tê û dibê: "Hûn ji me çi dixwazin?"

Birayê mezin: "Em du bira ne. Hûn jî du xwang in. Eger her yek ji we yekî ji me bike, wê çaxê em ê we efû bikin."

Xwanga mezin: "Em ê we bikin. Lê berî ku em bi we ra bizewicin gereke hûn jî daxwazên me bînin şûnê."

Birayê mezin: "Hûn çi dixwazin?"

Xwanga mezin: "Ya siftê, em hîn piçûk in û niha nikanin bizewicin. Ya duduyan jî hûn ê heyfa me ji bav û damariya me heynin."

Birayê mezin: "Em ê zewaca bi we ra bihêlin heta ku hûn dibin keçikên berzewacî. Heyfa we jî, em xwe tevî wê meselê nakin. Ew ne karê me ye. Ancax, ku her yekê ji we lawikek ji me ra anî û bûn xort, wê çaxê ew dikanin heyfa we heynin."

Bi vê siklê her du xwang û her du bira li hev tên.

Dem û dewran derbas dibe. Her du xwang mezin dibin, dibin berzewacî. Wekî ku li hev kiribûn, xwanga mezin didin birayê mezin û xwanga piçûk jî didin birayê piçûk.

Zivistan û bihar ser hev dikevin, her du xwang bi du cana dibin. Xwedê her yekî lawikekî keleş didê, ku bi rindiya xwe li çar

aliyê dinê nehatibûn dîtin. Dayikên wan pir li ser lawikên xwe dicirfyan. Gotineke wan ne dikirin dudu. Çi dixwestin ew didanê.

Bavikên wan jî, ji piçûkiyê de ew bi xwe re li çiya û baniyan digerlandin. Li hespê siwar dikirin û ew hînî neçîrvaniyê dikirin.

Gava bûbûn xort, li gund kesekî ji ber wan nediwêriya.

Rojekê her du xwang şora xwe dikin yek, ku serpêhatiya xwe ji lawikên xwe ra qal bikin.

Ëvarekê, gava tevahiya malbatê li ser nên rûdinin, xwanga mezin dest bi qalkirinê dike. Di serê wan re çî derbas bûye yek bi yek ji lawikan ra qal dike. Her du lawikên ku heta wê rojê hay ji tu tiştî nebûn, didin zanîn ku çî li dayikên wan hatiye kirin, ew jî wê li bav û damariya dayikên xwe vegerînin.

Dora din a royê, her du bira li hespên xwe siwar dibin û dikevin rê.

Pir terin hendik terin, li ber dîwarekî xil û xwar rastî kalekî xiş û xal tên. Dilê her du birangan bi kalê xiş û xal dişewite. Ser wê re, her du bira xwe nêzikî kalê dikin û jê dipirsin: "Ew çi halê te ye kalo, xêr e, şer e?"

Kalê xiş û xal keserek kûr dikşîne û dû ra: "Xudê tu kesî şaş neke xortino, min bi xwe xwelî li serê xwe kir".

Her du xort: "Çima çir bû kalo?"

Kalê xiş û xal: "Bi salan berî salan malek, jinikek û du ji keçikên min ên piçûk hebûn. Bi teqdîra Xudê rojekê jîna min ji nişka va mir. Min jî çû jinikeke din ji xwe ra anî, ku ma(bira) li min, keçikên min û mala min mês ke. Her çî qas min di serî de pê ra birîbû jî, jinikê li keçikên min mês nekir. Ez mecbûr kirim, ku ez keçikên xwe bi destê xwe bavê m bîrekê. Min jî bi destê xwe keçikên xwe avêtin bîreke bêav. Ez umma bibim. Ter paşiyê xêr bi min jî nekir û ez ji mal qewitandim."

Ji qalkirina kalê xiş û xal, her du xort jê

tînin der, ku kalê ew lê digerin ew e. Lê belê li ruyê xwe naxînin. Ser wê re xortê piçûk di guhê xortê mezin da dike pistepist û dibê: "Me niha çing di pî û baskên wî ra girtin, em ê wî li ber ningên dayikên xwe raxînin."

Xortê mezin dide zanîn, ku wana hîn damarî nedîtîye û gereke ew wê jî bigrin û bi xwe ra bibin.

Di wê navberê de kalê xiş û xal ji pistepista xortan dikeve gumana û ji wan dixwaze, ku xwe bidin naskirin. Heta hînga xortê mezin: "Em him pîmamê hev in û him jî pîxaltiyê hev in. Dayikên me xwang û bavên me jî birangên hev in.

Bi salan berê gava dayikên me hîn piçûk bûne, rojekê ji nişkava pîrika me mirîye. Kalê me jî çûye jineke din ji xwe ra birîye. Damarîyê xêr bi dayikên me nekiriye û kalê me jî dayikên me avêtine bîreke bêav. Ku zemanekî dût û dirêj di bîrê de tî û birçî dimên şu va, bavikên me bi şerta zewacê ew jî bîrê xelas kirine. Niha jî li ser daxwaza dayikên me em ji mal derketin, da ku em heyfa dayikên xwe heynin."

Kalê xiş û xal mêt dike, ku serpêhatiya wî û ya xortan hevdû digre. Hînga ew jî jê tîne der, ku her du xortên li ber wî dawestiyayî newiyên wî ne.

Cilê fêr bi juniyên wî da tê û xwe davê suyê(stuyê) xortan. Lê belê xort wî ji ser xwe çeng dîkin û dibên: "Însanekî ku bi destên xwe keçikên xwe bavê bîrê, em wek kalê xwe qebûl nakin. Ji xwe em ê te û damariyê bibin cem dayikên xwe û ew ê heyfa xwe ji te û damariyê heynin. Loma jî gereke tu şûna damariyê bi me bimêrîn."

Kalê xiş û xal bi awayeke stûxwar sûnçê xwe li xwe dine û ji bo ku şûna damariyê bi xortan bimêrîne dikeve pêş xortan. Kalê xiş û xal peya û her du xort jî bi hespan rêya malê digirin.

Li dû rêwîtiyeke dût û dirêj tîn li ber malê peya dibin. Carekê li dora malê çex dibin û malê kewş dîkin. Di teqa hêla malê ra li hundirê malê mes dîkin û damariya êdî pîr bûyî, bi kincên dirî û porê qij li serî wekî holik, ku di nava gil û gemarê de rûnistiye dibînin.

Her du xort û kalê xiş û xal derbasî ber deriyê malê dibin û xortê mezin bi dengekî westiya bang li damariyê dike û dibê: "Pîrika malê, em rêwiye rêya dût in. Xêra bav-diyên xwe aveke sar bide me."

Pîrika ku bi salan deriyê wê nehatibû vekirin, ji her tistî bêxeber tere û deriyê malê vedike. Ku çing deriyê malê vedike xort bi porê pîrikê digrin û wê heydinin bin zepta xwe.

Berî ku pîrik fam bike ka çî bi serê wê de hatiye, xort xwe didin naskirin û didin zanîn, ku ew newiyên kalê xiş û xal in û dayikên wan jî ew jî bo wê û kalê wan bigrin şandine, ji bo ku ew heyfa xwe ji wan heynin.

Her du xort li hespên xwe sîwar dibin û tevî pîrik û kalê xiş û xal didin ber xwe û berê xwe ber bi malê ve dîkin û dikevin rê.

Her du dayikên xortan jî bi umîdiya ku lawikên wan vegezin mal, ji sibê heta evarê enîşkên xwe dîkin teqê û bi çar çavan li deriyê wan çav dîkin.

Rokê gava her du dayik dîsa di teqê ra mêt dîkin, ji neqewa pêş gund da ji nişka va lawikên wan li ser hespên xwe û li pêşiya wan jî kal û pîrikek xuya dîkin. Bi nêzikbûna wan, dayik jê tînin der, ku kal û pîrikên li ber lawikên wan bav û damariya wan in. Dest û ningên dayikan li hev dipiçkin û di hundirê malê de li dora hev çex dibin.

Gava xort digihên ber malê, bi dengekî bilind bang li dayikên xwe dîkin û radighînin, ku wan şora xwe aniye sûnê.

Her du dayik bi hestên xof û tev li hev



derdikevin derva. Li ber malê pîrik, kalê xiş û xal, her du dayik û xort li hev kom dibin. Li dû bêdengiyekê xortê mezin bi awayeke ji xwe bawer hal û mekana kalê xiş û xal û pîrê yek bi yek ji dayik û xaltiya xwe ra kat dike. Kalê xis û xal sûcê xwe qebûl dike û ji keçikên xwe bexişandina xwe dixwaze. Dû wê ra, damarî dixwaze bi înkarkirina sûcê xwe, xwe biparêze. Lê bi azara xortan deng ji wê jî tê birînê.

De tu were wê, li hember stûxwarî û xiş û xaliya bavê xwe her du keçik nerm dibin.

Ser wê re, her du dayik çend gavan ji bav û damariya xwe dûr terin û di nava hev da li hev dikin, ku ew ê bavê xwe efû bikin. Lê belê dev ji helanîna heyfa ji damariyê bernadin. Ji bo wê jî bi dizikî xortan wezîfedar dikin, ku di bin dareke li paş malê kortekê bikolin, ser kortê postekî raxin û ser post jî sufreyekê dînin. Armanca dayikan ji wê yekê ew bû, ku wekî li wan hatibû kirin ew jî li damariyê vegeirînin û bi wê şiklê heyfa xwe ji damariyê heynin.

Heta ku xort li paş malê kortê dikolin, dayik jî tèn ba bav û damariyê, ku wan egle bikin. Ji derew- merewa dibên ku êdî pir zeman di ser meselê ra derbas bûye û ji ber

wê yekê jî ne gerek e ku ew hizbê bajon.

Bi vê gotina dayikan, wekî ku dûmanekî tûj ji ser serê wan rabê, kal û pîrik rehet dibin. Ji şabûna tu xis û xaliya kalê namîne.

Di navbera ku keç, damarî û bav tèn hemêza hev, xort jî korta xwe dikolin, postekî li ser kortê radixin û sufrê jî dîtînin ser. Dû wê ra bang li kal û damariyê dikin ku, wana li paş malê di bin sîya darê de sufreyek ji bo wan hazir kiriye. Her du xort ji bo ku rê bi wan bimêrînin dikevin pêş. Kal û damarî didin dû xortan û her du dayik jî wan ji ter paşiyê teqîp dikin. Gava tèn binê darê, xort kal û damariyê dawetî ser post dikin. Ku çing damarî ningê xwe davê ser post, her du xort di pî kalê ra digirin û wî ji ketina kortê xelas dikin. Lê pîrik bi tevî sîv-sevinan dikeve bîrê. Her çiqas di kortê da bike wêre-wêr û qîre-qîr jî, xort bi awayek lez û bez hundirê kortê bi xweliyê tijî dikin û pîrikê tê da vedîtîsîn (difetîsîn).

Bi wî şiklî xort murada dilê dayikên xwe tînin şûnê û heyfa wê ji pîrikê heydinin.

Çîroka min çû matê, rehmet li vê cumatê.

# Kerê xwelîyê

Çi hebûye çi tunebûye, pîrr salan berê li gundekî malek hebûye. Wê malê heft lawiênan xwe hebûne û herkes ji halê xwe memnûn bûye. Daxwazek wan î tenê hebûye: Her heft lawikên wê malê tim xwestine ku xûçkeke wan jî hebe. Dayîk û bavê wan jî vê daxwaza wan zanibûne.

Pîrr dihere hindik dihere, têye gotinê ku dayîka wan lawikan bi du cana ye. Dema ku ew vê xebere dibîhizîna pîrr şa dibin. Her roj li ber Xwedê digerin ku ew zarok bila keçik be. Her roj li hevûdin ra qal û behsa xûçka xwe, a ku hîn nehatîye dinyayê dikin. Bi wî awayî pîrr zeman derbas dikin. Rojekê ku li der da tene malê dibînin ku li mala wan şahî heye. Ew fahm dikin ku xûçkeke wan bûye. Li derveyî malê govendê dikşînin. Şîraniyê belav dikin. Gundî û cîranê xwe jî bi xwe ra şa dikin. Navê xûçka xwe-ji bo ku ew por zer e- Zerî dadînin.

Çend roj, çend hefte derbas dibin. Dayîka wan nexweş dikeve. Pîrr hekîm û toxtir tene ser wê, pîrr dermana li wê dikin lê qet defera wan nabe. Roj bi roj bê hal dikeve, jahr dibe. Her heft bira jî bi derdê dayîka xwe da dikevin. Pîrr caran be şiv û bê xew dimînin. Ew dixwazin ku dayîka wan dîsa rabe ser lingê xwe. Du-sê heftan şunda rojekê ku ew li derveyî malê kar dikin, dengê şîne dibîhizîna û têye gotinê ku dayîka wan mirîye. Ew diherin malê. Dayîka xwe hembes dikin û digirîna. Gundî û cîranên wan li hev dicivin. Dayîka wan dişon û defîna dikin. Gundî û cîran çend

roj, çend hefteyan li wan ra şivan çêdikin, ser û kincên wan dişon. Merî û mezinên wan jî di aliyekî da dibêjin: “Wûha nabe. Ew dergûşa li navberê maye. Vê malê ra jinek gereg e.” Ew li bavê zarokan ra li jinekê digerin. Pîrr nakeve navberê li gundekî derdorê jinekê dibînin û dînin li bavê zarokan mahr dikin.

Zarokên belengaz di rewşek pîrr teng da ne. Aliyekî da xûçka wan a ku hîn dergûş û bi wê ra dayîk gereg e, alîye din da jî jinek bîyanî ku wan heft birayan wek dujmin dibîne. Çend meh derbas dibin rewşa wan hercîk dihere xerab dibe. Rojekê birayê mezin dibêje: “Birano, rewşa ku em te da ne, ne tu rewş e. Bavê me jî tu tiştêk di dest da tuneye. Xêncî ku ew zewicîye ji me ra bûye xelk. Ew jinik jî, ji bo ku zarokên xwe nebûne, li xûçka me a dergûşê mêzedike û ji wê hezdike. Xûçka me wek zaroka xwe dibîne. Bila ji me hezneke. Em hêdî mezin in, werin ku em li mal veqetin herin dereke dûr, li wê derê ji xwe ra malekê çêkin”. Bira gî vê peşnîyaze qebûl dikin û li mal vediqetin.

Navberê da panzdeh sal derbas dibin. Zerî hêdî keçikek xort(cîwan) e. Ew rojekê bi hevalên xwe ra dihere perê gund. Li binê darekê ew û hevalên wê li hev dicivin. Kî ji wan teşîye dirêse, kî jî dirûne dike. Gotîna û lomên wan dirêj dibin û qal û behsa dilan û evîne jî dikin. Yek ji keçikan dibêje: “Hevalno, ez dixwazim ku çi li vira hatiye gotin, bila li vira bimîne. Ji bo vê yekê gerek heye ku herkes sond bixwe. Keçîk gî bi serê birayên xwe sond dixwin.

Dema ku dora Zeriyê tê, ew dibêje: “Bi serê golikê me ê beş be”.

Keçik gî bi vê sondê dikenin, qîrfên xwe bi wê dikin û dibêjin: “Ew çi sonda wûha ye”.

Zerî dibêje: “Ez çi bikim? Birayên min tune ne.”

“Çima tune ne, heft birayên te hene” dibêje yek li wan keçikan.

Zerî mat dimîne û dibêje “Ew derew e.”

Keçikên din jî dibêjin: “Na ew rast e” û sond dixwin ku heft birayên wê hebûne, ji bo ku dewara wan nebûye, panzdeh salan berê li mal veqetiyane.

Zerî şaş dibe ku bêje çi. Biçek wext derbas dibe ew pîrs dike: “Ez ê çawa wan birayên xwe bibînim? Kî ê min ra alîkarîyê bike?”

Yek ji wan keçikan dibêje ku jinîkek pîr û zana heye, li nav çîyan da dijî. Ew pîr a tenê dikare alîkarîya te bike.

Wan gotin û xeberan şunda mêze dikin ku êvar nêzik e, karên wan li mal heye, li wira belav dibin û diherin malên xwe.

Zerî wê şevê dibe wek însanekî serxweş. Wê şevê bêxew derbas dike û sibe zû da radîbe, dikeve rê. Devdevî nivro di nav çîyan da malekê dibîne. Dihere hundirê malê ku pîrîkek tevnê çêdike. Silavê li wê dide. Pîrê jî wê xêrhatî dike û dipirse: “Va çi halê teye? Tu bi tenê ku da diherî?”

Zerî bi wê ra hal û mecalê xwe dibêje û alîkarîyê li wê dixwaze.

Pîrê dibêje: “Ez ê li te ra ji xwelîyê kerekî çêkim. Tu ê li wê kerê sîyar bibî û tim bejî ‘ço’, heta ku ew ker li ber malekê disekine. Li ber kijan malê sekini, bizanibe ku ew mal a birayên te ye. Tu ê hinga bejî ‘çuşşş’ xwelîye ji bike xuşşş.”

Pîrê ji xwelîyê kerekî çêdike, Zerîyê jî li wê sîyar dike û dibêje: “Oxira te a xêrê be.”

Zerî du roj û du şevan bi rê da dihere. Roja sisîyan li nava heşşoyekî mezin da malekê

dibîne. Ker dihere li ber wê malê disekine. Zerî dizane ku ew mal a birayên wê ye. Dibêje “çuşşş”, xwelî dike xuşşş. Zerî derbasî hundir malê dibe, her derekê mêze dike ku kes tune ye. Ew fahm dike ku birayên xwe ê li derve kar dikin. Zerî malê pakij dike. Kincan dişo. Berêvarê jî şivê çêdike û sivra birayên xwe datîne. Dema ku hatina birayên xwe nêzik dibe, dihere xwe di paş sêr da vedişêre.

Birayên wê dema ku dikevin hundir mala xwe şaş dikin. Dibînin ku her der hatiye pakij kirin, kinc hatine şuştin û şiv hatiye çêkirin. Li hevûdin pîrs dikin ku ew ê ku ev kar kirine kî ye. Kes ji wan nizane ku ew kî ye. Ji her xwarinê piçekî didin tajîya xwe. Dibînin ku tajî dixwe û tiştêk bi wê nayê, ew jî bêtîrs wan xwarinan dixwin.

Ji bo ku pîr westîyane jî dû xwarinê ra dikevin nav cîhên xwe û radikevin.

Sibê dîsa wek her roj zû da radîbin û diherin karê xwe. Ku ew bi dûr dikevin şunda Zerî dîsa li şûna xwe derdikeve. Sivîrê berev dike, feraqan dişo û wek roja berê dîsa şivê çêdike. Devdevî êvarê dîsa sivîrê datîne û xwe vedişêre. Birayên wê careke din dibînin ku ew kar dîsa hatine kirin, dibêjin: “Gerek e ku sibê yek ji me li mal bimîne û bipê, kanê ew ê ku wan karan dike kî ye?”

Roja dû wê, yek ji wan li mal dimîne û xwe vedişêre. Ew dibîne ku keçikek xort di paş sêr da derket û dest bi karên malê kir. Birayê wê giran giran paşda dihere û bi guliyên wê digire û pîrs dike: “Bêje tu kî ye?”

Zerî Dibêje:

“Ez xuçka we me.”

Birayê wê guliyê wê berdide, dibêje: “Ji min ra qal bike, çawa tu xuçka me yî? Tu çawa hatîyî vê derê?”

Zerî bi wî ra her tiştêkî dibêje. Birayê Zerîyê bawer dibe ku bi rastî jî ew xuçka wan e, wê hembez dike.

Êvarê ku birayên din jî têne malê, mizgînê dide wan ku ew keçika xûçka wan e. Bira gî bi vê mizgînê pîrr şa dibin û şaş dibin ku li wê ra çibikin. Hetanî wextekî dereng li hev rûdinin û bêhna xwe bi hev derdixin.

Çend roj derbas dibin. Yek jî wan birayan dibêje: “Birano, sibe dibe em ji mal derdikevin diherin karê xwe hetanî êvarê, lê va xûçka me li mal bi tenê dimîne, dixwaze ku em tiştêkî bidine wê ku dema ew li mal bi tenê dimîne, behna xwe bi wê derxe.”

Birayê biçûk dibêje: “Min bihîstîye ku pisikek bi zar û ziman heye. Em wê pisikê xûçka xwe ra bînin.” Bira gî qebûl dikin û rojekê şunda pisika bi zar û ziman dînin didin xûçka xwe.

Zerî û pisik her roj bi hev ra dilîzin. Behna Zerîyê qet teng nabe. Rojekê dîsa Zerî û pisik bi hev ra dilîzin lê Zerî bi ser dixê. Pisik wê binketîne qebûl nake, hiz dibe û bi xwe ra dibêje: “Binketîne çawa ye, ez ê rê te bidim.”

Zerî pisikê ra dibêje: “Carê here mêzeke, kanê agir vêdikeve an vemirîye.”

Pisik dihere avê davêje ser agir û agir vedimirîne. Ew dihere çend morîyên sor dike nava agir ku mîna agir xuya bibin û li Zerîyê ra jî dibêje: “Agir venemirîye hîn vêdikeve. Ku tu li min bawer nakî, tu dikarî di teqê ra mêzekî.”

Zerî di teqê ra mêze dike ku agir vêdikeve, sohbet û listika xwe dewam dike.

Êvar nêzik dibe û Zerî dixwaze ku hêdî dest bi çekirina şivê bike. Dihere ocêx(argûn), dibîne ku agir vemirîye û ên ku wek agir sor xuya dikin morî ne. Hînga fahm dike ku pisikê heyfa xwe li wê hilaniye. Ji bo ku Zerî naxwaze ku wê rojê birayên xwe birçî bimînin, derdikeve derva doralîyê xwe mêzedike, dibîne ku di dûr da dûyê agir hildikişe. Xwe li wê derê digre û lingxwesî dimeşe wê derê.

Digêje wê malê û li derîyê malê dixê. Derî vedibe ku heft keçik di hundir da rûniştine. Ew keçik Zerîyê ra dibêjin: “Malneketê, çawa tu bêtirs hatîyî mala me? Dayîka me hût e, ger ew te bibîne, ê te bixwe. Tu çî dixwazî, zu bigre û here!”

Zerî kizoteki agir dixwaze û dide ser xwelîye, dike çenga xwe û ber vî malê dimeşe.

Pîrr zeman derbas nabe, hût tê mala xwe û li keçikên xwe ra dibêje : “Himm dikim, gimm dikim, bêhna xelkê xerîb dikim. Min ra bêjin kî hatîye mala me?” Her heft keçik jî dizanin ku ew bêjin Dayîka wan a hût ê here Zerîyê bixwe, ji bo wê nabejin. Hût derdikeve derva, li dora malê çilkên xwînê dibîne. Ji bo ku Zerî lingxwesî meşîyaye lingen wê li keviran ketine û xwîn lê çûye. Hût xwe li xwînê digre û hetanî ber derîye mala Zerîyê dihere û li derî dixê. Zerî di hundir malê da teyê ber derî û pîrs dike: “Ew kî ye?”

Hût dibêje: “Ez im, dayîka heft keçikan. Carê derî veke ku ez bibînim kanê dewrana we çawa ye.” Zerî dizane ku ew derî veke, hût ê wê bixwe. Ew dibêje: “Heft birayên min hene, ku bibînin ê min ra hêrs werin.” Û ew derî venake.

Hût dibêje: “Di qûla derî ra tilîya xwe derxe ku ez pê bimêjim. Ku te tilîya xwe dernexist ez ê her heft birayên te yek bi yek bixwim.”

Ji bo ku Zerî naxwaze ku tiştêk xirab were serê birayên xwe, bêçare tilîya xwe di qûla derî ra derdixê. Hût bi têra xwe bi we dimije û dihere.

Li wê şunda her roj bi tilîya Zerîyê dimije. Zerî jî roj bi roj xirab dibe, jar dikeve. Birayên Zerîyê vî halê Zerîyê ferq dikin. Li Zerîyê pîrsdikin ku ew nexweşe an na. Zerî dibêje: “Ez ne nexweş im.”

Rojekê yek ji birayên Zerîyê dixwaze li

mal bimîne û karên malê bike. Ew bira wê rojê her tiştî dibîne, dema ku birayên xwe tenê mal, wan ra dibêje. Roja dû wê her heft birayên Zerîyê li mal dimînin û xwe didin benda Hûtê.

Dîsa ku êvar nêzik dibe hût tê ber derî. Her heft bira li hûtê dicivin û wê dikujin. Li wê şun da diherin mala hûtê, dibînin ku heft keçikên hûtê hene. Wan keçikên hûtê li xwe mahr dikin û bi xwe ra dînin mala xwe.

Kuştina hûtê bi keçika mezin ra pirr giran tê. Ew bi xwe ra dibêje: “Çi roj hebe ez ê vê heyfê li van hilînim.”

Birayê Zerîyê yê mezin li hespê xwe pirr hezkiribûye. Rojekê ew hespa di hefşo da hork kirî bûye. Keçika hûtê vê dibîne û xwe dide bendê. Mêze dike ku kes tune ye, dihere horka hespê sist dike. Hesp xwe lê dixê û wek dînbûyî bi deşt û banîyan dikeve. Keçika hûtê dike qîrre qîrre. Xeberê dide Zerîyê. Zerî radibe dide dû hespê birayê xwe. Ha li vê derê ha li wê derê, hesp nayê dest. Zerî pirr diweste û pirr jî tî dibe. Keçika hûtê dizane ku Zerî pirr tî bûye, dihere marekî berdide hundir kûzê avê.

Zerî vedigere û digêje ber derîyê malê dibêje: “Ez pirr tî bû me tasek av bidin min.”

Keçika hûtê kûzê avê direjî Zerîyê dike. Zerî kûzê avê bi ser xwe va dike. Mar jî tevê avê xwe berdide zikê Zerîyê. Zerîya xêrnedî ferq nake ku mar di kûz da bûye. Zerî roj bi roj diperçive. Ew bawer dike ku nexweş e. Ji bo ku naxwaze birayên xwe bitirsin ji wan ra nabêje. Lê belê birayên wê dibînin ku Zerî roj bi roj diperçive, li jinên xwe pirs dikin. Jinika birayê mezin dibêje: “Ez jî nizamim kî ye, lê belê ez dizanim ku ew dihere cem mêrekî û ew bi du cana ye.”

Birayê Zerîyê mat dimîne û xwe şaş dike, dihere cem birayên xwe. Wan ra dibêje: “Hal û mecalê xûçka me wuha ye. Ji bo ku wê ev

benahmûsî kirîye, gerek heye ku ew were kuştin. Yek ji me lazim e vî karî sibê bine cih.” Ew di nav hev da qerarê didin: Birayê biçûk dike sibê Zerîyê bibe çolê û li wê derê bikuje.

Birayê biçûk sibê zû da radibe û dihere Zerîyê jî li xewê radike. Jê ra dibêje: “Îro karê min li çîyan pirr e. Ez dixwazim ku tu jî min ra werî. Hetta ku ez kar ê xwe dikim, tu ê jî pêz biçêrîni.”

Zerî bi vê gotinê şa dibe û radibe hemû hazirîyan dike û bi birayê xwe va tevhev dikevin rê. Tim û tim bi rê da diherin kînga ku birayê Zerîyê ferq dike ku Zerî pirr westîyaye, bi wê ra dibêje: “Were ku em li bin vê darê biçekî rûnin û westa xwe bidin.”

Birayê Zerîyê bilûra xwe derdixê û awayekî şewat lêdixê. Zerî serê xwe dide ser junîyê birayê xwe û bi xew da dihere. Birayê Zerîyê difkire ku ew nikare bibe xwînîyê xûçka xwe, bilûra xwe tijî mêş dike û dide ber serê Zerîyê. Kulavê xwe jî taxa serî Zerîyê ra dibire ji bo ku serê wê neyê erdê hişk û bi xwe nehese, radibe bi lez û bez li wê derê dûr dikeve.

Zerî bi xwe dihesê. Li dor alîyê xwe mêze dike, birayê xwe nabîne. Dema ku perçeyê kulav û bilûrê dibîne, fahm dike ku birayê wê li wê revîyaye. Bi tirs û xof li doralîyê xwe mêze dike. Nîzane ku ku da here. Her der giran giran tarî dibe. Zerî bilûr û perçê kulav digre û nav çîyan da li rê digere. Kînga ku ew fahm dike ku wê rê şaş kirîye, dest bi girî dike û dibêje: “Birao, nîfira ku ez li te bikim, bila hestîyê marê reş di lingê te keve û xencî xwazîya min tu derman lê nebin.”

Bê xew, tî û birçî li Zerîyê sibe dibe. Li hêla avekê, li binê darekê xwe dirêj dike û dikeve xewê. Şivanek li wê derê pêz diçêrîne, nêzik dibe. Şivan dibîne ku ew di xeweke kûr da ye, piçekî lê dûr dikeve û li wê mêze dike.



Piçek zeman dihere şivan dibîne ku marek nêzikî Zerîyê bû û hate ziman û got: "Were çayîr û çîmanê, were gul û gupikê, ji wê dera tarî derkeve."

Li alîyê din da dengêkî din dibêje: "Were dil û gurçika, were kezêb û pişikê."

Şivan fahm dike ku ew denga di zike keçikê da tê û piçekî nêzik dibe. Ew mar çend car din hevûdin dawet dikan. Marê ku di zikê Zerîyê da ye giran giran derdikeve û bi marê ku li derva ye bi tevhev dikişin û diherin. Şivan dihere hinda Zerîyê. Wê bi dengêkî xweş li xewê radike. Zerî ferq dike ku ew pîrr sivik bûye, ji barekî giran xelas bûye, li şivên pîrrs dike: "Tu kî yî? Çi bi min hat?"

Şivan bi wê ra her tiştî dibêje. Ew ji şivên ra hal û mecalê xwe dibêje. Zerî û şivan jî hev ra dibin heval. Çend rojan şunda jî dizewicin.

Ji Zerîyê ra jîyaneke nû dest pê dike. Ew wek hekîm bi xwazîya xwe birîn û kula derman dike û dikewîne. Nav û dengê wê roj

bi roj belav dibe. Li her derî da nexweş têne cem wê. Pîrr sal derbas dibin. Zarokên wê dibin û ew di halekî pîrr xweş da ye. Rojekê nexweşek tê hinda wê. Lingê nexweş pîrr werimîye. Zerî xwazîya xwe lê dike û kul der dibe ku hestîyê mêr di lingê wî da bûye.

Zerî hînga dizane ku ew birayê wê ye. Wan wek mehvan baş rast dike. Dema ku ew xatir li hev bixwazin, Zerî dihere hundîr malê da bilûr û perçê kulavê wî dîne dibêje: "Ev tişt ên te ne çend sala berê te li cem min bîr kirîbû" Birayê Zerîyê çer ku dibîne, nas dike û dizane ku ew ji xûçka wî ye. Zerîyê hembêz dike û digirî. Birayê Zerîyê dibêje: "Ez ê herim mizgîne bi birayên xwe dim."

Ew dihere, hal û meselê birayên xwe ra qal dike. Ew qerara xe didin ku heyfa xûçka xwe hilînin. Qatîrêkî heftekê birçî; qatîrêkî din jî heftekê tî dihêlin û keçika hûtê bi lingên qatîran va girê didin. Qatîr yek xwe li avê, a din jî xwe li kayê dikşîne. Keçika hûtê jî bela xwe dibîne.

# Derd ne yek e ne dudu ne

Ez van rojana tenkê vê kêyf im, dixwazim ji we ra derdê xwe katkim. Navê min Êş e, berê li keçiklîxa min, vi min ra digotin, “Êsgozal”. Lê gozal jî bûm yanê. Porekî min hebû, mîna porê Tûrkan Şoray bû. Bejndirej û çawbelek bûm... Axxx axxxxx, niha tu tişt nemaye ji gençlîxê min. Êdin ji min derbas bû, pîr bûm.

Bavkê min Şivanlîxi dîkir, em pîr xizan bûn. Ez şanzdeh salî bûm, bavkê min bi du hezar qeyma bi qelîng ez dam mêr. Navê mêrkê min “Sûslî” ye, jî wî ra jî berê wer digotin. Çima ku Sûslî bû. Li xortlîxê xwe por î tim şîl bû, neynîk tim di beriya da bû.

Heyşt sal paş zeweca me, mêrkê min çû gûrbetiyê, Alamên. Ez li ba xasî û xezûrê xwe mam, bi çar kûrkê xwe va. Pênc sal şûn da, Sûslî em bi anatin danî û ez bi kûrkê xwe va, em hatini Alamên. Ma em qet nehata nî. Zatî ku çî hate serê me jî vê bi şûn da bû.

Sonkesena me Songül (destê we paç dîke) li wir hate dinê. Pênc kûrkê min hene; sê lawîk û du keçîk... Lî vir hena xwendin, bûn meriv, hen jî şîxûlîn.

Lawkê min ê mezin li fabrika Sûslî da çalîşîmiş dibe. Min ew bi keçîka gormê xwe va zewicand. Me go, “ma jî merlîxîyê be, ma tu zerar nê” diyerekten. Toohuuuu esas zerar min jî wê bûkê dî. Amaaaan, ma xweş bin, mûtlû bin, dengkirina wan jî naxwazim. Em ê li hev hatini sîva lawkê min bazi tê, yekcara jî telefon dîke.

Ha çûkê wî jî lawîk e, wî li universîtê xwend û îşletme tevakîr, bû meriv lê me go

“em te bizewcînî”, nexwast çû yeke tîrk a Aydinlî dî, bi wê va zewicî, ne hûn pîrs kin ne ez bêm ...

Çûkê wî jî keçîk e.

Keçîka min meslek kir, sê sala xwend, me ew jî ji gund zewicand. Enîştê min pîr baş e, ez jê pîr menmun im.

Çûkê wê jî lawîk e, lawkê min jî hîn li universîte dixwîne, nîzam pîskoloji ye çî ye?

Wî temel ez kuştim. Çûye yeka xwe ya Alman diye bi wê va dost hayati, vê nîke vê dol yaşamiş dibe. Wax wax wax ...

Ez li bêr gerîm, min go “yavrim alman jî me ra nabin, de tamam madem tu jê coymîş nabî, de em dolê we çêkin, wengna ayb e”.

Wî go “na anne, zamani gelince biz evleniriz, biz karar veririz siz karîşmayınız”.

Min cîle li wir birî, çîrkîm?

